
# Nasname ya Kurdistanê

# Kurdistan's Identity




Hawr̂ê Qendîl

# Nasname ya Kurdistanê

Kurtasîyêk ji ȓastîyan bo şyar kirine wîjdane mirovatîyê û dyarîyêk ji hemî şoȓeşgeȓên ȓêya azadîya Kurdistanê.

Nave piȓtûk: Nasname ya Kurdistanê

Nuser: Hawȓê Qendîl

Newroze 2713 Kurdî (March 2013)

Mafe çap û biłav kirina wê piȓtûkê bo xiszemtkarên Kurdistane tê paraztin. Ev piȓtûk tenê bo xizemt bi gelê Kurditanê hatîye nivîsandin û wek diyarîyêk tê bilav kirin.

Nasname ya Kurdistanê bi zaraveye Kurdî ya navîn (Soranî) û zimane Englisî hatîye nivîsandin. Bi hêvîya ku wełatparêzên Kurdistanî fedakarane vê piȓtûkê wek xwe bi zaraveyên dinê Kurdî û zimanên Asurî-Suryanî, Tirkî, Ȇeȓebî, Farsî, Feȓansî, Ałmanî, Çînî, Hêndî, Japonî, Swêdî û Latînî wezevrênin.

Ev pîȓtûk bi wan pîtan hatîya nivîsandin. Berê nasîne nasname ya Kurdîstanê, elfbaya Kurdî hîn bibîn ku ji 34 pîtan pêk hatine (Pîtên sor ȓeng dangdarin):

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| A-a ئـ - ا<br>Mînak: Amed | B-b ب - بـ<br>Mînak: Bidłîs | C-c ج - جـ<br>Mînak: Civak | Ç-ç چ - چـ<br>Mînak: Çira | D-d د<br>Mînak: Dar |
| E-e ـە - ە<br>Mînak: Erdîş | Ê-ê ێ - ێـ<br>Mînak: Sêrt | F-f ف - فـ<br>Mînak: Felek | G-g گ - گـ<br>Mînak:Gabar | H-h ھ<br>Mînak:Hełebce |
| Ĥ,ĥ ح - حـ<br>عـ - ـعـ - ـع - ع<br>Mînak: Ĥefrîn | I-i (بزرۆکە)<br>(Tineye)<br>Mînak: Jin | Î-î ی - یـ<br>(ی کورت)<br>Mînak:Îlam | J-j ژ<br>Mînak: Jiyan | K-k ک - کـ<br>Mînak: Kerkuk |
| L-l ل - لـ<br>Mînak: Law | Ł-ł ڵ - ڵـ<br>Mînak: Ała | M-m م - مـ<br>Mînak: Mał | N-n ن - نـ<br>Mînak: Nan | O-o ۆ<br>Mînak:Erzeȓom |
| P-p پ - پـ<br>Mînak: Pîran | Q-q ق - قـ<br>Mînak: Qendîl | R-r ر<br>Mînak: Mirov,<br>Yar | Ȓ-ȓ ڕ<br>Mînak: Ȓuĥa,<br>Ȓeş, Ȓêwas | S-s س - سـ<br>Mînak: Sine,<br>Serdaşt |
| Ş-ş ش - شـ<br>Mînak:<br>Şemzînan | T-t ت - تـ<br>Mînak:Tavge<br>Tûzxurmatûz | U-u و<br>Mînak:<br>Kurdistan | Û-û ئو<br>Mînak: Bûn | V-v ڤ - ڤـ<br>Mînak:<br>Mirov, Vîyan |
| W-w و<br>Mînak: Wan,<br>Newroz | X-x خ - خـ<br>غ - ـغ - غـ - غ<br>Mînak:Xaneqîn<br>Xezal | Y-y ی - یـ<br>(Pêşe pîtên a,e,i,î)<br>Mînak: Yar<br>Yemen | Z-z ز<br>Mînak: Zana | |

**Çend xałokên bałkêş:**

* Elifbaye ku ev piȓtûk pê hatîye nivîsandin, hinek cudaye ji elifbaye Celalet Bedirxan. Di zaraveya Kirmancî da çend dangên ji hev cuda hen, ku di elifbaye Celalet Bedirxan da ne hatine ji hev cuda kirin. Di vê piȓtûkê da ji gor dengan, çend pîtên nû hatine bikar anîn (binêre pît û mînakên serî). Bi hêvîye ku ev pît jî neyêne ji bir kirin.
* Egerçî piranîye zimanzanên Kurd, di wêjeye zaraveye Kirmancî da, mabeîn xistine beîne nêr û mêyan, lê bo nizîk kirine zaraveyên Kurdî û ȓêzgirtine yeksanîxwazane ji nêr û mêyan, ev piȓtûk mabeîn ne xistiye beîne: hevala jin û hevalê mêr. Ji bo standard kirine zimane Kurdî li wir pêwîst hatîye ditin ku nêr û mê neyêne bikar anîn.
* Hinek peîv hene ku li zimanên Ȇeȓebi û Latîni ve hatine nav zaraveye Kirmancî, lê ji gor derfetê, ji bikar anîne peîvên zimanên din, hatîye dûrî kirin û cêya wan, peîvên zaraveyên dinê Kurdî hatine bikar anîn.

Bi hêvîye wê ku Kurd berê hertiştekî di zimane xwe da yeksanîwaz bin û bo zimaneke yêkgirtî têbikoşin.

## Naverok


| | | |
|---|---|---|
| | **Dastpêk** | 1 |
| 1 | **Beşe Yêkem**<br>Nasname çiye? | 7 |
| 2 | **Beşe Dûhem**<br>Dîroka gelê Kurd û şoȓeşên Kurdistanê | 11 |
| 2-1 | Ȓeçełeke gelê Kurd di 6000 sał pêş zaîn | 16 |
| 2-2 | Xêȓe Pars | 18 |
| 2-3 | Dastełate Medya | 21 |
| 4-2 | Şoȓeşa Kawe ya Asinger li hember Zuĥake zordar di 700 sał pêş zaîn | 23 |
| 2-5 | Fruartîs serkirdeya Medya 674 sał pêş zaîn | 29 |
| 2-6 | Sazkirine dastełate Medya bi serokatîya Keîxusrewe dûhemîn di sała 625 ta 550e pêş zaîn | 29 |
| 2-7 | Şoȓeşa Etrupat di sała 323e pêş zaîn | 33 |
| 2-8 | Êrişe Ĥeȓeban ji bo ser Kurdistan û Îranê di sała 634 ta 644e zaînî | 34 |
| 2-9 | Dastełate Sacidiyan û îmarete Kurdistanê di sała 889 ta 932e zaînî | 38 |

| | | |
|---|---|---|
| 2-10 | Dastełate Merwanî ya Kurdî di sała 930e zaînî | 39 |
| 2-11 | Dastełate Şeddadî ya Kurdî di sała 951e zaînî | 40 |
| 2-12 | Zordarî ya Selcuqiyan di sała1049 ta1279e zaînî | 41 |
| 2-13 | Êrişe Mexułiyan ji bo ser Kurdistanê di seda yên13 û 14ye zaînî | 42 |
| 2-14 | Emîr Şerefxane Bitłîsî di sała 1597e zaînî | 43 |
| 2-15 | Tawan (cinayet)e Sefewiyên Îranî dijî şoȓeşên Kurd di sałên1500 ta 1639e zaînî | 45 |
| 2-16 | Peîmane Qesre Şîrîn di sała 1639e zaînî | 48 |
| 2-17 | Şoȓeşa Şêx Ĥubeîdułe Nehrî di sała 1880e zaînî | 51 |
| 2-18 | Şoȓeşa Bedirxan Paşa di sała 1880e zaînî | 53 |
| 2-19 | Şoȓeşa ȓoşenbîrî û neteweî ya Ĥebdulȓezaq Bedirxan di sała 1912e zaînî | 57 |
| 2-20 | Qiȓkirine Ermeniyan di sała 1915e zaînî | 61 |
| 2-21 | Şoȓeşa Simko ya Şikak di sała 1918 ta1930e zaînî | 64 |
| 2-22 | Peîmane Sêvirs di sała 1919e zaînî | 70 |

| | | |
|---|---|---|
| 2-23 | Kongire ya Erziȓomê di sała 1919e zaînî | 72 |
| 2-24 | Şoȓeşa Şêx Meĥmud Berzincî di sała 1919e zaînî | 74 |
| 2-25 | Peîman (Mîsaq)e neteweyî di sała 1920e zaînî | 77 |
| 2-26 | Şoȓeşa Duktor Nurî Darsîmî di sała 1920e zaînî | 78 |
| 2-27 | Peîmane Lozan di sała1923e zaînî | 80 |
| 2-28 | Şoȓeşa Şêx Seĥîdê Pîran di sała 1925e zaînî | 83 |
| 2-29 | Şoȓeşa Qedemxêr di sała 1925e zaînî | 89 |
| 2-30 | Şoȓeşa Îĥsan Nurî Paşa di sała 1926e zaînî | 90 |
| 2-31 | Şoȓeşa Seîd Ȓeza Darsîmî di sała 1937e zaînî | 95 |
| 2-32 | Şoȓeşa Pêşewa Qazî Miĥemmed di sała1945e zaînî | 115 |
| 2-33 | Şoȓeşa Mela Mistefa Barzanî di sała 1961e zaînî | 102 |
| 2-34 | Peîmane Elcezaîr di sała 1975e zaînî | 107 |
| 2-35 | Şoȓeşa Eĥmed Tofîq di sała 1950e zaînî | 108 |

| | | |
|---|---|---|
| 2-36 | Şoȓeşa bakur bi serokatiya Ĥebduła Ocelan (Apo) di sała 1970e zaînî | 125 |
| 2-37 | Şoȓeşa cemawere başurê Kurdistanê di sała 1991e zaînî | 136 |
| 2-38 | Şoȓeşa gelê Kurd li Kurdistane Sor di sała 1992e zaînî | 143 |
| 2-39 | Serhełdanên Kurdistanê di sedeyên 19 û 20e zaînî | 145 |
| 3 | **Beşe Sêhem**<br>Xalên gringên cugȓafî ya Kurdistanê | 147 |
| 3-1 | Şwêngehe Kurdistanê | 147 |
| 3-2 | Ȓûpêv (ȓûber, bergeh)e axe Kurdistanê | 149 |
| 3-3 | Bajarên girîng û parêzgehên Kurdistanê | 150 |
| 3-4 | Serhejmarî ya şênîyên Kurdistanê | 152 |
| 3-5 | Abûrî ya Kurdistanê | 155 |
| 3-6 | Çałên newit (petroł)e Kurdistanê | 157 |
| 3-7 | Kanên Kurdistanê | 160 |
| 3-8 | Samane ave Kurdistanê | 160 |
| 3-9 | Çemên girîngên Kurdistanê | 161 |
| 3-10 | Daristane Kurdistanê | 162 |
| 3-11 | Beriztrîn çiyayên Kurdistanê | 162 |

| | | |
|---|---|---|
| 3-12 | Pile (darece) ya germaî ya sałane ya Kurdistanê | 163 |
| 3-13 | R̂êje ya nexwêndawarî li Kurdistanê | 164 |
| 3-14 | Kiştukał | 165 |
| 3-15 | Ajeł | 166 |
| 3-16 | Netewe ya Kurd | 166 |
| 4 | **Beşe Çarem**<br>Olên Kurdistanê | 168 |
| 4-1 | Gemî ya Nûh | 170 |
| 4-2 | Ole Zerdaşt | 172 |
| 4-3 | Ole Cû (Cihû, Musayî) | 178 |
| 4-4 | Ole Krîstyan (Fele) | 179 |
| 4-5 | Ole Îslam | 180 |
| 4-6 | Ole Êzîdî | 214 |
| 4-7 | Ole Yarî | 216 |
| 5 | **Beşe Pêncem**<br>Sedamên pêşneketine civake Kurdawarî | 218 |
| 6 | **Beşe Şeşem**<br>Mafên seretaîyên mirovên Kurdistanî | 239 |
| 7 | **Beşe Hevtem**<br>Çanda netewe ya Kurd | 243 |

| | | |
|---|---|---|
| 7-1 | Zimane axeftînê anjî zimane neteweyî | 243 |
| 7-2 | Xû û r̂ewişt | 250 |
| 8 | **Beşe Heştem:**<br>Çend karesatên dił̂tezêne dawî ya seda ya bîsteme Kurdistanê | 259 |
| 9 | **Beşe Nohem:**<br>Çend kesayetî yên şor̂eşger̂ên Kurdistanî | 267 |
| 9-1 | Mela yê Cizîrî | 267 |
| 9-2 | Xanzad Mîrê Soran | 268 |
| 9-3 | Eĥmedê Xanî | 272 |
| 9-4 | Ĥacî Qadire Koyî | 274 |
| 9-5 | Mîqdad Medĥet Bedirxan | 275 |
| 9-6 | Unîs R̂eûf Diłdar | 276 |
| 9-7 | Margirêt Corc | 277 |
| 9-8 | Mamosta Cigerxwên | 279 |
| 9-9 | Leîla Qasim | 280 |
| 9-10 | Mesture ya Şaswarî (Tewar) | 281 |
| 9-11 | Mamosta Hêmin Mukiryanî | 282 |
| 9-12 | Musa Enter(Apê Musa) | 283 |
| 9-13 | Mamosta Îsmaîl Bêşkçî | 284 |
| 9-14 | **Beşe Dahem:** Dawî | 285 |

**Dastpêk**

Doza gelê Kurd bi sałane heye û pir biłindî û nizmî bi xwe r̂a ditîye. Dagîrkeran bi çekê hêrşe ser Kurdistanê kirne û Kurdan jî naçar kirine bi çekê bersîv bidan. Çawên neyaran bi bûne Kurdan ranebûye û xwastîne bi zexit û kuştinê, wan bê nasname û bê nav biken. Kurd di nav pênc dagîrkeran da hatine dabeşkirîn û netenê hatine kołonîze kirîn lê hestên neteweî ye Kurdan jî hatîye serkut kirin û binbir̂ kirin. Egerçî Kurd di dîroke xwe da herdam aştîxaz bûne û tenanet hemêze wan jî bo r̂êkevtin bi dagîrkeran r̂a wekirî bûye, lê mixabîn dujmin nikołi ji bûne Kurdan kirne û be xerapkar û tirorîst bi gelên heremê û cîhanê nasandine.

Sedameke dine bê nasname ya Kurd, wedager̂ê ji bo kirdawe ya takr̂evî (takhełwêstî) di bîr û boçunên gelê Kurdistanê. Wate hêzek dastełat girtî ye dast û di nav wê hêzê da serkirda fermanr̂ewaî kirîye. Her aliyek hêze wî zêdatir bûbê, zał bûye bi ser alîyên dîn. Tenanet di nav hêzên dastełatdar jî, serkirda fermanr̂ewayî û zordayî kirîye. Gelê Kurd bi vê bîr û bawer̂î ya takr̂evî û

xwepêzorî mezintrîn zerbe ji serxwebûne Kurdistanê daye. Çimkî (çunkî) takȓevî ye Kurd negeîştî ye aste bi netewe bûn û tenê di aste xêł û ȓêxistinî da maye.

Herdam ku Kurdistanîyan bi Kurd û neteweyên dinê Kurdistanê, karîn mafên neteweî ya xwe bi jîrane (baqilane) û zanayane nasbiken, wê damê di karîn nasname ya neteweî ya xwe misoger biken. Ji bo wê mebestê û ji bo ku li pênav (jo bo xatira) çareserî ya doze rewa ya netewe ya xwe da, ez hewłek dabê û kevirkek di binaxe Kurdistaneke serbexwe da danabê, bi pêwîst zanî piȓtûke "Nasname ya Kurdistanê" binivîsênim.

Hêjaye amaje kiȓinê ye ku dîroke gelê Kurd pir kevne û nivîsîn ji ser hemî xałên wê, kareke asan nîne. Çimkî damên ku dagîrkeran êrişe ser Kurdistanê kirne, samane wî tałan kirine, zana yên Kurd kuştîne û nivîsên dîrokî ya wan şewtandîne. Ta karine zanist û çanda Kurdan ji bo xwe dizîne. Bo mînak di serdame dasepandine çanda Ȇeȓeb, binave anîne ołe îslamê, bo ser gelê Kurdistanê êriş kirine û leşkire Ȇeȓeban piȓtûkxane yên Kurdistanê ji

ser nava piȓtûkxane yên kafir û gawran şewtandin û samane gelê Kurd ji bitałan birine.

Hêjayê zanînê ye ku împiȓatoȓ û zordarên herêmî û navneteweî ji, ne tenê hîç pȓinsîp di dagîr kirine Kurdistanê da ȓeçav ne kirine, bełkê bi hemî hêze xwe, Kurdan komełkuj kirine û serçave yên dîrokî ye wan jî têda birine. Di dame dagîr û tałan kirine Kurdistanê û bênasname kirine gelê Kurd, dagîrker û zordaran dastur ji Kurdan wernegirtine, ta Kurd bi daxwaze wan nasname û dîroke xwe binivîsênê. Di vê wateyê da, mîtoda lêkolînerî ya serdam jî, mafe wî niye ku pêş bi nivîsîne dîroke Kurdan bigȓî. Çimkî tenanet dastełatdarên wê serdamê jî, hîç piȓinsîpên mirovahî yê li hember nikołî ya nasname ya Kurdistanê da ȓeçav ne kirine.

Di vê piȓtûkê da ku berheme lêkołîneke zanisitî ya bîst sałane, tenê bi kurtî dîroke Kurdan têda hatîye bas kirin. Di vê lêkołînê da hîç aliyek ne hatîye biłînd anjî nizim kirin, bełkê bi awayeke diłsozane, ȓastî yên Kurdistanê hatine nivîsandîn. Ta ȓastî jî ne yêne bas kirin, şaşî nayêne çareser kirin.

Bo wê lêkołînê min bi sedan mał û qucbinên cîhanê geȓyame. Bi sedan kesayetî yên nasyaw û ne nasyawên Kurdistanî anjî Kurddost çawpêkewtin pêk anîye û ji ser her babetek dayan car lêpirsîn û lêkołîn kirîye û ta koke ȓastîye ȓudawan darnexistye koł ne daye. Tenanet li pir daran bi nihênîparêzî û hestyarî zanîst top kirîye. Her li Kurdên Quçanê ȓa ta Laçîn, Ĥełeb, Qamîşlu, Şam, Îstanbûł, Amed, Sêrt, Dêrsîm, Wan, Bazîd, Cizîr, Zaxo, Dihok, Kerkuk, Xaneqîn, Ĥełebce, Qeładzê, Qendîl, Slêmanî, Hewlêr, Serdaşt, Sine, Seqiz, Bane, Wirmê, Xanê, Sełmas, Kirmaşan, Îlam, Qahîre, Nîwyoȓk, Stokhołm, Kołn, Lozan, Loksamborg, Bruksêl, Ȓom, Parîs, London, Êdînbra, Sîdnî û sedan bajar û gundên dinê cihanê geȓyame û mandîbûnî û şevneȓazanî dîtîye ji bo ku wan zanyarîyan kom bikem û bi hêvîye ku Kurd jî wek netewe yên din şanazî bi dîrok û nasname ya xwe biken. Di wir da ji ber eminyetparêzî yê, ne hatîye nivîsandîn ku ji gor filan kes anjî filan serçave, filane tişte wisa  bûye. Tenê di dawîyê piȓtûkê da, bi çend serçave yên kelikwergirtî hatîye amaje kirin.

Ȓeçav kirine hemî beşên mîtoda nivîsîne lêkołînên akadamî, ne tenê piȓtûk qalintir dikir, bełkê sere xwêner jî, di hêşênd. Gelê Kurd jî, bo xwe pir hez ji xwêndinê na ka, zêdatir jî dûr di xist.

Piranî ya dîroke kevne gelê Kurd, ji aliye hinek ji welatparêzên Kurd ȓa hatîye ji ber kirin û ji aliye nevşên pêş ji bo nevşên îȓo hatîye wegeȓandîn. Ez ji pişte pir bedwadaçunan da, bi pêwîst zanî ku wan gotravên bi nirx, binivîsênim, bo wê ku hem têda neçin û hem jî nevşên peşeȓoje me, şanazî bi hebûne xwe biken.

Xwe pesandin niye ku bêjim, piranîye pênus bidastên ku drev ji bo draw (pare) di nivîsênin û tiştên neȓewe bi ȓewe di nasênin, ne nivîskarîn bełkê xulamin. Mixabîn bi navên olî, ȓamyarî (syasî), dêmukȓasî, azadî, neteweyî, komonistî û susîyalîstî, pir beît û lorîn hatine gotin û nasname ya Kurdan bi şaşetî hatîye nasandin. Lê mixabîn ew nivîskar piranî, bê wîjdanên mêşikşorên çewsêner bûne.

Hêjayê zanînê ye ku xwe nasîn û hewiłdan ji pênave bi dastixistîne nasname ya netewe yî, ji bo Kurdistanîyan ji hemî zanîyarî yên nav piȓtûkên olî û manîfisto yên felsefî ye din, wek Maȓks, Îngils û Darwîn jî pîroztire. Ji ber wê her Kurdistanîyek pêwsîte ku zanistên Nasname ya Kurdistanê hîn bibê, û wî ji ol, ȓêxistin û berjewendî ya şexsî baştir bi parêzê. Hêvîdarim ku ev zanist bi bê sedame aştî ya nav gelê Kurd û xizmetk jî bê bo geîştine gelê çewsawe ya Kurdistanê bi mafên ȓewayên xwe.

Ev piȓtûke bi zimaneke sakare (wekirîye) ȓojane ku gelê Kurdistanê pêdaaxvî hatîye nivîsandin û tê da wêjeyeke vekirî hatîye bi kar anîn, ji bo ku piranî ya xwêndkaran bi başî wî têbigen.

Ji bo zaniyarî ji ser şêwaze nivîsîn û wêje ya wê piȓtûkê, xwêndkar di karin bałkêşe beşe ziman li ȓupele 243.

## Beşe Yêkem

### 1. Nasname çîye?

Bi boçune zana û pispor̂ên zevînas û stêrknas, goî zevî (xir̂ikê herdê) ji akame teqîne hinek ji madayên ser̂etaî ku bi tîorî ya "Teqîne Mezîn" (Big Bang) hatîye nasîn, nizîk çarda bilîon sał pêş niha (sała 2013e zaînî) çê bûye û pr̂ose ya drustbûne wî jî, milîonan sał kişandîye ta bi vê qeware ye niha darhatîye.

Yêkem jiyan, yêk û nîv bîlon sał pêş bi gîyandarên biçuk ku bi “Micro Organism" hatine nasîn, ji nav darya ber ve hîşkaiyan dast pêkiriye.

Daînasor̂ 65 mîlon sał pêş (sała 2012e zaînî) li ser goî zevî jiyane. Ji ber ku kevirkên mezin ji stêrkan r̂a ketine xwar, keş û heva ya zevî hatîye gor̂in û di akama serma û sołêkê da daînasor̂ têdaçune.
Mirov ji 8 mîlon sał pêş ve li ser zevî jiyan e û bi gihor̂înên av û heva, xwe bi jîngehê r̂a guncandîye. Hişkayî ji ser zuxavên kevirên gerim cêgîr bûne û bi

darbazbûne damê ji hev qedyane (lêktrazane) û av hişkaîyan ji hevdû biřîye û bi vê řewişê hoz, tîre, netewe û zimanên cor bi cor çê bûne.

Di přose ya şaristanyetê da, gel ziman û çanda xwe pêşxistine ku îřo wek nasname ya wan têne nasîn. Herwek nasname ya Îngilîsyan, Înglîstanî bûne, Kurd jî pêwîste bi bête xodan wê baweřê ku Kurdistanî bûne xwe bi nasname ya xwe bizanê.

Nasname ya neteweyî anjî hauwłatyî, ji hinek fakterên serekî pêkdê ku takên di civakê da bi hev řa grêdida. Ev takên di civakê da dijîn û grêdrawe yêk çandin û bi zimaneke havbeş û ciyawaz ji zimanên din diaxvîn, netewe û cîvakeke cihêreng (cudê) ji darubere xwe pêk tênin.

Dame ku mana ya netewe bûnê hate zanîn, pir asaye ku nasname ya neteweyî bête pejrandin. Kurd çi wek ziman û çi di aliye çand û hełsukewite řojane da, pir cihêřenge ji cîranên xwe ku Tirk, Fars û Ĥeřebin. Lê mixabin dagîrkerên Kurdistanê, bi ziman û çanda Kurdan, ziman

û çanda xwe dawłemendtir kirine. Bo minak eger hemî peîvên zimane Kurdî ji Farsî bêne darxistîn, netewe ya Fars bê ziman dibin. Zimanên Tirkî û Ĥeřebî jî, ji komkirine hemî zimanên řojhełate navin wek Babolî, Asurî, Berberî û Kurdî girtine, ku bi zordarîye şimşêrên xwe bi ser heremê da sepandine.

Wate zimane Kurdî egerçî herdam hatîye serkut kirin û bware geşestandine wî ne bûye, lê ji aliye wêjeyî, ji zimanên sê netewe ya dagîrkerên Kurdistanê dawłemendtire. Ji ber vê pêwîste ku nasname ya Kurdan bête pesend kirin û di aste nawneteweyî da, wek neteweyeke serbexwe û cuda ji Tirk, Fars û Ĥeřeban bête nasîn.

Bi bê danpênan (çespandin) bi nasname ya netewe ya Kurd û bi cugrafi ya Kurdistanê, kêşe ya neteweyî ya Kurd, nayê çareser kirin. Ta neyête çareser kirinjî, çi qas ji bo Kurdan zerermenda, ew qas jî, neteweyên Tirk, Fars û Ĥeřeb di paşketinê da dihêłê. Ji ber vê netenê Kurd belkî  neteweyên cîran û cîhanê jî pêwiste lêkołîn ji ser wê kêşeyê biken û řêyeke drust, bê dreng xistin

hełbijêrin. Ji ber ku her neteweyek ku xodan nîştman, çand û zimane xwe bû, mafe hebûne nasname ya neteweyî ya wîjî heye. Nîştmane gelê Kurd, Kurdistane û cugȓafî ya wîjî cihêȓenge ji Tirkî, Îran, Iȓaq û Suriye. Zimane gelê Kurdjî bi hemî zaraveyên xwe, pir ji Tirkî, Ĥeȓebî û Farsî cudaye. Hełsukevte ȓojaneye gelê Kurdjî, ji gelê Tirk, Fars û Ĥeȓeb cudaye. Ev sê sedamên serekî, faktên danpêdan (dirkandine)e navneteweîn ku gelê Kurdjî di Kurdistanê û navneteweyî da, bi nasname ya Kurdistanî bûne xwe bête nasîn.

Aşkiraye ku dîroke şoȓeşên xwênawîyên gelê Kurdistanê ji bo serxobûne welat û parêzgarî ji xwe, bełgeyên selmênerên nasname ya Kurdistanên.

**Beşe Dûhem**

## 2. Dîroka gelê Kurd û şor̂eşên Kurdistanê

Kes niye bizanê û kesjî di pêşer̂ojê da peîda na bê ku bizanê gelê Kurd ji kîdarê ve hatîye û çewe çê bûye. Herdam em zanî ku gelên dinê cîhanê ji kîdarê ra hatîye, ew dam, dikarin bêjin ku gelê Kurdjî, ji heman darê r̂a hatîye.

Bi terse dîroknasên ku ta îr̂o gelê Kurd bi gelên Hêndûêrupî dizanin, ku şeş hezar sał pêş zaînê ji nawçeyên Qefqazê r̂a bo nawçeyên çyaye Zagrosê koçber bûye, ez wîsa difîkrim ku ji dama ku mirov ji ser wê gerdun (cihan) êye, Kurdjî ji ser axe Kurdistanê jiyane.
Eger lêkołîneke zanistî bête kirin, peîkerên here kevnên cîhanê li Kurdistanê da bêne dîtîn. Lê mixabîn dagîrkerên Kurdistanê her tîşteke bi li Kurdistanê da wedozin (webînin), wî didizin û bê ser û şwên diken.

Kevintrîn pir̂tûke dîrokî ya şaristanîyetê "Giłgamêş"e ku 2750 sał pêş zaînê wek hełbest ji ser çendîn kevîrkên mezîn hatîye nivîsandin. Hełbestên Giłgamêş zêdatir ji sê hezar sał pêş Qur̂ane pîroz hatine nivîsandin û amaje bi yêkemîn şaristanîyete mirovayetîyê diken ku di pir̂tûkên pîrozên Qur̂an, Encîl, Tewr̂at û Avêsta da ne hatine bas kirin. Jiyan  û dastane Giłgamêş di Kurdistanê da bûye û kevirkjî di nawçe ya Neînewa (Musił) da hatine dozîn (dîtin). Giłgamêş padşaye Somer bûye ku xwastîye mirov ji kêvî bûnê r̂izgar bike û jiyan e şaristanîyê hîne wê bika.

Peîve Giłgamêş di hîç zimanên din da manaye wi nye, lê di Kurdî da manaye "kełe gamêş" wate gamêşe nêr, "kelle gamêş" wate sere gamêş, yan " geł gamêş" wate gamêşe nav geł û lêr̂ewar dida.

Hêjayê zanîne ku gelê Kurd di kevîn da mirovan bi ajełan dişipand û ji bo kesên zirek, navbangên ajeł (ĥeîvan)eke biwêr dihate danan. Bo mînak di serdame nihajî li gundan şipandîn tê bi karanîn ku "ew mirove wek kełe" wate pir bi hêze, anjî dabêjin "ew mirove wek şêre" wate

pir bi xîrete. Tenanet nave Şêrko ku bote navê mirovan, serçave ji şipandinê bi şêre, ku ajełeke bi xîrete.

Nave Giłgamêşjî ji bo heman mebestê hatîye bikar anîn. Di wan daman da, piranîye ajełan, kêvî bûne û Keła Gamêşjî di Kurdistanê da bi taqettirîn û bi xîrettirîn ajełe wê herêmê bûye. Ji ber wê ew nav bûye nasnave kesekî. Bi wê manayê em dikarîn bi şanazî bêjîn ku Giłgamêş û Somer, Kurd bûne û şaristanîyet ji Kurdan r̂a bo hemî cîhanê dast pêkirîye. Tê wê maneyê ku netewe ya Kurdjî herdam ji ser wê zêd û nîştmanê jiyan  kirîye.




Peîkere Giłgamêş di baxçe ya zanîstgehe Sîdnî.

Di vê peîkerê da Giłgamêş şêrekê di hamêz girtîye. Ev pîşan dida ku Giłgamêş ajełe kêvî, xomałî kirîye. Biłîndî û meiziniye wîjî, sê qate nêre şêrek bûye. Wate nasnavên "Kełe Gamêş, Kelle Gamêş û Geł Gamêş" jî bo wî mirovê pir guncav (lêhatî) bûne.


Giłgamêş 5000 sał pêş zaîn li Somer (welate nav dû çemên Dîcle û Furat) da wate beşek ji axe bakur, başur û řojava ya Kurdistanê û Iřaq da dastełatdarî kirîye û 126 sałan jyaye û piranîye jiyan e xwe jî, ji bo çareserîye pêşgirtine mirinê, darbaz kirîye.

## 2-1. Ȓeçełeke gelê Kurd di 6000 sał pêş zaîn (5300 sał pêş newroze Kawe)


Ȓeçełek (nijad)e gelê Kurd wedageȓê bo wan neteweyên ku di dîrokê da bi navên Lolo, Gotî, Ĥorî, Manî, Somer û Medya hatine nav birn.
Lolo li çyayê Zagrosê da dasteye Arî pêkanîne û dastełat (ĥikumet)e Medya damezrandine û di nav gelên din wek civake Medya hatine nasîn.

Lolo li 6000 sał pêş zainê pêwe, di Kurdistanê da dîroke xwe tomar kirine û di 2800 sał pêş zaînê dastełate xwe drust kirine.

Ji herêmên Ĥîlwan ta Zeĥawê di dastełate Loloyan da bûye ku herêmîn Silêmanî, Pîran (Şêxan), Şarezur û Kerkuk di xwe da digirt.



Dîmene peîkereke bizine kêvî ya serdame Loloyan ku wedageȓê bo 6000 sał pêş zaînê (5300 sał pêş newroze Kawe).



Dîmene peîkereke mirov ku 5000 sał pêş zaînê ji Loloîyan cêmaye.

## 2-2. Xêł (heşîret)e Pars

Xêłe Pars 5000 sał pêş zaînê ji asîya ya naveȓast wate ji navçeyên Tacekistanê ȓa koçbera Medya yê (Kurdistan û Îranê) bûne. Pars di navçe ya "Anşan" ku dibê Şîraze îȓo wek penaber nîştecê bûne.

Hêjayê gotinê ye ku çanda mîvandaretî ya gelê Kurd bûye ho (sedam) ku gelên din ȓû di mał û nîştimane gelê Kurd biken. Ji aliyeke din jî, ji ber dawłemend bûne ser ax û bin axe Kurdistanê, neteweyên din ȓû kirine wê welatê. Tenanet wan çend şeȓên mezinên dîrokîjî, di nav axe Kurdistanê da ȓûdane:

* Esekendare Meqdunî (împiȓatoȓe Yunanê) li hember Darwîş (împiȓatoȓe Îranê) 334 sał pêş zaînê ku têda beşek ji netewe ya Kurd hate komełkuj û koçber kirin.

* Împiȓatoȓe Ĥeȓeb ji ser nave Îslamê û bi ȓêveberîye Ĥezrete Ĥumer (xudê ji wî ȓazîbê) di sedaye hefteme zaînî ku têda bi sedhezaran Kurd hatne komełkuj û koçber kirin. Paşan Ĥeȓeban li parêzgehên Neînewa,

Kerkuk, Ĥeleb, Xaneqîn, Xoristan (Dizful, Xuzistan) cêgîr kirin.

* Çengîzxane Mexuł û dastełate Îranê di sedaye sêzda ku têda beşek ji Kurdan komełkuj û koçber kirin.

* Împiȓatoȓe Ĥusmanî û Îranî di sedayên sêzda ta şazdahe zaînî ku têda gelê Kurd hate komełkuj û koçber kirin. Di heman damê da Tirk, Azerî û Tirkmen li parêzgehên Wirmê, Erdałan, Xarpît, Erzincan, Erziȓom, Sêwas, Melatye, Mereş, Gazî Anteb, Ȓuhe, Neînewa û Kerkukê da hatne cênişîn kirin û çend xêłe Farsjî li parêzghên Hemedan, Kirmaşan, Luȓistan, Îlam, Kohgîluye, Bextyarî û Kazrun(Bûşehir) hatne nîştecê kirin.

Wate Kurdistan bi drêjîya dîrokê bûye meîdane kêşe û şeȓe dujminên gelê Kurd û milmlaneye dagîrkaran, û wîsa di bindastî ya dagîrkeran da maye. Ȓêye piranîye împiȓatoȓên cîhanê ketîye Kurdistanê û beşe xwe gelê Kurd kuştine û samane wîji bi tałan birine.

Hêjayê gotinê ye ku di sedayên heşt ta sêzdahe zaînî û dame fermanȓewaî ya Ĥebbasîyan li Îranê, jî berku di zimane Ĥeȓebî da pîte "p" tineye, Ĥeȓeb "Pars" bi Fars navzed kirine. Peîve Fars di zimane Ĥeȓebî da, tê wate ya espewan anjî şivane esipan.

Hêjayê sersuȓmanêye ku temen (ĥemir)e Azerîyan li ȓojhełate Kurdistanê, Tirkan li bakurê Kurdistanê û Tirkimenan li beşurê Kurdistanê da, na ga 700 sałan, lê mixabîn niha dastełatdare Kurdistanên û kełegaîye ser gelê Kurdîn û hemî postên ȓamyarî û abûrîjî bi dastê xwe girtine!




Peîkereke zêȓe paşmaî ya medya ku bo mozexane ya Tehranê hatîye dizîn.

**2-3. Dastełate Medya**


Nave gelê Medya ji 836 sał pêş zaînê (136 sał pêş newroze Kawe) r̂a hatîye zanîn ku li herême çyayên Zagrosê jyne û dastełate xwe çêkirine.

Dyako di sała 715e pêş zaîn serkirda ya Medyan bûye ku li dijî zordarî ya Asurîyan şor̂eş kirye. Dyako navçeyên Wirmê, Mukiryan, Soran, Baban, Sine, Hemedan û Kirmaşanê ji bindastî ya Asurîyan azad kir û di wan herêman da, dastełate xwe çêkir. Dyako ji bo azadî ya hemî netewe ya Medya û welate Medya di sała 712e pêş zaînê, li hembera Asurîyan şer̂ kir û di wê şer̂ê da gyan bexit kir.

Pîştê kujrane Dyako di heman sałê da "Keîxusrew"e yêkem bû bi serkirda ya Medyan û li hembere Asuryan şer̂ drêje da. Di heman sałê da, dastełate Medyan tê têkşkandin û Keîxusrew bi daste Asurîyan tê kujtin û paşaye Asuryan "Zuĥak" dast bi ser welate Medya dagrit.



Dîmene peîkerek paşmaiye netewe ya Medya ku wedageȓê ji bo 800 sał pêş zaînê.



Dîmenên çend peîkerên dastkirda netewe ya Medya ku wedageȓên bo 500 sał pêş zaînê û di mozexaneyên cîhanê da hatine biłav kirin.

## 2-4. Şoȓeşa Kawe ya Asinger li hember Zuĥake zordar di 700 sał pêş zaîn

Kawe miroveke pir biwêr, betwana û pîşe ya wî asingerî bû. Di wê serdamê da asingerî pîşe ya pispoȓên mezin bû ku asingeran ji zêȓ û zêv û mis, kelupelên pêwist, mînake keresteyên jiyan  û serbazî yê drust dakirin.

Zuĥak (Dahak) paşayeke zordar û dagîrkere welate Medya bû ku pir ji gelê Medya bi bê tawan kuşt. Zuĥak li welate Medya ku xwe nava "Mêzobotamîya" lê kiribû, paşayetî ya gelê Medya û Asurîyan dikir û paîtexte wî jî Neînewa bû. Zuĥak bi wê bihaneyê gel di tirsand ku ji ser herdû milên wî, serên dû maran hene û xwarine wan maranejî her ȓoj mêje dû mirovên gencên Medyayîn.

Di ȓastîyan da ji ser milên Zuĥakê mar ne bûne bełkê brîn hebûne, bełê Zuĥak xwastîye bi wê navê wireye gel nizîm û wan hirs bika. Wisa Zuĥak bi hezaran gencên Medya yî kuşt û xwast wê netewe yê têda berê.

Ew kes ku gerek her r̂oj serê dû gencên Medyayî bir̂îba û mêje wan bo Zuĥak biriba, qesabeke hinek mêrxas bû. Ew qesabe her car serê gencekî dibir̂î û mêje wî tevlî mêje pezekî dikir û ji bo çareserî ya birînên ser milên Zuĥakê dibir. Gencê dinjî biwê mercê azad dikir ku ji nawçe ya bin dastełatî ya Zuĥak r̂a, ber ve çyayên Zagros biçî û di wê da, xwe weşêrê. Bi wê r̂ewişê û bi nihênî pir xurtên Medyayî ji bo çyayên Zagrosê bi taîbetî Qendîlê r̂êkir. Yêkem kes ku wê qesabê ji bo çyaye Zagrosê şand, nave wî "Kurd" bû. Ew qesab hemî caran bi xurtên din digot, biçine çyayê Zagrosê ta kesek bi nave Kurd di bînîn. Be wê r̂ewişê daste ya Kurd li çyayên Zagrosê da zêda bû.

Damên ku darudaste ya Zuĥakê, serê dû lawên Kawe ya Asinger bir̂în, Kawe li Bêstunê r̂a bo Neînewa r̂êket û gelên wezałhatî jî hemî bi şwên Kawe da çûn û bi pilaneke dar̂êjtî û bi hevkarî ya qesabe mêrxas û daste ya Kurd, êriş kirne ser qeła ya Zuĥak. Di akam da, Kawe bi Zuĥak r̂a kete şer̂ û pişte pir milimlanîyan, bi kutke asingerî ya xwe, sere Zuĥakê pankir. Bi wê r̂ewişê û bi

agir berdan di ceste û małe Zuĥak, di wê řojê da mizgênî ya azadî, aştî û xoşî bo gelê Medya bidî anî.

Paşan daste ya Kurd û gelê Medya yêk girtîn û ji ber xoşewîstî ya daste ya Kurd, nave gelê Medya bi têpeřbûne dam, bûye gelê Kurd û welatê wanjî bû bi Kurdistan wate nîştimane Kurdan.
Bi bone ya serkevtine şořeşa Kawe ya Asinger û têkçune dastełate Zordare Zuĥak, gel agire xoşîyê wekir û her ji ber wê ye ku gelê Kurd bi agir wekirinê Newroze xwe pîroz dike.

Hêjayê gotinê ye ku soła Kurdîjî ji serkevtine şořeşa Kawe ya Asinger řa dast pêdake. Di řojjmêre Kurdî da, sał di heîva Avdarê (Xakelêwe) wate di 21/3e her sałê da nû dibê. Bi wê maneyê ku řêkevte 21/3/2013e di bê 1/1/2713e  Kurdî.

Di řoje Newroze her sałê da gelê Kurd yada Kawe ya Asinger vedaka û řêbaze wîjî drêje pêdida.  Peîve Newrozjî ji "nû řoj" we hatîye. Wate hemî sałan řoje serkevtine Kawe bi ser Zuĥak da, mînake sała nû, tê

cêjn girtîn. Ji wê damê ta îřo bi wê řewişê Newroz li Kurdistanê hatîye pîroz kirin.

Paş kujrane Zuĥak, gelê Medya ji bo sê heîvan di aştî û xoşî da jiyan . Temene Kawe şest sałî bû, çimkî temene Kurd sî sałî bû, Kurd kirne paşa ya Medya û bajare "Îkbatana" (Hemedan) jî kirne paîtexte wî.

Di wê dama zêřîn da "Fereîdun Cemşîda Sasanî" ku kuře esipewaneke çalake Pars bû, dostayetî bi Kawe řa drust kir û piştgîrî ya xwe ji paşayetî ya Kurd řa řagehand.

Fereydun ji bo pîrozbaî ya serkevtîna Kawe, li bajare "Anşan" (Şîraz) cêjneke şikodar řêkxist û Kawe û Kurdjî banghêşte wê festîvalê kir. Medya yî bi hêzeke 200 kesê çune wê mîvandarî yê û ji aliye hêzeke 1000 kesên Pars řa hatine pêşwazî kirin.

Di dame nan xwarinê da, řimbazêne esipswaran û kêbiřkê di navbere Medyaîyan û Parsan hate dast pêkirin. Di meîdane řikeberekî da, Parsan ew qas

r̂imbazên bi Medyaîyan kirin ta di xoşîyan da, wan sexoş û mandi kirin. Di heman damê da Fereîdun xeîyanet bi Kawe û Kurd kir û di dama nan xwarinê da, wan darmandaw (jehirxwar) kir. Parsan bi wê pilane na mirovane û di dû damjimêran da hemî hêze Medya di gome xwên da sor kirin. Bi wê r̂ewişê Pars hatine ser text û netewe ya Kurd kirne koîle ya xwe.

Pir kes ji gore berjewendî ya neyarên gelê Kurdistanê, wê dîrokê bi efsane dizanin, lê belê ew r̂ûdaweke r̂ast û heqiqete gelê Kurda.

Tê zanin ku neyarên Kurdistanê wê qar̂emanetîya Kawe ya Asinger nikarîn pesend (qibûł) biken û her ji ber wê, hewił didan ku wî wek efsane bidane nasîn û Newroz jî wek cejneke xwe binasênin û mane û naveroke wi jî li gor berjewendî ya xwe bi gor̂ênin. Bo mînak Tirkan herdam li dijî Newrozê bûne, bełê di sała 1999e dastełate Tirkiye ji bo yêkemîn car r̂agehand ku Newroz cejne Tirkane û tenanet serok komar û serok wezîrên Tirkiye xapanwarane bi ser agir da bazdan (çim kirin). Farsanjî bi heman r̂ewişê Newroz kirine cejne xwe û bi

"çarşemme sorî", "sifre ya heft sîn" û "sêzda bedar" mane û naveroke wê cejne neteweî ya Kurdan guhaȓîne û sûk kirine.




Nexşe ya împiȓatoȓe Medya di dame fermanȓewaî ya Kawe û Kurd, 700 sał pêş zaînê (wate yêkemîn sała Kurdî)

## 2-5. Fruartîs serkirdeya Medya di sała 674e pêş zaîn

Gelê Kurd di sała 674e pêş zaînê bi serkirdayetî ya Fruartîs (Kaşa Torîto) li hembere Parsan şeȓ kir û nawçe ya Hemedanê azad kir. Fruartîs bajare Hemedanê kire paîtexte dastełate xwe. Paşan Asurîyan êriş kirne ser dastełate Medya û Fruartîs jî di wê şeȓê da hate kujtin û dastełate wî jî di heman sałê da hate têkdan.

## 2-6. Sazkirine dastełate Medya bi serokatîya Keîxusrewe dûhem di sała 625 ta 550e pêş zaîn

Di sała 625e pêş zaînê gelê Kurd bi serkirdayetî ya Keîxusrew dastełate xwe sazkir. Keîxusrew miroveke zana bû û karî ku leşkireke yêkgirtî ji gelê Kurd çêke û li hembere zordarên Asurî û Pars şoȓeşê ȓêkxa.

Keîxusrew di wê şoȓeşê da serket û dastełate Medya sazkir û 32 sałan dastełatdar bû. Paşan Keîxusrew di sała 593e pêş zaînê, di temene 70 sałî da çu ser dilovanî ya xwe.

Lawê Keîxusrew "Astyagis" ji sała 593 ta 550e pêş zaînê serkirdayetî ya dastełate Medya girte ser milê xwe. Astîagis ji bo 37 sałan dastełatdar bû û paşan ji aliye Kuriş (Sîrus) dastełate wî hate têkdan. Kuriş lawe Gambûse Pars bû û Gambûse Pars ji fermanȓewa ya parêzgehe Anşan bû. Anşan yêk ji parêzgehên dastełate Medya bû ku niha dibê parêzgehe Fars ku merkeza wî Şîraze. Mandan daîke Kuriş û kiçe Astyagis bû. Paşa ya dawî ya Medya, Astyagis ku bapîre Kuriş bû. Kuriş ji xizmayetî ya gelê Medya kelik girt û małbate Astyagis xapand û hemî paşayetî ya Medya banghêşte Anşanê kir û wan darmandaw kir. Kuriş wisa dastełate Medya têkda û di sała 550e pêş zaînê dastełate Pars damezrand û wisa dastełat ji netewe ya Kurd ȓa kete daste netewe ya Pars.

Kuriş keseke xodan quwet û gûhe ȓaste wîjî ȓeş bû. Ji ber wê di zarokatî ya xwe ȓa nasnave gûh-ȓeş ji bo wî hatibû danan. Paş hatine ser dastełatê nava xwe kir bi Kuriş û Sîrus.



Peîkereke şêr ku wedageȓê bo serdame împiȓatoȓe Medya û ji çya ya Nimruda bakurê Kurdistanê ȓa, hatîye dizin û birine mozexane ya Londonê. Drêjaî ya wê peîkerê 3 û bƚînda ya wî 1.5 mître û ji kevirke meȓmeȓ hatîye çêkirin. Bi dayan peîkerên çyaye Nimrudê li wê mozexane yê da hene ku nava welate Tirkiye li ser nîvîsandine.



Aƚaye împiȓatoȓe Medya




Nexşe ya welate Medya di sała 580e pêş zaînê ku sinurên wî jî kendawe Medya ȓa bigre ta tê darya ya Medîterane û Xezer, hemî Îran, Tacekistan, Efxanistan, Pakistan, Tirkimenistan, Ermenistan, Irȓaq, Kwêît,  Qeter, Emaretên Ĥeȓeb û Kurdistanê di xwe da digirt.



Dîmene çyaye Nimruda bakurê Kurdistanê, şûneware dîroke serdame Medya ku dahan car ji alîyên Tirkiye, Îran û Ĥeȓeban ȓa hatîye wêran kirin.

## 2-7. Şoȓeşa Etrupat di sała 323e pêş zaîn

Etrupat yêk ji serkirdayên serbazî ye "Daraî Sêhemîn" bû û di sała 323e pêş zaînê li hembere dawłete Pars Şoȓiş kir û dasłate Medya ye Biçuk damezrand. Ew dasłate ta sała 331e pêş zaînê sinurên xwe freh kir û nawçeyên Wirmê, Mako, Xoî, Sełmas, Nexeda, Şino, Xanê, Mihabad, Bokan, Mîyandwaw, Serdaşt û Bane di xwe da girt. Bajare Wirmê paîtexte dasłate Medya ye Biçuk bû.

Di sałên 226 ta 248ên zaînî hênek ji hozên Pars mînake "Pars Awa" û "Pehłwî" êriş kirne ser dasłate Medya ye Biçuk û wê dastełatê têkişkandin û pir ji gelê sivîljî komełkuj û tałan kirin. Serkirdayên dastełate Medya ji naçarî penabere Ermenistanê bûn.

Dasłate Medya ye Biçuk ji bo 571 sałan di ȓojhełatê Kurdistanê dastełatdaî kir. Paş têkçune wê dastełatê, gelê Kurd bo sedan sał di bindaste Parsan û împiȓatoȓên dînê herêmî da ma.

## 2-8. Êrişa Ĥeȓeban bo ser Kurdistan û Îranê di sała 634 ta 644ên zaînî

Hezrete Miĥemmed (drûda xudê jê bê) di sała 570e zaînî li bajare Mekke ye Ĥeȓebistanê jî daîk bû. Di temene zarokî da, daîk û bavê wî mirin û jem apê xwe Ebûtalib mezîn bû. Ebûtalib serkirda ye xêłe Binî Haşmî bû ku yêk ji mezintirîn û zordartirîn małbate bajare Mekke bû. Miĥemmed kełk ji dastełatdarî ye Ebûtalib girt û di nav Mekke û Şame ewsa da, di dastpêkê da karê karwançyetî û ȓêgirî dikir. Bo mînak ew di şeȓe "Bedir" bi dahan karwançî yên wek "Ebû Hekem" û "Ebû Sofîyan" tałan kir. Paşan wî bi apê xwe Ebûtalib ȓa kêşe ye ȓikeberekî ye dastełatê çê bû û bo berjewendî ye małî bû bi hawjîne dawłemendtirîn bêwejine, bi nave Xedîce Xeweîlut. Miĥemmed bi dahat û drawe Xedîce Xeweîlut dast kir bi bazirganî yê û bi hezaran berda kiȓî û leşkireke toqêner (xofêner) ji wan drust kir. Paşan bo bedast anîne samane zêdatir, bi nav pêxemberî bû bi serleşkire Ĥeȓeban. Ew karî dastełate Binî Haşîmî ji dastê Ebûtalîb darbixa. Pexember di sała 621 ta 632e zaînî bi pencê hezar swaran ȓa, çendîn car di şeȓên Bedir, Uhud,

Xendaq,Tibûk, Binî Musteq û Îrmuk da ji bo ser hoz û serkirda yên navdare Ĥeȓeb wek Ebû Hekem (ku nasnave Ebû Cehil ji ser danan) û Ebû Sofîyan êriş kir. Paş çendîn şeȓên dûr û dirêj û xwênawî ku di îslamê da bi şeȓên muşrikîn nav diben, supa ye Hezrete Miĥemmed hemî nawçe yên hicazê (Mekke û Medîne) girte bin dastełate xwe.

Hezrete Miĥemmed di sała 628e zaînî di nameyêk da, Xusrew Perwîz bo ser ole îslamê banghêşt kir. Xusrew Perwîz paşayêke Sasanî ya Zerdaştî bû ku di sała 590 ta 628e zaînî li Hemedan, Kirmaşan û herêmên dinê Îran û Kurdistanê dastełatdar bû. Xusrew Perwîz xwe ne da bidastewe û name ya Hezrete Miĥemmed diȓand (qetand).

Paş dilovanî ya Hezrete Miĥemmed, Hezrete Ĥumer (xudê jê ȓazî bê) bi serkirdayetî ye "Ĥebdułȓehman Binî Ĥuf" bi şest hezar swarên Ĥeȓeb û bi nave ole îslamê di sała 637e zaînî êriş kire ser Kurdistanê. Di şeȓê Nehawendê da ku bi serkirdayetî ye "Sarîye" û di şeȓê herême Neînewa ku bi serkirdayetî ye "Yaz Binî Xenem"

û di şeȓê Mardîn û Amedê bi serkirdayetî ye "Qehqah Binî Ĥemir" bi dahan hezar Kurd bi şimşêran ser biȓîn û ji komełkujî ye gelê Kurd gome xwênê çê kirin. Di wê komełkujî yê da, mezin sałên ku serê xwe ji hemberê Ĥeȓeban netawandin, wan zîndabiçał kirin. Di akam da tenê zarokên jêr dah sałan zîndî hêştin û bi zore şimşêran çanda Ĥeȓeban bi nave olî bi ser wan da sepandin. Ĥeȓeban mał û samane gelê Kurd bi nave małe kafiran tałan kirin (bi xaret birin). Di wan şeȓan da, bi sed hezaran Kurd bi daste Hezrete Ĥumer û darudaste ya wî hatine qetił kirin û dah hezar kiçên Kurd wek kenîze (koîle ya sêksî) bo Ĥeȓebistan birin. Piştê wan şeȓane, ji aliye Hezrete Ĥumer bo her Ĥeȓebek ku di şeȓê dagîr kirine Kurdistanê da beşdarî kiri bû, 12 darhem wek padaşe şeȓê (xenîmete cengî) bi xełat hate pêbexşîn.

Hezrete Ĥumer ji ser nave îslam û bi alîkarî ya hinek Kurdên berjewendîxaz ku Ĥeȓeban nave Şêx (Pîr) û Seîd (Axa) ji ser danan, bingehe xwe li Kurdistanê da wekir. Şêx û Seîdan ji aliye Hezrete Ĥumer dihatine bikar birin ku sałane berat û zekat bo Ĥeȓeban top biken û bişêne

Hicaz (Ĥeȓebistan)ê. Bi wê ȓewişê hem Şêx dastełatdar bûn û hem Ĥeȓeb ji samane Kurdistanê kelke xwe dagirtin. Ew bûye binas ku çanda Ĥeȓeb jî, bi nave ole îslamê xwe bi ser Kurdên Zerdaştî da bi sepênê.

## 2-9. Dastełate Sacidiyan û îmarete Kurdistanê di sała 889 ta 932e zaînî

Di serdame dastełate Tahîriyan ji ber darefetên xirape abûrîye Îranê, gel řapeřîn û di wê welatê da heft dastełatên serbexwe drust bûn. Li Kurdistanê dastełate Sacidiyan bî nave îmarete Kurdistanê hate damezrandin. Sinurên wê îmaretê hemî řojhełate Kurdistanê û Hemedan ji di xwe da di girt. Ew dastełate ji aliye małbate Sacidiyan hate damezrandin û her ji ber wê jî bi vê navê tênasîn.

Sacidiyan di sała 889 ta 932e zaînî bo 43 sałan di Kurdistanê da dastełatdar bûn. Di sała 932e zaînî "Merdawîce lawe Zîyar" ku dijî dasełatdarên "Alîziyar"e Îranê bû, bi nave ole îslamê êriş kire ser îmarete Kurdistanê û dastełate Sacidiyan têkşikand. Bi wê řewişê dawî bi dastełate îmarete Kurdistanê hat.

## 2-10. Dastełate Merwanî ya Kurdî di sała 930e zaînî

Dastełate Merwanî bi daste "Baze kuȓê Dost" ku ji małbate Merwaniyan bû, hate çê kirin. Baz di çend êrişan da bajarên Erdîş, Çałdêran û Melazigirtî azad kir. Paşan di berdawamî ye xebate xwe da, Amed (Diyarbekir) û Farqîn girte jêrdastê xwe.

Baz di sała 930e zaînî li Amedê dastełate Merwanî damezrand. Dastełate Merwanî di vê damê da xodan hêz bû ku karî hemî bakurê Kurdistanê ji dastê Parsan azad bika.

Baz di sała 960e zaînî xwast hemî herêmêm Kurdistanê azad bika û bo wê mebestê jî, bi supa ya xwe ȓa ȓêket û li nizîk bajare Musiłê di şeȓe dije dastełate Hemdaniyên Pars da, giyane xwe bexit kir û paş 30 sał dastełatdarî hate têkşikandin û dawî bi temene wî hat.

## 2-11. Dastełate Şeddadî ya Kurdî di sała 951e zaînî

Dastełate Şeddadî ya Kurdî di sała 951e zaînî ji aliye Małbate Şeddadî li herême Eranê hate drust kirin. Temene wê dastełate drêj bû û karî sinurên xwe fireh ka. Bajarên Nexçewan, Gence, Tîflîs, Damîrqapî, Anî û Duinî di jêr dastełate Şeddadî da bûn û paşan herême Melatya jî girte dastê xwe. Hawdam li başur dastełate Merwaniyan û li řojhełat dastełate Xeznewiyan hebûn. Dastełate Şeddadî bo 124 sałan ji aliye dastełatdare Şeddadî ve hate biřêve birîn, bełê paşan bi êrişe Melîk Şa ye dastełatdare Selcuqiyan di sała 1075e zaînî dawî bi temene wê hat. Dastełatên Kurdî yên Merwanî û Şeddadî bo 9 sałan hawdam dastełatdarî kirin, bełê yêketî û dostayetî ya xwe pêk neanîn, egîna (heke ne) li hemeber dujminan da bi sêneyî (asanî) ne dihatine têkşikadin.

## 2-12. Zordarî ya  Selcuqiyan di sała 1049 ta 1279e zaînî

Selcuqiyan di sała 1049e zaînî di şeȓê li hemeberê "Bûweyehiyan" serketin û dastełate Selcuqiyan damezrandin. Ew ji seda ye yazda ta seda ye sêzda ye zaînî di herêmên Îran, Iȓaq, Suriye û Kurdistanê dastełatdarî kirin û bi nave îslam û bî bihane ye kafirbûnê, zordaryêke bêmînak ji gelê Kurd kirin û pir ji Kurdan kuştîn û samane wan jî tałan kirin. Bi wê şêwazê gelê Kurd çewsandin û welatê wan jî dagîr kirin.

Bi taîbetî sułtane yêkemîne Selcuqiyan ku "Tuxȓołe kuȓe Selcuq" bû di wê kuştubiȓe da serkirdayetî dikir.

Dastełate Selcuqiyan bi daste Ĥusmaniyan hate têkşikandin û di sała 1279e zaînî dawî bi temene wî hat.

## 2-13. Êrişe Mexułiyan bo ser Kurdistanê di sedayên 13 û 14e zaînî

Di sedayên sêzda û çarda ye zaînî Mexułiyan êriş kirine ser Kurdistanê, pir Kurd kuştîn û samane wan jî tałan kirin. Dûhemîn Yelxane Mexułîyan "Ebû Seĥîda kuȓê Sułtan Miĥemmed" bû ku bi "Bihador" hatibû nasîn û di sêzda sałî da, hate sertexte dastełatê.

Paşan "Emîr Teîmure Gurganî" sełtenete Bihador têk da û li Îran da çend dastełat pêkhatin û li heman damê da Kurdên ȓojhełat jî, di sała 1315e zaînî dastełate Kurdî damezrandin.
Ew dastełate Kurdî, ji aliye "Şêx Hesene Gewre" navdar bi "Hesen Îlkanî" hate damezrandin.Temene dastełate Kurdî kêm bû û paş 9 heîvan, ji aliye dagîrkere Îranê hate têkşikandin.

## 2-14. Emîr Şerefxane Bitłîsî di sała 1597e zaînî

Şerefxan nuser û zanayeke Kurd bû ku di sała 1597e zaînî li bajare Bitłîsê berhemeke wek Şerefname nivîsî. Bajare Bitłîsê di serdame Şerefxan da bibû bi navendake zaniyarî, hunerî û pispořî ye cor bi cor. Di wê serdamê da Şerefxan hest bi berpirsiyaretî kir û berheme zanyarî ye cor bi cor ji ser gelê Kurd di piřtûkxane ya bajare Bitłîsê da top kir.
Paîtexte mîrnişîne Şerefxan bajare Bitłîsê bû. Ew małbate di sedayên 16, 17 û 18 bihêz bû û ji bindastî ya dagîrkere Tirke Ĥusmanî, azadî û serbestî ya xwe bidest xistibû. Di serdame "Emîr Ĥebdałe nevî ye Şerefxan", "Melîk Eĥmed" ku serkirda (walî) ya Ĥusmaniyan bû, bo ser bajare Bitłîsê êriş kir û agir berda piřtûkxane ya Şerefxan. Di akam da, çar hezar piřtûkên binirxên wê piřtûkxaneyê û heftê dastnusên zansitî ya bi kelik hatine şewtandin.
Melîk Eĥmed małbate dawłemenda Şerefxan tałan kir, bajare Bitłîs ji wêran û kavil kir. Bi wê alîyê mîrnişîne Bitłîs hate têkdan.

Hêjayê gotinê ye ku wê Şerefname ya ku niha di berdastan daye û bi zimane Farsî hatîye nivîsandin û paşan bo R̂ûsî û Kurdî (Kurmancî û Soranî) hatîye wergeȓandin, nivîse Şerefxan nîne. Naşêt (mumkin nîne) miroveke zana wek Şerefxan nasname ya Kurd bi Ĥeȓeb û îslamê ve grêbida. Bełkê ew ȓunuse, dastkird û bełavkrave ya Melîk Eĥmeda ku bi mebeste sûkayetî kirin bi gelê Kurdistanê û çewaşekirine dîroke Kurdistanê ve hatîye bław kirin. Her ji ber wê, Kurdistanî di bê kesayetî ya Şerefxan û nasname ya Kurd bi piȓtûke dastkarî kirî û şêwêndrawe Şerefname, nas neken.



Emîr Şerefxane Bitłîsî

## 2-15. Tawan (cinayet)e Sefewiyên Îranî dijî şoȓeşên Kurd di sałên 1500 ta 1639e zaînî

Di serdame Sefewiyan wate di sałên1500 ta1639e zaînî xełkê Kurdistanê pir şeȓ û naxoşî dîtin."Şa ÎsmaĤîle Sefewî" di sałên1524 ta 1547e li hemebere nasname ya neteweî ya Kurd, pilanên qiȓêj kir û Kurdan bi qazance xwe bikaranî.

Paşan "Şa Teha Masbî" ku pişte Şa ÎsmaĤîl hate ser kar di sała 1554e zaînî êriş kire Kurdistanê û di ȓê da her kes hate pêş wî, kuşt û herêm jî wêran kir. Şa Teha li dijî "xêłe Dumbilî" komełkujyêke bê mînak pêkanî.

Paşan "Şa Ĥebbase Sefewî" di sałan 1587 ta 1629e zaînî çendîn car êriş kire ser Kurdên bajare Xoî û pelamare "xêłe MeĤmûdî" da ku serkirda ye wan "Mistefa Beg" bû.

Mistefa Beg bi xwe û bi law û çekdarên Kurd azatîyêke bê mînak ji bo parastine qeła ye Mako pêkanî. Bełê di akam da bergehe hêze dagîrkere Îranê negirt û hate

têkşikandin. Sefewiyan paş kuştareke mezin, bi hezaran jin û zarokên Kurdan girtin û rewaneye bakurê Xuȓasanê û Quçanê kirin.

Di sała 1592 peîmane Îstanbûł di navbere împȓatoȓên Sefwî û Ĥusmanî da hate bestin. Li gor wê peîmanê 50 hezar Kurdên Ĥelewî ji bakurê Kurdistanê ȓa bo Xuȓasan û Gîlanê hatne ȓapêç kirin û di şeȓe dijî Tirkemenistanê da hatne bikar anîn.
Împiȓatoȓên Ĥusmanî û Sefewî herdam Kurdan di pêşe şeȓan da bikar anîne. Di van şeȓan da bi dahan hezar Kurd bi dastê hevdû hatne kujtin.
Di sała 1608 da, Şa Ĥebbas dorpêçe qeła ye Dimdime nizîk bajare Wirmê kir ku Kurdên Bradost tê da dijîn. Ew şeȓ çend heîvan kişand û di akam da hemî Kurdên ku di qeła yê da bûn, bo parastine qeła yê ta gîyan bextkirinê şoȓeşgeȓane şeȓe bergirî yê kirin. Pişte dagîr kirine qeła yê, Şa Ĥebbase Sefewî bi leşkirên xwe pelamare "xêłe Mukrî" da û kuştareke pir ji wan kir û nizîk15000 małbatan penabere herême Xuȓasanê kir.
Sereȓaî wan tawanên (sucên) Şahên Sefewî, Kurdan ser bo dagîrkeran ne tawandin û di seda ye şazdahem da

"Hełoxan seroke xêłe Erdałan" serhełda û serbexoî ye Kurdistanê řagehand.

Pişte Hełoxan, "Xan Ĥemexane lawe Hełoxan" cêye bavê xwe girt û tenanet drawe Kurdî bi navê "Geła" di řojhełatê Kuristanê da çap kir û bikar anî.

Dastełate Kurdî ye Xan Ĥemexan di sała 1638e zaînî hate damezrandin û di sała 1639ê da Seîfedîn Şa ye Îranê êriş kire ser wê û paş şeřeke dijwar di herême Merîwan, Kurd têkşikan û Xan Ĥemexan ji naçarî penabere dastełate Ĥusmanî bû û paşan li bajare Musiłê çû ser dilovanî ye xwe.

## 2-16. Peîmane Qesre Şîrîn di sała 1639e zaînî

Şeȓe Çałdêranê di sała 1514e zaînî di mabeîne dastełatên Ĥusmanî û Sefewî da dast pêkir. Ew şeȓ ji ser dagîrkirine axe Kurdistanê nizîk 130 sałan kişand. Kurdistan her car di jêr daste yêk ji wan dû dagîrkeran da bû. Di sała 1590e zaînî Şa Ĥebbase Sefewî di şeȓê dijî Ĥusmaniyan da têkşike û paşan ji naçarî peîmane aştî bi dastełate Ĥusmanî ȓa best. Di wê peîmanê da Îran naçar ma ji Kurdistan, Gurcistan, Ermenistan û Azerbaîcanê xwe wekşênê. Paş wekşîne Sefewiyan, ew herêmane ketne jêr dastełate Ĥusmaniyan. Şa Ĥebbase Sefewî di sała 1603e zaînî bi dastełate Ĥusmanî dûbare şeȓ drust kir. Di wê şeȓê da Îran karî bo careka din ȓojhełatê Kurdistanê û Azerbaîcane ku îȓo jêrdaste Îranê ye, dagîr bika.

Dastełatên Ĥusmanî û Sefewî ye dagîrkerên Kurdistanê di sała 1639e ȓêkkevtin û di bajare Qesre Şîrîn peîmanek wajo kirin. Di wê peîmanê da herêmên Erdałan bi ser Sefewiyan û herêmên Mukiryan û Şarezur jî, bi ser Ĥusmaniyan da hatne dabeş kirîn. Herêmên Cizîr,

Wirmê, Soran, Baban wek mîrnişînên Kurdî man. Mîrên Kurd ji alîyêkî şeȓe dij bi dagîrkerên Ĥusmanî û Sefewî dikirin û ji alîyêka din şeȓe birakujî. Ta sała 1813e zaînî ku tê da dagîrkerên Sefewî û Ĥusmanî peîmane dûhemîne Qesre Şîrîn wajo kirin û bi wê alîyê bi ser Kurdan da serketin. Di wê peîmanê da Kurdistan bi temamî kete bindaste dastełatên Ĥusmanî û Sefewî. Ew jî bi xwaste berjewendî ye xwe, di nav xwe da, dabeş kirin. Di akam da ȓojhełate Kurdistanê kete bin daste Sefewiyan û beşê dinê Kurdistanê ketne bin daste Ĥusmaniyan.




Nexşe ye mîrinşînên serbexwe ye Kurd

## 2-17. Şoȓeşa şêx Ĥubeîduła Nehrî di sała 1880e zaînî

Di sała 1880e zaînî nizîk şêst hezar Kurd û Asurî bi ȓêberî ya "Şêx Ĥubeîduła Nehrî" û kuȓe şoȓeşgeȓe wî bi nave "Ĥebduł Qadir" li dijî zordar û dastdrêjî ye dastełate dagîrkere Îranê dast bi şoȓeşê kirin. Ew serhełdane wek brusk bi ser dagîrkeran da serket û Kurdan di dameke kêm da piranî ye axe ȓojhełatê Kurdistanê azad kirin.

Dastełate Îranê bo têkşikandine wê şoȓeşê, ji dawłetên Îngilîs, Ȓûs û Ĥusmanî alîkarî xwast. Wan dastełatan jî, bi hevȓe dijî şoȓeşa Kurdan dast bi kar kirin û bi nave brayetî û hav oli, Şêx Ĥubeîduła Nehrî xapandin. Neyarên Kurd, ji Kurdan ȓa gotin: "bile emê bi hevȓe aştî çekeîn, paşan pêktêîn û mafe azadî ye netewe ya Kurd jî didaîn".

Bi wê pilanê Şêx Ĥubeîduła Nehrî bangêşte bajare Îstanbûlê kirin. Damek Nehrî gehişte Îstanbûlê, bi kelik û kulikê dujminan zanî û bi nihênî, ji Îstanbûlê ȓa wezevrî Şemzînan. Bełê hêze serbazî ye Ĥusmaniyan bi şwên Şêx Ĥubeîduła Nehrî da ketin. Li Şemzînan êriş kirin, wî

bi dîl girtin û r̂ewane ye bajare Mekke ye Ĥer̂ebistanê kirin.

Di encam da dastełate Ĥusmanî di sała 1883e li bajare Mekke Şêx Ĥubeîduła Nehrî kuşt û gotin ew çuye dilovanî ye xwe. Be vê r̂ewîşê dagîrkeran êriş kirne ser şor̂eşa gelê Kurd, wî têk şikandin û dîsa Kurdistanê dagîr kirin.

"Ĥebdul Qadir Nehrî" kur̂e Şêx Ĥubeîduła Nehrî di sała 1908 çû Îstanbûłê û di sała 1925an têkiłiye şor̂eşa "Şêx Seĥîdê Pîran" dibê û paş têkçune wê şor̂eşê, bi Şêx Seĥîdê Pîran r̂a ji aliye dastełate Tirkiye tê dar kirin.

**2-18. Şoȓeşa Bedirxan Paşa di sała1880e zaînî**

Bedirxan Paşa pir xebat kir ta yêketî bi serok xêłên herême Ĥekkarî çê kir û peîmaneke dostanî bi nav "peîmane pîroz" bi wan ȓa wajo kir. Aȓmance peîmane pîroz ew bû ku Kurd yêketî ye xwe çê ken û bo standine mafên xwe û ȓizgarî ye axe Kurdistanê li dijî dagîrkere Ĥusmanî ȓapeȓin û şoȓeş biken. Di wê peîmanê da, seroke xêłe Erdałan ku ji ȓojhełate Kurdistanê bû, beşdarî kir. Bi piştgîrî ye Kurdên ȓojhełat, ew şoȓeş firehtir bû. Bedirxan bi neteweyên Asurî û Ermenî ȓa peîmaneke dostanî û alîkarî wajo kir. Ew gel bi hevre sozdan ku dijî dastełate Ĥusmanî şoȓeş biken. Bełê pêş şoȓeşê, dastełate Îngilîs karî Asurî û Ermeniyan ji herêmên Kurdistanê û şoȓeşê dûrbixa.

Bedirxan Paşa di sała1812e li serhełdanek da, emaretên Cizîr û Botanê ȓizgar kir û xiste ser fermanȓewaî ye dastełate xwe. Paşan xwast hemî emaretên Kurdistanê azad bika. Bo wê karê Bedirxan Paşa peîwendî bi pîranî ye beg û serok xêlên Kurd kir ku her yêke mîre herêmên xwe bûn. Bedirxan Paşa ji mîrên Kurd dawa kir ku dijî

dagîrkeran yêkgirin û bo ȓizgar kirine Kurdistanê şoȓeş biken. Wan mîran daxwazî ye Bedirxan bicê anîn:

- Mistefa Beg û Darwêş Beg ji mîrên herême Wan.
- Ûreła Beg mîre herême Ĥekkarî.
- Fetaĥ Bege Ĥekkarî.
- Xalîd Bege Zeĥîmî û Şerîf Bege mîre herême Muş.
- Ĥusên Beg seroke xêłe herêmên Qers û Acar.
- Pîr Usif mîre herême Zaxo.
- Pîr Heme mîre herême Musił.

Bedirxan Paşa di herême Cizîrê kargeheke drustkirine çek û teqemenî damezrand û çend xwêndkar bo şarezayî û fêrbûne drustkirine çek û bikar anîne wan, şanda Eurupa yê. Di heman damê da, di "girave bajare Wanê" bedirxan baîxeke pir bi gemî drustkirinê da. Bedirxan di dame şoȓeşê da herêmên Wan, Wirmê, Mukiryan, Soran, Musił, Sincar û Wêranşarê azad kir.

Ĥusmaniyan bi serokatî ye Ĥumer Paşa û bi alîkarî ye Îngilîsan bo ser şoȓeşgerên Bedirxan Paşa êriş kirin.

Di yêkem şeȓ da ku li herême bajare Wirmê ȓû da Kurd serketin. Paş wê serketinê "Yezdan Şêr" (Ĥêzeddîn Şêr) ku serkirdayêke hêzên Bedirxan û pismame Bedarxan jî bû, xîyanet bi şoȓeşa Kurdan kir û bi hêzê xwe ȓa, çû pał hêze Ĥusmanî û bi wê aliyê hêze Bedirxan Paşa şikan û emarete Cizîr ji aliye Ĥusmaniyan hate dagîr kirin.

Di drêjeye wê şeȓê da, Kurdan careke din emarete Cizîrê azad kirin. Bełê dîsan Ĥusmaniyan bi arîkarî ye krêgirte yen Yezdan Şêr, êrişe ser Cizîrê kirin. Serencam şoȓeşgêȓên Kurd nikarîn ji hember wan êrişan da xwe biparêzin û têkşikyan.

Bedirxan Paşa bi hêze xwe ȓa ȓû kire qełaye Eȓuxê û di wê qełayê da heşt heîvan ji aliye hêzên Ĥusmanî û Kurdên xofroşên Yezdan Şêr ȓa hatne dorpeç kirin û gemaro dan. Di akam da, hêzên Bedirxan Paşa ji ber qedyane xwardamenî û teqemenî yê, têkşikyan û hemî Kurdên şoȓeşgêȓ hatne kuştin. Hêvî ye Bedirxan Paşa jî, ser neket û bi dîlî kete dastê dastełate Ĥusmaniyan û ji bo bajare Îstanbûłê û Paşan Şam (Dîmeşq)ê hate şandin.

Bedirxan Paşa dawî ye jiyan e xwe li penaberî û jêrdastî yê da biser bir. Ew şoȓeşgêȓe di sała 1868 li Şamê, ji aliye Ĥusmaniyan ra bi nave nexoşîyê hate kuştin û terime (cenaze) wî li goȓistane Kurdan li Şamî hate bin ax kirin. Hêjayê zanine ku Bedirxan Paşa di dame xwe da, drawe Kurdî bi nave "Geła" ji çap da û li herême jêr dastełate xwe bikar anî.

## 2-19. Şoȓeşa ȓoşenbirî û neteweî ya Ĥebdulȓezaq Bedirxan di sała 1912e zaînî

"Ĥebdulȓezaq Bedirxan" di sała 1846î zaînî li îstanbûłê ji daîk bû û kuȓe "Necîb Paşa" û nevî ya Bedirxan Paşa bû. Bo fêrbûne xwêndine zimane Kurdî çû bam mamosta û hozanwane mezine Kurd "Ĥacî Qadre Koyî" û bû bi xwêndkar tirîn Kurda serdame xwe.

Ĥebdulȓezaq Bedirxan bo azad kirin û serbexoî ye Kurdistanê hewłeke zêda da û şoȓeşeke ȓoşinbîrî-neteweî ye Kurd li seraserê Kurdistanê ȓêxist. Wî di sała 1912 bełavokeke hevîyane ye Kurdî li bajare Wirmê çap kir. Paş wî ku dastełate Ȓûs, Ĥebdulȓezaq ji Wirmê dûr xist, Smaîlaxaî Simko erke darkirine wê hevîyane yê girte ser milê xwe. Ew hevîyane di sała 1914 ji aliye dastełate Îranê hate qirtin.

Ĥebdulȓezaq Bedirxan di 24/12/1913 li bajare Xoî "Komełe ya Ȓoşnbîrî ya Kurd" pêk anî û xwêndingeheke Kurdî damezrand ku 29 xwêndkar zimane Kurdî têda hîn dibûn. Dastełate Îranê dijayetî ye berdawambûne wê

xwêndingehê kir, êriş kire ser bajare Xoî û xwêndingeh wêran kir. Bi wê řewişê ne hêştin gelê Kurd bi zimane xwe bixwêne.
Be hewł û têkoşane Kurdan, herêmên Wan û Erziřom di bihare 1913 bûn bi mełbenda zaniyarî û řunakbîrî ye Kurdî. Ĥebdulřezaq Bedirxan bi Teha Şemzînî řa "Bizutnew ya Řamyarî û Řoşnbîrî ya Kurd" li herêmê da řêkxis û bangeşe ye serbexoî ye Kurdistanê kir.

Paşan di nav serkirdayên Kurd da, ji ser serokatî yê Kurdistanê kêşe ye dastełatê dast pêkir. Bizutnewe ya Ĥebdulřezaq Bedirxan pişt bi Řûs best û "Hesen Beg"e pesmame Ĥebdulřezaq Bedirxan jî alîgire Îngilîsê kir û "Ĥebdulqadir Şemzînî" alîgire dastełate Ĥusmanî yê kir. Nakokîyên nêv serkirdayên Kurd bû binase lêkdabiřane netewe ya Kurd. Wisa awate yêketî ye Kurdan û Kurdistaneke serbexwe hate zîndabiçał kirin.

Di wê damê da bi serkirdayetîye "Mela Selîm Bitłîsî" bajare Bitłîsê bû bi mełbenda Bizutnewe ya Kurdî. Wê bizutnewe yê bû bi pałdare serhełdaneke giştî li Kurdistanê da ku serkirdayên wek Ĥebdulřezaq

Bedirxan, Ûsif Kamîl, Teha Şemzînî û Simko Şikak têda beşdar bûn.

Ĥusmaniyan pir hovîyane pelamare wê serhełdanê dan. Egerçî Kurd daxwaze alîkarî û piştgîrî yê ji R̂ûsîye kirin, bełê paş hewiłdaneke zêda, bizutnewe ya Kurd ji hemî alîyan r̂a bê dost ma û di nav Kurdan jî da yêketyeke xûrt pêk nehat. Di akam da, di sała 1914 ta 1917 Ĥebdulr̂ezaq Bedirxan, Simko û Teha Şemzînî li R̂ûsîye nizîk bûn û peîmanek bi hevr̂e bestin. Di wê peîmanê da bir̂yar dra ku hemî bi alîkarî ye R̂ûsîye serhełdan û mafe r̂ewa ye gelê Kurd darxast biken.

Di sała 1917 li R̂ûsiye, Şor̂eşa Oktobir r̂û da û Ĥebdulr̂ezaq Bedirxan ji R̂ûsiye r̂a wezevrîye bakurê Kurdistanê û ji aliye dastełate Ĥusmaniyan hate dastbiser kirin, ji bo Bendîxane ya Musiłê hate r̂ewane kirin û bê dadgaî, hate dar kirin. Paş wê r̂ûdawê Simko û Teha Şemzînî li R̂ûsiye r̂a wezevrîne r̂ojhełate Kurdistanê.

Ĥebdulȓezaq Bedirxan şarezayeke tam ji ser ȓamyare ȓojhełate naweȓast hebû. Wî çend zimanên ȓojhełatî û Ewrupî dizanî. Pişte wê ku bû bi skirtêre bałwêzxane ya Ĥusmanî li Ȓûusîye, zimane Ȓûsî jî hîn bû. Ĥebdulȓezaq Bedirxan yêk ji wan serkirdayên jîr bû ku bi zanistî bîr ji çarenuse netewe ya Kurd kir bû. Tenanet ew yêkem serkirda ya Kurd bû ku bername û pilane serbexoî ye Kurdistanê bi şêwazeke ȓêkupêk dana. Bo mînak bam karbedastên Ȓûs gotibû: "hergîz nekarim wê pesend kem ku netewe ya Kurd di kot û zincîre Ĥusmanî ya Tirk û Qacaȓî ya Fars da bê. Awat û aȓmance me ewe ku gel û welate xwe ji kot û zincîre zordar û dagîrkeran ȓizgar keîn. Bo bidî anêne wê aȓmance pîroz, gelê Kurd pêwîstî bi xwêndawarî yê heye, klîle wê jî brîtiye ji ȓexsandine darfete fêrbûn û xwêndawarî bo gelê Kurd. Bo geîştin bi wê aȓmancê alîkarî ye me biken. Eger bi min û hevałan jî Kurdistan ȓizgar ne bû, ȓojek nevşên pêşeȓoje Kurd di karî jî xo xûdî darkevê û azadîye xwe bidest bixe."

## 2-20. Qiȓkirine Ermeniyan di sała1915e zaînî

"Sułtan Ĥebdul Ĥemîd" yêk ji serkirdayên Ĥusmanî bû ku pir tawanên mezin dijî netewe yên Kurd û Ermenî kir. Ew bi sazkirine "Ała ya Ĥemîdiyan" ji axa û serok xêłên Kurd kelk girt û bi leşkirê xwe, wek çete dijî Ermeniyan bi kar anî. Sułtan Ĥebdul Ĥemîd bi nave wê ku Tirk û Kurd bira û musiłmanin, Ermenî xaçperisit û kafirin, hêze Kurdan dijî Ermeniyan bi şeȓ da. Wisa dastełate Ĥusmanî bi alîkarî ye Kurdên nizan û xapîw, komełkujyeke samnak û dałtezên dijî Ermeniyan pêk anîn ku di dîroke mirovatiyê da bêmînak bû.

Di wê cînusaîdê da yêk û nîv miliyon xełke bêtawane Ermenî kujran û bi sedan hezar kes jî penaber û sergerdan bûn. Samane Ermeniyan ji aliye Tirkan ȓa hate tałan kirin û ax û małên wan jî bi ser Tirkan da hate dabeş kirin.

Paş wê karesatê Sułtan Ĥebdul Ĥemîd bi drev got ku leşkire Ȓûsiye êriş kirye û hemî Kurdan komełkuj dika. Bi wê ȓewişê Kurd ji tirsîyan û bi serme ye zemistanê bajar

û gundên xwe çol kirin û penabirne çyayên Kurdistanê. Hawdam leşkire Tirk ji paş ȓa êriş kirin, bi dahan hezar Kurd kuştin, mał û samane wan jî tałan kirin. Di çyayan da bi hezaran Kurd ji serman qerisyan.


Sułtan Ĥebdul Ĥemîd bi pêkanîne wê cînusaîda ȓiq û kîne ye xwe li dijî gelên Ermenî û Kurd darbiȓî û mezîntrîn tawanê dijî mirovatî yê bicê anî.

Sułtan Ĥebdul Ĥemîd di bîrewerî yên xwe da wisa dibêjê: "Ermenî geleke tirsenok û fêłbazin, hemî cîhan jî alîkare wane. Bełê gelê Kurd bêhêz, nizan, sawêlke û xoşbaweȓin. Kurd geleke dîrokî û xodan çandake girîng û welateke dawłemendin. Êm gerek Kurdan di nav gelê Tirk da biłav biken û hemî saman û çanda wan jî, bixeîne ser nav gelê Tirk."

Ew xwastên Sułtan Ĥebdul Ĥemîd, bûn bi bername ye ȓamyardar û fermandahên supa ya Tirk û di sedayên 20 û 21 bi kirdawe wek yasa ye Tirkiye li dijî netewe ya Kurd bikar anîn.

Mixabîn ew perwerda ye faşîstî ye Tirkiye ji bo mêjîşuştî ye gelên Tirk hate bi kar anîn û darbaze nevşên paştir jî bûye.




Kujrawên Ermenî û hełwasîne pizişkan ji aliye Tirkan

## 2-21. Şoȓeşa Simko ya Şikak di sała 1918 ta 1930e zaînî

Xêłe Şikak li herême Soma û Biradosta ȓojava ya bajare Sełmas û Wirmê da dijiyan. Hejmare wê xêłe di sała 1920an da nizîk 6000 małbat bû. Şikak mezitrîn û bi hêztirîn xêłe wê herêmê bûn ku di sała 1841 ta 1893 li herême Soma yê dastełatdar bûn. Her ji ber wê, dagîrker ji wan di tirsiyan û wan bi girîng digirtîn. Serokên xêłe Şikak brîtî bûn ji Îsmaĥîl Axa, Ĥelî Axa ya lawe Îsmaĥîl Axa, Ĥeme Paşa ya lawe Ĥelî Axa û Simko ya lawe Ĥeme Paşa. Małbatên Şikak her ji Kevin ȓa dijî dagîrkeran şeȓ dikirin û zordarî ye wan pesend ne dikirin. Egerçî ew xêł bo xwe jî, ji ser gelê Kurd hinek zordar bûn.

Nasnave Şikak ji Îsmaĥîl Axa ya bapîre mezine Simko ȓa dê. Bo yêkemîn car di wê damê da, xêłe Şikak nawbange xwe darkir ku di sała 1759e Îsmaĥîl Aax bi çekdarên xwe ȓa, bi dasture Şa ya Qacar êriş kire ser mîre Ȓewandiz (Soran) û dastełate wê mîre Kurdî têkşîkand, mîr û małbate wî kuşt û qeła ye wî jî tałan kir.

Îsmaĥîl Axa bi zordarî bac û serane ji xełkê hejar distand û xizmetêke pir bi "Ferecuła Xane Qacar" dikir. Navbirî paşan di pilaneke xapandinî da, bi daste Qacariyan hate kuştin.

Xêłe Şikak di herême çyayên nav dastełatên Îran û Tirkiye dijiyan , dast biserdagirtine wan, ne asan bû. Her care yêk jî wan dagîrkeran, xêłe Şikak bi xapandinê li dijî aliye din bikar dianî.

Paş kujrane Îsmaĥîl Axa bi dastê Qacariyan, Ĥelî Axa wate bapîre Simko bû bi serok xêłe Şikak. Di we damê da şoȓeşa Şex Ĥubeîduła Nehrî li Kurdistanê dast pêkiri bû. Nehrî ji Ĥelî Axa û xêłe Şikak alîkarî û piştgîrî xwast, bełê xêłe Şikak piştgîrî ye dastełatên dagîrker kir û dijî şoȓeşa Nehrî şeȓ kir.

Paşan Ĥelî Axa bi dastełate Îran ȓa çend car bi kêşe hat û xwast tołe ye bavê xwe ji Şa yên Qacar bistênê. Ĥelî Axa li dijî Qacariyan şeȓ dast pêkir. Pişte berdawambûne şeȓeke drêjxayen li herême Wirmê û Sełmasê, Ĥelî Axa

têkşikîye û ji naçarî penabere Tirkiye bû. Dastełate Tirk ji, Ĥelî Axa girt û řadaste Şa yê Îranê "Muzefereddîn Şa"ê kir û dastełate Îranê jî, dast bicê Ĥelî Axa li dar da.

Pişta kujrane Ĥelî Axa, Ĥeme Paşa wate bavê Simko bû bi seroke xêłe Şikak. Heme Paşa bi Cewher Axa ya lawê xwe û çekdarên xwe li dijî Qacariyan şeř kir. Paşan Şa ya Qacar Quřanek bi diyarî bo Ĥeme Paşa nard û bo bidast anîne peîmane aştî yê, wî banghêşte bajare Tewrêzê kir. Şa ya Qacar pişte Quřanê wajo kir û sûnd xwar ku xeyanetê bi Kurdan ne ka. Wisa Ĥeme Paşa bi Cewher Axa û şeş çekdarên Kurd di sała 1905e zaînî çune Tewrêz û ji wê hemî bi daste "Nîzamusułtene" ya ser leşkire Qacariyan hatne kuştin.

Paş wê řudawê Simko ku lawe Ĥeme Paşa û bra biçuke Cewher Axa bû, serokatîya xêłe Şikakê girte ser milê xwe û bû bi kełeswar û şořesware nav xêłe Şikak. Simko bo 25 sałan wate li sała 1905 ta 1930 li herêmên Wirmê, Sełmas û Xoî dastełatdar bû.

Simko alîkarî ye şoȓşên dinê bakurê Kurdistanê kir û li hembere Şa yên Qacar û Pehlewî serberzane berxodan kir.
Di sała 1922 Ȓeza Şa ya Îranê bo ser xêłe Şikak êriş kir. Simko bo heşt sałan li dijî wê êrişê, şoȓeşgeȓane beringarî kir, ta di sała 1930 bi bełênîye Ȓeza Şa û bi nave "aştî û ȓêketinê" hate xapandin û çu bajare Şino û di ȓê da kete bose ye leşkire Îranê û hate kuştin. Paş gyanbextkirine Simko, Îrane dagîrker dast kir bi komełkujî ye Kurdan û li piranî ya herêman da, ji bo serkut kirine gelê Kurd leşkirgeh û jandirme bi cê kir.



Simko Şikak

Simko brayeke biçuk bi nave Xurşîd hebû ku bi teqîne narincokek ku ji aliye dastełate Îranê ȓa bo kuştine Simko hatibû nardin, gyan ji dast da. Simko law û kiçeke bi navên Xusrew û Sefîye hebû ku paşan li Îstanbûł û Hewlêrê jiyane.



Simko û çend pêşmerge yên hevałe wî

## 2-22. Peîmane Sêvirs di sała 1919e zaînî

Paş dumahî ye şeȓê cîhanê yêkem di sała 1919e zaînî zilhêzên endame Neteweyên Yêkgirtî nwênerên dastełate Ĥusmanî, ȓêkxrawên Kurdî û Ermenî bo wajo kirine peîmaneke aştî banghêşte konfiȓanse Sêvrisê kird ku di herême "Sêvris"e bajare Parîsê da hate girtin.

Ermeniyan "Baqos Nobar Paşa" û Komełe ya CemĥÎiyete Kurd "Şerîf Paşa" bo wê konfiȓanê ȓê kir. Şerîf Paşa wek nwênere gelê Kurd daxwazîyên netewe ya Kurd xiste berdam konfiȓanê.

Konfiȓanse yêkem di 22/3/1919 û konfiȓanse dûhem di 1/3/1920ê da hate girtin. Di wê damê da Şerîf Paşa bi Baqus Nobar Paşa ȓa kom bû û ji ser daxwazî yên gelên Kurd û Ermenî pêkhatin û dostayetî çêkirin. Ew bihev ȓa daxwazî yên xwe di peîmane Sêvrisê da di 10/8/1920 bas kirin. Di wê peîmanê da daxwazi ye gelên Kurd û Ermenî bi hev ȓa ji aliye dastełate Neteweyên Yêkgirtî hate pesen kirin. Bo gelê Kurd di xałokên 62,63,64 da biȓyar hate daîn ku di çarçêwe ya welate Ĥusmanî da

herêmeke otonome Kurdistanê bête saz kirin û paş sałek dangdan bo hełbjartine giştî bête pêk anîn, û ji ser xwaste gelê Kurd dastełateke serbixo ya Kurdistanî bête damezrandin. Cugȓafî ya ȓamyariyê Kurdistanê hemî bakur, ȓojava û başure Kurdistanê bi Musł û Kerkuk jî di xwe da digirt. Bełê ew peîman tenê ji ser ȓupelan ma û hate piştgûh xistîn.



Şerîf Paşa

## 2-23. Kongire ya Erziȓom di sała 1919e zaînî

Pişte ku dastłate Ĥusmanî li şeȓe yêkemê cîhanê da hate têkşikan, ji aliye Neteweyên Yêkgirtî û di sała 1919an peîmaneke aştî li bajare Parîsê da hate wajo kirin û bo gelên jêrdaste yên împiȓatoȓe Ĥusmanî biȓyare serbxobûnê hate daîn. Di wê biȓyarê da dastełate Ĥusmanî bo xapandine gelê Kurd dast bi çalakiye cor bi cor kir.

Mistefa Kemał Paşa wek seroke dastełate Ĥusmanî geştek bo Kurdistanê kir û li bajare Erziȓomê da bi axa, pîr û serkirdayên Kurd ȓa kongreyêk girt ku têda bi Kurdan got:

"Ey gelê Kurd em braye hevîn û hev olîn. Kafir dixazîn emê bixene jêr çepoke xwe û milkeçe Ermeniyan biken. Wê damê hem ol, hem jî welat û namus xwe ji dast didaîn. Ez soze şeref û namusê didam ku emê bi hevȓe li dijî kafirên Ermenî yêk bigrîn û şeȓ biken û wan ji welate xwe dûr bixeîn, paşan em wek bra pêkbên û mafe gelê Kurd jî bidaîn".

Bi wan gotinan Mistefa Kemał, Kurdan xapand û kire alîgire dastełate Ĥusmanî. Wisa Kurd piştgîrî ye xwe ji dastełate Ĥusmanî kir û bi darbaz bûne dam otonomî ya Kurdistanê têkdre û peîmane Sêvris jî ji aliye Neteweyên Yêkgirtî hate pişt gûhxistin.


## 2-24. Şoȓeşa Şêx Meȟmud Berzincî di sała 1919e zaînî

Di şeȓê yêkeme chanê (sała 1918e zaînî) da dastełate Brîtaniya axe Iȓaq û başurê Kurdistanê wek jêrdaste (kołonî) xiste jêr dastełate xwe. Di wê damê da "Şêx Meȟmud Berzincî" bû bi parêzgare parêzgehe Slêmanî û li dijî dastełate Brîtaniya dast bi şoȓeşê kir. Brîtaniya nwênere xwe bo axeftinê şanda bam Berzincî. Bełê Berzincî zanî ku ew pilaneke xapandinê ye û daxwazî ya Brîtaniya ne pejrand. Berzincî pir netirsane dastełate Kurdistanê ȓagehand. Bername ya Berzincî ji bo damezrandine dastełateke serbixo li her çar parçe ya Kurdistanê bû. Ji ber wê piranî ya Kurdên başurê Kurdistanê û tenanet hinek ji Kurdên ȓojhełat jî piştgîrî ye wî kirin. Selam Barzanî ku di sałên 1916 ta 930 li herême Badînan da serkirdake Kurd bû, piştgîrî ye xwe ji şoȓeşa Berzincî ȓagehand. Simko Şikak jî bi şandine hinek ji çekdarên xwe piştgîrî ye şoȓeşa Berzincî kir.
Paşan supa ya Brîtaniya û Iȓaqê bi hevȓe êrişe ser Kurdan kirîn û paş çend şeȓeke dijwar, Berzincî di şeȓe Darbenda Bazyan bi dîl kete dastê supa ya Brîtaniya.

Dastełate Brîtaniya bo têkdane şoȓeşa Kurdan, Berzincî bo Hindustanê dûrxist.

Berzincî di 14/8/1922 ji Hindustanê ȓa wezevrî Slêmanî û dûbare dast bi şoȓeşê kir û ji aliye gel wek paşa (melîk)e Kurdistanê hate nasin. Her di vê sałê da Berzincî serbexoî ya Kurdistanê ȓagehand û ała ya Kurdistanê hełda. Paşan supayên dastełatên Brîtaniya û Iȓaqê bi hevȓe êriş kirin û di 4/3/1923 bajare Slêmanî yê bombaran kirin.
Paş şeȓeke dijwar bi gyanbexit kirine hezaran kes ji şoȓeşgeȓên Kurd, Berzincî bi dîl kete dast dastełate Brîtaniya. Wisa şoȓeşa Berzincî hate têkşikandin û dastełate Brîtaniya bo careke din başurê Kurdistanê dagîr kir.

Berzincî di bendîxane ya Bexda yê berxodan kir û xwe bi paşa ya Kurdistanê nasand. Paşan Berzincî di bendîxane yê da hate nexoş û azad kirin. Berzenci bi wê nexoşî yê di sała 1956 da li nexoşxane ya Bexda yê çû ser diłovanî ya xwe.



Şêx Meĥmud Berzincî

## 2-25. Peîman (Mîsaq)e neteweyî di sała 1920e zaînî

Paş wê ku Mistefa Kemał Paşa li Erzeȓom û Sêwasê bi serkirdayên Kurdên bakure Kurdistanê ȓa kongire girt û soze alîkarî û piştgîrî ye wan bi dastxist, di kombûne 18/1/1920e Îstanbûłê da, dastełate Ĥusmanî biȓyare şeȓe dijî gelê Kurd ȓagehand. Ew biȓyar di nav Tirkiye bi nave "Peîmane Neteweyî" hate nasandin û naveroke wê jî wisaye:

"Dibê bakure Kurdistanê li jêr dastełate Tirkiye da bê û başure Kurdistanê bi parêzgahên Mûsł û Kerku jî bixrên (bixin)e ser welate Tirkiye. Dastełate Tirk jî ta bicê anîne wê biȓyarê herdam di hewł û têkoşan da bê".

## 2-26. Şoȓeşa Duktor Nurî Darsîmî di sała 1920e zaînî

Duktor Nurî Darsîmî lawe Mela Îbȓahîm di sała 1894e zaînî li gundê Darê ser bi bajare Darsîmê ji daîk bû. Di sała 1908 bi alîkarî ye çend hevalan, rêxistineke bi nav "Komełe ya Błîndaî ya Kurd" pêk anî. Duktor Nurî wek serok di nav wê ȓêxistinê da berpirsîyaretî girte milê xwe.

Pişte ku dastełate Ĥusmanî xałokên peîmane Sêvrisê bi cê ne ani, Duktor Nurî Darsîmî bi Ĥelî Şêr, di sała 1920 çu bajare Koçgirî û dast kir bi xebate ȓamyarî û ji dastełate Ĥusmanî xwat ku xalokên peîmane Sêvris bi cê bênî. Dastełate Ĥusmanî daxwazîyên Duktor Nurî pesend ne kir û di encam da Duktor Nurî li dijî dastełate Ĥusmanî li bajare Koçgirî dast bi şoȓeş kir. Diktor Nurî di şeȓekê da kete dast supa ya Ĥusmanî û hate zîndanî kirin.
Dastełate Ĥusmanî bi nawbijî ye "Seîd Ȓeza Darsîmî" Duktor Nurî azad kir. Paşan Duktor Nurî tevlî şoȓeşa Seîd Ȓeza bû. Paş têkçune şoȓeşa Seîd Ȓeza, Duktor Nurî ji naçariyan ȓû kire ȓojava ye Kurdistanê û Suriye û li wêdarê drêje bi Kurdayetî yê da. Duktor Nurî di

22/9/1972 li bajare Ĥełebê ȓojavaye Kurdistanê çû ser diłovanî ya xwe û li goȓistane nizîk bajare Ĥefrînê hate bin ax kirin.



Duktor Nurî Darsîmî

## 2-27. Peîmane Lozan di sała 1923e zaînî

Pişte ku dastełate Ĥusmanî di şeȓe dijî Yunanê serket di 10/11/1922 beşdare konfiȓanse Neteweyên Yêkgirtî bû. Ew konfiȓans li bajare Lozane welate Swisê hate bestin ku nwênere dastełate Ĥusmanî "Ĥîsmet Paşa" û nwênere dastełate Brîtaniya "Lord Kîrzon" têda beşdar bûn. Ew konfiȓanse nizîk neh heîvan kişand ku têda dastełate Ĥusmanî ȓamyareke pir qiȓêj û xeddar dijî Kurdan bi ȓêve bir û pilanên dujminayetî û pêşêlkarî ye mafên gelê Kurd bi kar anî. Di encam da konfiȓans peîmane Lozanê di 24/7/1923 wajo kir ku têda xalokên peîmane Sêvris hatne ji bîr kirin û mafe gelê Kurd jî hate jêrpê xistin. Di mor kirine wê peîmanê da ne nwênere gelê Kurd beşdar bû û ne base mafe gelê Kurd jî hate kirin.

Aşkraye biȓyarên peîmane Lozanê ji ser binase zordarî yê hatine pêk anîn û dijî nasname û mafên gelê Kurdistanên. Di wê konfiȓansê da bware beşdar kirin bi nwênere gelê Kurd ne hatîye daîn. Jî ber wê gelê

Kurdistanê pêwiste wê peîmanê ne pejrênin û jî wajokerên wî jî, lêkolîn û hisabê bixwazîn.

Di peîmane Lozanê da Kurdistan kra çar parçe. Wate beşe ku li jêr dastełate Împratoȓe Ĥusmanî da bû, bi ser dagîrkerên Tirk, Iȓaq û Suriye da hate dabeş kirin.

Wê serdamê dastełatên Brîtaniya û Feȓanse li ȓojhełate navîn da dasełatdar bûn û ji gore berjewendî ya abûrî û ȓamyarî ya xwe, Kurdistanê dabeşe çend welatan kirin û wisa xwaste gelê Kurd jî pêşêl kirin û wî bê dastełat hêştin.

Tê zanîn ku pêş bestine peîmane Lozanê, dastełate Ĥusmanî hemî dûrgehe Qibrîsê dagîr kiri bû. Hawdam başur, bakur û ȓojava ya Kurdistanê ji aliye Brîtaniya û Feȓanse hatibû dagîr kirin.

Di peîmane Lozanê da dastełatên Brîtaniya, Feȓanse, Yunan, Îtaliya û Tirkiye ji ser wan xalokan pêk hatin:

"- Dastełate Tirkiye dibê dûrgehe Qîbrisê wezevrêne dastełate Brîtaniya. Dastełatên Feȓanse û Brîtaniya dibê Kurdistanê bi ser Iȓaq,Tirkiye û Suriye da dabeş ken û serxobûne wan welatên jî bi fermî nas biken.
- Dastełatên Tirkiye, Iȓaq û Suriye dibê îzîn bidan ku berhemên newit û kiştukałe Kurdistanê bi nirxeke kêm bi Brîtaniya û Feȓanse yê bêne froştin. Welatên Brîtaniya û Feȓanse dibê li hember newite Kurdistanê, çek û keresteyên şeȓ bi welatên Tirkiye, Iȓaq û Suriye bifroşin".

Hêjayê gotinê ye ji ber berjewendî ya abûrî û wajo kirine wê peîmane namirovane ye ku welatên ȓojava piştgîrî ye hebûne welateke serbexwe ya Kurdistanê na kin.

## 2-28. Şor̂eşa şêx Seĥîdê Pîran di sała 1925e zaînî

Xalîd Bege Cîbrî di sała 1924e zaînî rêxistineke bi nave "Komełe ya Azadî" drustkir û dostayetî bi yêk ji serokên olîye bakurê Kurdistanê Şêx Seĥîdê Pîran pêka anî. Dastełate Tirkiye êriş kire ser Komełe ya Azadî û serencam Xalîd Beg di şer̂ê Erzêr̂omê da hate bi dîl girtin û zîndanî kirin. Paşan Şêx Seĥîdê Pîran ji ser xwaste Xalîd Beg dijî dastełate Tirkiye serhełdanek r̂êxist.

Hêjayê gotinê ye ku pişte bestine peîmane Lozanê, Tirkiye her care bi bihaneyêk (sedamek)ê gelê Kurdî dixapand û li gor berjewendî ya xwe bikar dianî û mafên wê pêşêl dikir. Bo hember darketine wê r̂ewişê Pîran û hevalên wî li dijî Tirkiye dagîrker şor̂eş r̂êxistîn.


Bo dar̂iştine bername ye wê şor̂eşê, Şêx Seĥîdê Pîran çend komunan di 4/1/1925 li gundên Qîrîkan, Kanye Sipye û Melikanê pêk anî. Şêx Seĥîdê Pîran di drêje ye hewiłdanên xwe bo bi dast anîne piştgîrî ye gel û şyar kirine gelê bakurê Kurdistanê bi hêzeke sed hezar swar

dast daye hełmeteke (xebateke) r̂amyarî r̂oşenbîrî û serdane wan herêmane kir:
Çebexçur di 12/1/1925, Dara Hênê di 15/1/1925, Lîcê di 21/1/1925 Hênê di 25/1/1925 û Pîran di 5/2/1925.

Di wan bangeşeyan da Pîran karî piştgirî û alîkarî ye gelê wan herêman bidast bixe. Pişte wan zincîre kombûnan, Mistefa Kemał paşa bi wê bizutnewe yê zanî û pilane li nawbirine wê dar̂işt û supayêk li jêr r̂êveberîye ye "Ĥusnî" şanda ser gundê Pîran. Wê supayê kete bose ya Kurdan û çend çekdarên Tirk hatne kuştin û birîndar kirin. Wisa şer̂ çe bû û supa ya Tirkiye di wê herêmê da hate têk şikandin.

Şor̂eşa Şêx SeĥÎdê Pîran herêmên Hênê, Genc û Dara Hênê azad kir û bajare Genc bû bi paîtexte damî ye herême jêr dastełate Kurdan. Paşan dastełate Kurdî hate damezrandin û "Feqê Wisên" bû bi seroke wê dastełatê û Şêx SeĥÎdê Pîran bû bi seroke supa ye Kurd. şor̂eşa neteweî ya Şêx SeĥÎdê Pîran bo ar̂mance serbexoî ye Kurdistanê di sała 1925 dast pêkir û bo çend heîvan di herême Ameda bakurê Kurdistanê da dastełatdar bû.

Serencam di şer̂ek da Şêx Seĥîdê Pîran û 25 kes ji serkirdayetî ya wê şor̂eşê ketne dast dastełate Tirkiye û di r̂êkefte 29/6/1925 li nav bajare Amedê û li ber çav gel hatne hełwasîn. Wisa Şor̂eşa wê carê Kurdan jî hate têkşkandin. Pîran di dame pêş dar kirinê da r̂û bi jiner̂ałên Tirk got:
"Ir̂o hûn, ez û hevałêm mîn dar diken, bełê baş bizanin ku gelê Kurdistanê ji bo standine mafên r̂ewa û serbexoî ya welate xwe dîsan serhełbida û hisabe me ji we bistênê".



Şêx Seĥîdê Pîran



Dame hełwasînê



Hełwasînên 25 kes ji serkirda yên şoȓeş û havałên Pîran

## 2-29. Şoȓeşa Qedemxêr di sała 1925e zaînî

Qedmixêr kiçê mîre "Qendî Qelawendî" bû ku yêk ji mîrên Luȓistanê bû. "Ȓeza Pehlewî" ku Şahe Îranê bû di sała 1925an da mîrê Luȓistanê "Şa Mirad Xan" ku biraye Qedemxêr bû kuşt. Paştan Qedemxêr çeke Kurdayetî girte dastê xwe û li herême Luȓistane ȓojhełatê Kurdistanê da dijî Ȓeza Pehlewî serhełda û daxwaze serbexwe bûne Kurdistanê ȓagehand.

Di encam da supa ye Îranê êriş kire ser Luȓistanê û komełkujî ye gelê Kurd kir, bi dahan gundan tałan kir û şewtand. Bełê serketin bi dast nexist û nikarîn çyayên Luȓistanê bigrin.
Ȓeza Pehlewî ku zanî nikarî bi zebre hêz û supa dûmahî bi şoȓeşa Qedemxêr bênê, kete pilane xapandinê Kurdan û Quȓanek wajo kir bi diyarî bo Qedemxêr şand. Têda biȓyare lêbûrinê bê merc bo hemî çekdarên wê şoȓeşê hatibû daîn. Piȓanî ya çekdarên Kurd baweȓ bi biȓyare Ȓeza Pehlewî anîn û çekê xwe dane dast supa ye Îranê. Tenê Qedemxêr û hevda kes biȓyare bi wê ne anîn, lê

mixabîn ew jî ku zanîn hîç darbazbûne wan nîye, ji naçarî yê xwe ȓadest kirin.

Pişte ku çekdarên Kurd çekên xwe danan, Supa ya Îranê hovîyane êriş kire ser wan û di şewe yêkem da dû hezar ji wan kuşt û Qedemxêr û hevda kadroyên peşenge wê şoȓeşê bi dil girt û şanda Tehranê. Piştî ȓojek her hevda kadroyên serkirdayetî li Tehranê hełwasîn. Qedemxêr jî bi poȓe xwe bestine kilkê qantireke asê (toȓ). Di encame lutik û cîft hawîştine hêstrê, bedane Qedemxêr şeket û xwênawî bû. Paşan Qedemxêr xistne zindanê. Qedemxêr pir aza û xoȓagir bû û daxwazî ye lêbûrînê ji Ȓeza Pehlewî ne kir û di akam da ji ber hêş û azare birînan nexoş ket û paş heft ȓojan ew şêre kiçe li zîndanê da bi serberzî tevlî karvane nemiran bû.

Qedemxêr şoȓeswareke pir dilêr, çavnetris û Kurdistan perwer bû. Hêvî dikir ku Kurdistanê ji dagîrkerên ȓegezperist û bêwîjdan ȓizgar û serbest bika. Bo bidi anîne wê aȓmance pîroz jî, ji gyanbazî û mirinê netirsî ye û şoȓeşgeȓane di dûmahî ye sała 1928 xwe fida kir.



Qedam Xêr

## 2-30. Şoȓeşa Îĥsan Nurî Paşa di sała 1926a zaînî

Pişte têkçune şoȓeşa Şêx Seĥîda Pîran, Kurdên şoȓeşgeȓe bakurê Kurdistanê di sała 1926 çune ȓojava ya Kurdistanê û "Komełe ya Xoîbûn" damezrandin. Wê komełe yê di jêr serkirdayetî ya Îhsan Nurî da sê serhełdan li herême bajare Agrî da dijî dastełate dagîrkere Tirkiye ȓêberî kir. Komełe ya Xoîbûn bi fermane Îĥsan Nurî Paşa dastełateke xełkî (sivîl) li jêr berpirsîyarî ye Braîm Paşa damezrand. Wê dastełatê di 27/10/1927 serbxobûne Kurdistanê ȓagehand û ała ya Kurdistanê jî li ser çyaye Agrî hełda.

Şoȓeşa Îĥsan Nurî Paşa li sê serhełdanan pêkdê ku di salên 1926, 1927 û 1930 biȓêve çun.

Di 5/10/1926 ȓêxistine "Bîroye Heskê Têlê" di wê serhełdanê beşdarî kir û "Şêx Ĥebdulqadir Celal" jî alîkarî ye wê kir. Şeȓ fireh bû û herêmên Îxdir, Tendaruk, Erdîş, Çałdêran, Wan, Botan, Bitłîs û Amed têvlî wê serhełdanê bûn.

Supa ya Tirkiye bi aweyeke hoviyane dijî wê serhełdanê êriş kir û Kurdistanê kir bi gole xwêne zarok, genc û kałên Kurd. Supa ya Tirkiye gundên herême Ĥekkarî, Beîtuşebab û Şemzînan ku sûke xebate şoȓeşgeȓên Kurd bûn, bi dijwarî şewtand.

Hêze Tirkiye bi fermane "Kemaleddîn Samî Paşa" li bajare Wanê dast kir bi komełkujî û qiȓkirine gelê Kurd û ta geîşte Çałdêranê bi dahan hezar kes kuşt. Li herême Paȓadajê hêze serbaze Îran jî, Kemalîstane êriş kire ser gelê Kurdê bakurê Kurdistanê û şoȓeşgeȓên Îĥsan Nurî Paşa. Ew dû dastełate pir car di dîrokê da dijî gelê Kurd dore dû tîxe yêk miqestê gêȓane.
Di sała 1939 leşkire Tirkiye êriş kire ser Kurdên herêmên Agrî û Bazîdê, gundan têkda û pazda hezar kesên bêtawan jî kuşt. Wê supa yê jinên dûgyan jî daye ber lêdanan û korpe (sava)yên daîkên ji berçu jî, li berçave daîk û bavên wan hur hur kir. Kiçên temen dah dwazdah sałan jî li pêş çavên małbatên wan etik û dastdrêjî pêkirin. Sîrete lawên Kurd jî, ji bin ȓa biȓîn ta bi xwênȓêjî û bi hêş û azarê bimirin.

Dastełate Tirkiye di vê êrişe da 660 gundan wêran, 15206 mał jî tałan û herêm jî şewtand. Paşan małbatên şoȓeşgeȓên Kurd naçar kir ku ji bajar û gundên xwe bereve bajare Ezmîre Tirkiye ȓêkevîn. Di rê da bi sedan kes li penaberên Kurd li birsan û serman mirîn.

Dame ku koçber geîne Ezmîrê, çekdarên Tirk êrişeke hovîyane kirne ser wan û zêȓ û samane wan bi dare zorê jî wan standin û pir sukayetî bi wan kirin.

Dastełate Tirkiye komełkujyeke bêmînak li dijî şoȓeşgeȓên Îĥsan Nurî Paşa li bajare Agrî û dorubere wê pêk anî.

Hêjayê gotinê ye ku dû fermanda ya Kurda wê şoȓeşê bi navên "Heskê Têlê û Bavê Tojo" di çyaye Agrî wek hemî hawsengerên xwe ta dawî ye henase û fişek (gulle)ê li dijî dagîrkere Tirkiye, şoȓeşgeȓane berxwedan. Çend car supa ya Tirkiye bi ȓêye małbatên wan, daxwaze ȓadest bûnê ji wan kir, bełê ew dû fermanda, şoȓeşgeȓane ta gyanbext kirinê berxodan. Paş şikiste wê şoȓeşê, Îĥsan

Nurî Paşa li naçarî penabere bajare Tehranê bû û ta dawî ye jiyan e xwe bêdangî ji Kurdayetî yê kir.

Supa ya Tirkiye dayan hezar kes ji komełkujî ye çya ya Agrî di çałek da zîndabiçał kir û ji ser çałê nivîsîn "Kurdistan û gelê Kurd le wir hatine bin ax kirin".

Şoȓeşgeȓên Partî ya Karkerên Kurdistanê di sała 1984 nivîse ser goȓên Kurdên çya ya Agirî bî bombê teqandîn û li heman şwênê nivîsîn "şoȓeşa Kurd û azadîxwazên Kurdistanê li wîr dast pêkir".



Ała ya Şoȓeşa Agrî



Îĥsan Nurî Paşa û hawjîne wî, Xecîc Yaşar. Îĥsan Nurî Paşa di sała1893 li bajare Bitłîsê ji daîk bû û di 25/3/1976 li Tehranê çû ser dilovanî ya xwe.


## 2-31. Şoȓeşa Seîd Ȓeza Darsîmî di sała 1937e zaînî

Di sała 1920 ta 1937 Kurdên herêmêm Darsîm nîv serbexwe bûn û neketbûne jêrdaste supa ye Tirkiye. Kurdên herême Darsîmê wê damê serbazî jî bo dastełate Tirkiye nedakirin û bac jî ne didan. Hawdam ji dastełate Tirkiye daxwaze otonomiya bakurê Kurdistanê dikirin. Di akame ȓamyare milhuȓane û dagîrkerane ye dastełate Tirkiye, Kurdên herême Darsîmê bi ȓêberiye Ȓeza Darsîmî di sała 1937 bo Kurdistaneke serbexwe li dijî dagîrkere Tirkiye serhełdan. Dagîrkere Tirkiye di dastpêk da xîrete şeȓkirin li hemberê Kurdên herême çyayên Darsîmê ne bû. Tirkiye wek dastełatêke nû pêwîstî bi serusaman pêdane supa ye xwe hebû. Pişte çend sałan ku bi hêz bû û bi pilaneke faşîstane hers kire ser Kurdên Darsîmê. Di sała 1937 herêmên Darsîm, Erzîncan û Koçgirî di jêr dastełate şoȓeşa Seîd Ȓeza Darsîmî da bûn. Di wê damê da dastełate dagîrkere Tirkiye pilaneke ȓeş bo fermanda ye hêze serbaziye şoȓeşa Kurd "Ĥelî Şêr" daȓişt ku têda navbrî bi daste xeyanetkareke bi nave "Ȓehber" ku pismame Seîd Ȓeza

Darsîmî bû hate kuştin. R̂ehber sere br̂awe Ĥelî Şêr bo Mistefa Kemałe Tirk bir. Mistefe Kemał jî li hembere wê da pir draw û zêr̂ xełate R̂ehber kir. Piştê ku dastełate Tirk herême Darsîmê dagîr kirin, ew bo xwe serê R̂ehber bir̂în û samane wî jî tałan kirin.

Ĥelî Şêr qahremaneke bêmînak bû û hawjîne wi jî zerîfe mil bi mile Ĥelî şêr di hemî şer̂ên azad kirine Kurdistanê da, çalakane beşdarî kir. Paşan dastełate Tirkiye ji ser nave pesend kirine otonomiye gelê Kurd, Seîd R̂eza Darsîmî banghêşte Erzencanê kir û bi wê pilanê li Erzencanê bose bo wî danan û wî bi dîl girtin. Dastełate Tirkiye bi wê r̂ewişê R̂eza Darsîmî û małbate wî li bajare Erzencanê dast biser kirin û şandine Xarpît (ElĥzÎz)ê. Li Xarpîtê di dastpêk da lawe Seîd R̂eza Darsîmî li pêş çave bavê xwe hałwasîn û paşan li heman darê Seîd R̂eza Darsîmî û hemî endamên małbate wî jî tenanet nevîyên wî jî ku bi temen zarok bûn, hełwasîn. Hawkat li herême Darsîm û Erzencanê dastełate Tirkiye na mirovane dast bi r̂eşkujî û komkujî ye gelê Kurd kir ku bi yêk ji mezintrîn cînûsaîdên dijî gelê Kurd hatîye nasîn. Bi corek ku zêdatir ji sed hezar kes ji Kurdên wê herêmê bi

daste supa ye Tirikye hatine kuştin. Dastełate Tirkiye zarokên Kurdên kuştî jî koçbere bajarên Tirkiye kir û di nav dabistanên taîbetî da, darse dijî netewe ye Kurd pêdan. Paşan ji wan zarokane faşîstirîn jinȓałên Tirk perwerda kirin ku li şeȓê dijî gelê Kurd û bo têkşikandine şoȓeşên dinê Kurdistanê bi kar anîn. Wan zarokan ne dizanîn ku bi xwe Kurdin, çimkî her ji zarokiye xwe ȓa, zimane Tirkî hîne wan kiri bûn, û zimane Kurdî û netewe ye Kurd jî, li mêjiye wan darxisti bûn. Dastełate Tirkiye ji hemî xwêndingehên ku xwêndarên Kurd têda bûn, sîxuȓ dana bû ta xwêndkar bi zimane Kurdî ne axvin. Wisa ziman û hestên Kurdayetî yên wan zarokan hate ji bir kirin. Hêjayê gotinê ye gelê harême Darsîmê ji ole Ĥelewîn, ji ber vê ye ku ew komełkujî bi nave komełkujî ye Ĥelewiyan jî hatîye nasîn.



Ȓeza Darsîmî




Ĥelî Şêr

## 2-32. Şoȓeşa Pêşewa Qazî Miĥemmed di sała 1945e zaînî


Bi dast pêkirine şeȓê dûhemê cîhanê di sała 1942 Emrîka û Brîtaniya başurê Îranê dagîr kirin. Supa ye Ȓûs jî di dame dastełate Stalîn da bakurê Îranê û ȓojhełate Kurdistanê dagîr kir.
Supa ye Ȓûsiye ji bo çar sałan li ȓojhełate Kurdistanê da ma. Di wê damê da yêkemîn ȓêxistine Kurd bi nave "Komełe ya Jiyan eweî Kurd" (Komełe ya J.K) di 4/9/1943 li bajare Mihabadê ji aliye çend şoȓeşgêȓên Kurd hate damezrandin. Bername ye Komełe ya J.K ȓizgariye bo netewe ye Kurd ji dastê dagîrkeran bû. Paş drust bûne Komełe ya J.K, Qazî Miĥemmed ji bo nav Komełe ya J.K hate banghêşt kirin û ji ber ȓêzdar bûnê, bi serkirda ye Komełe ya J.Kê hate hełbijartin. Paşan di 16/7/1945 nave Komełe ya J.Kê gohoȓîn bo Ĥîzbe Dêmukȓate Kurdistanê. Ĥîzbe Dêmukȓate Kurdistanê ji bo xebate serxobûne Kurdistanê hate damezrandin. Wê damê beşek ji axe ȓojhełate Kurdistanê di jêr dastełate Ȓûs da bû û darfeteke baş bo damezrandine dastełate Kurdistanê li wê beşê Kurdistanê çê bibû.

Pêşewa bi piştgîriye glê herême Mukiryanê di 22/1/1946 komare Kurdistanê li meîdane Çar Çiraye bajare Mihabadê ȓagehand. Di 11/2/1946 paȓlimantarên komare Kurdistanê sûnd xwarin û dast bi kar kirin. Di 23/4/1946 peîmane dostayetî û alîkariye gelên Azerî û Kurd hate wajo kirin.

Di nav komarê Kurdistanê da jinan jî cêye xwe hebû û di xebatê da beşdarî kirin û di komarê da rołgeȓiyan. Dastełate Ȓûs bo yazda heîvan ji komare Kurdistanê piştgîrî kir. Paşan dastełate Ȓûs bi dastełate Îranê ȓa pêkhatin û supa ye xwe ji Îran û ȓojhełate Kurdistanê wekşand. Wê damê komare Kurdistanê tenê li herême Mihabadê da dastełatdar bû. Pêşewa bo pêşgirtin ji komełkujî ye gelê Kurd, dijî dagîrkere Îranê şeȓ ne kir û di 17/12/1946 Mihabad bo careke din, ji aliye supa ye Îranê ve hate dagîr kirin. Wisa komar hełweşya û Pêşewa bi bra û pismame xwe Sedir Qazî (perlementare Kurd li perlimane Îranê) û Seîf Qazî (wezîre cenge komare Kurdistanê) di 22/1/1947 li meîdane Çar Çiraye Mihabadê bi daste dagîrkere Îranê hatne hełwasîn.

Di heman damê da 20 kes ji hawȓêyên wefadare Pêşewa û ȓêberên komare Kurdistanê li bajarên Mihabad, Seqiz û

Bokanê ji aliye supa ye dagîrkere Îranê r̂a hatne hełwasîn.
Mela Mistefa Barzanî ku serleşkire supa ye komare Kurdistanê bû, bełê li dijî dastełate Îran şer̂ ne kir û bi hêze barzaniyên xwe r̂a çûne R̂ûsiye. Wisa kes dijî supa ye Îranê beregarî ne kir.



Pêşewa Qazî Miĥemmed


Pêşewa


Sedir Qazî


Seîf Qazî


Ała ya Komare Kurdistanê

## 2-33. Şoȓeşa Mela Mistefa Barzanî di sała 1961e zaînî

Ji sała 1943 ta 1945 bi serokatiye Mela Mistefa Barzanî, cemawere herême Badînane başurê Kurdistanê li dijî dagîrkere Iȓaq şeȓ kirin. Ew şeȓ bi şikiste Barzanî hate dawî bûn û ji naçarî ȓû kirne bajare Mihabadê ku komare Kurdistanê têda dastełatdar bû. Paş ȓuxane komare Kurdistanê di sała 1946 ta 1961 Mela Mistefa Barzanî li Ȓûsiye penaber bû.

Di sała 1961 Mistefa Barzanî bi alîkarî û pilane dastełate Ȓûsiye wezevriye Iȓaqê û di 11/9/1961 bi piştgîriye gelê başurê Kurdistanê li dijî dastełate "Ĥebdul Kerîm Qasim" ȓapeȓî û piraniye herême başurê Kurdistanê azad kir. Di wê damê da Ĥebdul Kerîm Qasim ji naçarî yasayêkê pêşkeş kir ku têda bas ji çê kirine dastełateke hawpare Kurd û Ĥeȓeb di kir. Bełê pişte aram bûne barudoxê, Ĥebdul Kerîm Qasim bo xwe dijî Kurdan şeȓ ȓagehand. Kurdên başurê ji sała 1961 ta 1971 li dijî Iȓaqê şeȓeke dijwar kirin. Çend caran nwênerên Kurd û dastełate Iȓaqê çawpêkevtin kirin û agirbest jî ȓagehandin. Di 11/3/1970 nwênerên Kurd û dastełate Iȓaqê ji ser otonomî ya

başurê Kurdistanê r̂êkevtin û ta sała1974 çend nwênerên Kurdistane otonom jî di par̂lemane Ir̂aq da nwêneriye gelê başurê Kurdistanê di kirin.

Hêjayê gotinê ye ku alîyên r̂êkevtine otonomî ji ser herême Kerkuk nakok bûn. Dastełate otonome Kurdistanê daxwaze weger̂ine Kerkukê ji bo ser Kurdistanê di kir, bełê dastełate Ir̂aq wê daxwazê pesend ne dikir. Serencam di sała 1975 dastełate Îran û Ir̂aqê peîmane Elcezaîrê wajo kirin û otonome başurê Kurdistanê hate bitał kirin.

Di sała 1968 ta 1975 Miĥemmed R̂eza Şa ye Îranê alîkariye şor̂eşa Barzanî kir. Pişte wajo kirine peîmane Elcezaîrê, Şa ye Îranê, Mistefa Barzanî bang kire Tahranê û aşbetał (betałkirine şor̂eşê) bi ser da sepand. Şor̂eşa wê serdêmê egerçî xûdiye zêdatir ji sed hezar pêşmergeyan bû, bełê bi bîstine dûmahî anîne şor̂eşê ji zimane Mistefa Barzanî şikiye. Tenanet pir ji pêşmergeyan xwe kuştin. Wan pêşmergeyên ku ji naçarî wezevrîne nav dastełate Ir̂aqê, pir sûkayetî ji aliye karbedastên Ir̂aqê r̂a hate pêkirin.

Be sedame  kêşe ye dastełat û tekr̂ewiye Mistefa Barzanî di sała 1966 dasteyêk bi serokatiye Celal Tałebanî û Braîm Eĥmed ji Parte Dêmukr̂ate Kurdistanê hatne hełbir̂an û çune nav dastełate Ir̂aqê û bûne çekdare dastełatê. Paşan Celal Tałebanî û layengrên wî ku bi "Celalî" dahatine nasîn, mil bi mile dastełate Ir̂aq dijî şor̂eşa Kurdan şer̂ dikirin.

Paşte ku Mistefa Barzanî aşbetałe şor̂eşê r̂agehand, pêwîstiye dastełate Ir̂aqê bi Celalîyan ne ma û Celalî ji tirse dastełate Ir̂aqê r̂eviyan û di sała 1976 Yekyetî Nîştmanî Kurdisan (YNK)ê damezrandin.

Mistefa Barzanî egerçî doreke çalak di r̂êberîye wê şor̂eşa da hebû, bełê hêze barzanî ji ser cutyar û hejarên Kurdistanê pir bi zebruzeng bû û nwênerîye zordaran dikir.

Mela Mistefa Barzani bi serbir̂în û r̂adast kirine şor̂eşger̂ên r̂ojhełate Kurdistanê wek Suleîman Muĥînî, Sałih Lacanî û dahan kesên din bi Şa ye Îranê û kuştine

Duktor Şivan (Seĥîd Qirmizî Tupraz) û Seĥîd Ełçî ji şor̂eşger̂ên bakurê Kurdistanê, xizmete bere ye dagîrkerên Kurdistanê dikir.
Duktor Şivan û Seĥîd Ełçî ji r̂amyardarên zanaye bakurê Kurdistanê bûn ku bo alîkariye şor̂eşa başurê Kurdistanê hati bûn, bełê di sała 1974 bi bir̂yare Mistefa Barzanî hatine kuştin.
Di vê brakujiyê da, Barzaniyan bi zorê Seĥîd Elçî naçar kirin ku di xev da Duktor Şivane hevale xwe bi kujî û paşan Barzaniyan bo xwe Seĥîd Ełçî kuşt.

Pişte r̂agehandine aşbetałê, Mistefa Barzanî bi małbat û layengrên xwe r̂a ku bi "Melayî" di hatine nasîn, li bajare Kerece Îranê da hatne xanenişîn kirin. Paşan Mistefa Barzanî ji Tahranê r̂a bo Emrîka hate r̂ê kirin û di 1/3/1979 bi nexoşiye şêrpence (kenserê) mir.



Mela Mistefa Barzanî

Hêjayê zanînê ye di sała 1978 bi fermane MesĤud Barzanî û alîkarîye supa ye Tirkiye 700 kes ji pêşmergeyên YNKê ku ji tirse dastełate Iȓaqê koçbere çyaye Ĥekkarî ya bakurê Kurdistanê bi bûn, di şeȓeke xeyanetkarane da hatne komełkuj kirin. Ĥelî Ĥeskerî yêk ji serkirdayên Partîye Dêmukȓatî Kurdistanê û paşan Yekyetî Nîştmanî Kurdistanê bû, pişte ku bi dîl hate girtin, bi daste heze Barzanî hate kuştin.



Ĥelî Ĥeskerî (1936- 1978)

## 2-34. Peîmane Elcezaîr di sała 1975e zaînî

Peîmane Elcezaîr di sała 1975 li welate Elcezaîre bi fermî di nav dastełatên Îran û Iȓaqê da hate bestin, bełê di kombûne bestine wê peîmanê da, nwênerên welatên Tirkiye, Suriye, Emrîka, Brîtaniya û Elcezaîrê beşdar bûn. Di wê peîmanê da, peîmane 11/3/1970 ku ji ser otonome başurê Kurdisan bû, hate pişt gûhxistin. Nwênerên dastełatên beşdar ji ser qełaçokirine (wêran kirine) Kurdistan û serkutkirdne hêze şoȓeşgeȓên hemî parçeyên Kurdistanê ȓêkevtin ku bi hemî alîyan alîkariye hevdû biken. Dagîrkeran bo geîştin bi aȓmance xwe, di wê peîmanê da ȓêkevtin ku bi dahan kîlometran sinurên dastkirdên Kurdistanê darbaz biken û li hembere şoȓeşgeȓên Kurd alîkariye serbazî û sîxuȓiye hevdû biken. Di yêk ji xalokên wê peîmanê da ȓêkevtin ku bo ȓadast kirine şoȓeşgeȓên Kurd bi yêktir alîkarîye hevdû biken.

## 2-35. Şor̂eşa Eĥmed Tofîq (Ĥebduła Îshaqî) di sała 1950e zaînî

Di sała 1950 komek gencên şor̂eşger̂e r̂ojhełate Kurdistanê bo drêjedane r̂êye Pêşewa Qazî û anînedî ya hêvîên komare Kurdistanê li dijî dastełate dagîrkere Îranê dast bi xebateke civakî kirin. Li bajarê Mihabadê; Eĥmed Tofîq, Xenî Bluryan, Suleîman Muĥînî, Emîr Qazî û Smaîl Şerîfzada, li bajare Seqiz; R̂eşîd Ĥusênî, li bajare Pîranşar; Ĥebduła Zekî, li bajare Serdaşt; Xidir Ĥebbasî û Mela Aware (Eĥmed Şiłmaşî) r̂êberiye wê şor̂eşê û Ĥîzbe Dêmukr̂ate Kurdistanê (ĤDK) girtne dast.

Paşan li gor laiqbûnê, Eĥmed Tofîq bi skirtêre ĤDKê hate hełbijartin. Ji ber na yasayî bûne karên r̂êxistinî li wê beşê Kurdistanê, xebat bi awayeke nihênî berdawam bû ta sała 1954 ku Eĥmed Tofîq bi hinek ji havalên xwe li jêr tewijme êrişe milhur̂aneye dazgehe serbazî û polîsiye Îranê, sengere xebatê wegwastine başurê Kurdistanê û naçar bi hełbjartine taktîke şer̂ê r̂êxistinîzanî (partîzanî) bûn.



Eĥmed Tofîq

ĤDK bi r̂êveberiye Eĥmed Tofîq xebate r̂amyarî û çekdariye xwe li r̂ojhełate Kurdistanê drêje pêda ta di sała 1957 Duktor Ĥebdur̂ehman Qasimlu bo têkiłî bi xwêndkarên Kurdên niştecê ye Tahranê şand.

Duktor Ĥebdur̂ehman Qasimlu li Tahrane û Smaîl Qasimlu ji aliye Sawak (dastgahe sîxur̂iye Îran)ê hatne girtin. Duktor Ĥebdur̂ehman Qasimlu li zîndanê soze alîkarî û sîxur̂iyê bi Sawakê da û di 24 damjimêran da hate azad kirin. Paşan Sawak Duktor Ĥebdur̂ehman Qasimlu şanda başurê Kurdistanê. Qasimlu bam

Eĥmed Tofîq û berpirsyarên ĤDK bas kir ku "min Sawak xapand û bi direw soze alîkariyê pêdan û ji ber wê hatime azad kirin."

Sawak li zîndanê Smaîl Qasimlu ku pesmame Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu bû, ji xwe bedastewedane Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu agadar kir. Smaîl Qasimlu jî li pênav azadkirine xwe lîste 250 kes ji kadrên nihêniyên ĤDK bi Sawakê da. Sawak di êrişek da 250 Kurd girt û zîndanî kir. Xenî Bluȓîyan û Ĥezîz Yusifî dû kes ji wan kadran bûn ku ketne bendîxane û bo 25 sałan li bendîxaneye dastełate dagîrkere Îran da şoȓeşgeȓane berxodan kirin.

Her ji ber wê ĤDK baweȓî bi Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu ne kir û paş lêpirsînê, biȓyare dadgeh kirine wî da.
Wê damê dastełate Ĥîzbe Şûĥî (komonîst) yên Iȓaqê zêda bû û dostayetiye wan bi Ĥîzbe Tuda (komonîst) yên Îranê ȓa xûrt bû, çimkî her dû ser bi Ȓûsiye bûn. Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu ku bi nihênî endame Ĥîzbe Tuda bû û alîkariye K.C.P (ȓêxistine sîxuȓiye

R̂ûsiye) di kir, bi alîkariye Ĥîzbe Şûĥî yên Iřaqê, xwe ji dadgeh kirinê darbaz kir û ji Slêmanî yê bo Bexda yê řewiya. Li Bexda yê wek karmendake fermî di wezarete bûdce û darayî ya Iřaqê da hate damezrandin.
Hêjayê gotinê ye ku li Iřaqe wê damê da wek karmend damezrane Kurdake řojhełatê Kurdistanê (hawułatî ye fermî ye Îranê) tişteke na yasayî û bam hemî kes bałkeş û hêjayê gumanê bû.

Di sała 1964 da kongreye dûheme ĤDKê li gunda Sunê ser bi bajare Qeładzê hate girtin ku têda Eĥmed Tofîq bi skirtêre giştî hate hełbijartin. Her di wê kongrê da Duktor Ĥebduřehman Qasimlu bi tawane alîkariye Sawak û xeyanet bi şořeşa Kurdistanê ji ĤDKê hate dar kirin. Xenî bluryan û Ĥzîz Yusifî ku li bendîxane yên Sawak da berxodan dikirin, bi endame komîteye navendiye ĤDK hatne hełbijartin.
Pêş bestine kongreye dûhme ĤDKê, Selah Muĥtedî ku endame ĤDKê bû, řewiye û řexistinek binave "Ĥîzbe R̂izgariye Kurdistanê" damezrand ku piraniye darebegên herême Mukiryanê pê řa bûn. Bełê paşan hate aşkira bûn ku Selah Muĥtedî sîxuře Sawakê ye û

bo nakokî û sîxur̂iyê wî şandine nav ĤDKê. Pişte wê aşkira bûnê, Selah Muĥtedî wezevriye hemêze Sawakê û bû bi serok caşe herême Mukiryanê.

Eĥmed Tofîq xizmeteke zêda bi şor̂eşa başurê Kurdistanê û kesayetiye Mela Mistefa Barzanî kir. Çendîn sałan şanbişane hawr̂êyên xwe diji dagîrkere Ir̂aqê şer̂ kir. Xebate Eĥmed Tofîq bo yêkgirtiye şor̂eşa her çar parçeyên Kurdistanê bû.

Pîşte têkiłiye Mela Mistefa Barzanî bi dastełate Îranê di sała 1968, çend kes ji ber̂êwberên ĤDKê wek Sedîq Hencîrî û Mela R̂ehîm Mercelanî bi bir̂yare Mela Mistefa Barzanî hatne girtin û wenda kirin.
Paşan li bihare sała 1968 Sulêman Muĥînî û Xelîl Şewbaş ji aliye Barzanî r̂a hatne girtin û di paîze heman sałê da terme kujrawên wan r̂adaste dastełate Îranê hate kirin. Di heman damê da Sałih Lacanî bi dah hevalên din, ji aliye Barzanî r̂a hatne girtin û bi sinure Temerçyan da r̂adaste Îranê hatne kirin. Sawak dast bicê Sałih Lacanî û dû ji hevalên wî li gundê Cełdîyane ser bi bajare Pîranşarê ji pêş çave gel zînda bi gor̂ kir.

Heft kesên dinji li zîndanê da hatne bêser û şwên kirin. Tenê kesek bi nave Şêxeî Girdênê hate azad kirin ku pênase Iȓaqiye wî hebû.

Paş wan ȓudawan Eĥmed Tofîq di dawiye sała 1969 ji tirse Mela Mistefa Barzanî, naçar ji başurê Kurdistanê ber bi Bexdayê ȓakir û daxwaze mafe penaberiye ȓamyarî ji dastełate Iȓaqê kir.

Di heman damê da Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu bi wê hałoziye Kurdistanê zanî û bi alîkarîye Kerîm Ĥîsamî, Mela Ĥesen Ȓistigar û Mela Ĥebduła Ĥesenzada dijî Eĥmed Tofîq pilan kir.  Di sała 1971 li bajare Koye û li małe Mela Ĥesen Ȓistigar civîne kadrên ĤDK bi beşdariye 32 kesan pêkhat. Di wê civînê da Kerîm Ĥîsamî pîşnyare girtin û kuştine Eĥmed Tofîq kir, bełê piraniye kadran dijî wê hełwêst girtin. Her di wê civînê da Kerîm Ĥîsamî ȓagehand ku îdî ĤDK nikarî aîkarî ya małî û emnyetî ye wan kadrane bi parêzê. Ji ber wê Eĥmed Nistanî ku yêk ji beşdarbwane wê civînê bû, biryar da ku bi 15 pêşmergeyan biçê bam Eĥmed Tofîq li Bexda yê.

Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu ku harêkariye îstixbarate Iȓaqê dikir, daste wî wekiri bû bo pilangêȓan dijî Eĥmed Tofîq û li Bexda yê bi alîkariye Mela Ĥebduła Ĥesenzada têkiłiye xwe bi Eĥmed Nistanî ȓa pêk anî û paşan Eĥmed Tofîq ji aliye dastełate Iȓaqê ȓa hate zîndanî kirin.

Di sała 1971 Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu bi hinek Kurdên ȓojhełatê Kurdistanê ku ser bi dastełate Beĥis bûn û azadane li Iȓaqê digeriyan û hinek ji wan karmenda fermiye dastgeh îstixbarate dastełate Beĥis bûn, civînek bi nave kadrên ĤDK di hûtêl Şîȓatone Bexda yê girt û ew çend kadir jî bo wê civînê hatibune banghêşt kirin:

- Ĥebduła Zekî (Qendîl) - çawedêre mezine ȓamyariye Ĥîzbe Dêmukȓate Kurdistanê.
- Hełbestwan Mamosta Salar (Ĥelî Qutbî) - kadre ȓamyarî.
- Kak Xidrî Berdaȓeşan
- Ĥewłaî Mam Seĥîdî
- Mela Miĥemmedi Xane Xełî Serdaşt

Ew pênc kese di civînê da dijî Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu ȓawestiyan û gotin:
"Te ji ber xeyanet bi ĤDKê li kongreye dûhem hatîye dar kir, mafê ȓêveberî û beşdar kirine te di civînên ĤDKê da tineye".
Beşdarên din çimkî ser bi dastełate Iȓaqê bûn, tiştek ne gotin. Paşan ew pênc kes ji civînê dar ketin û wezevrîne bajare Koye û bûyer bo endamên ĤDKê bas kirin.
Li bihare 1972 wan kadiran û endamên ĤDKên ku li başurê Kurdistanê bûn li gundê Wirte ye binare Qendîlê li małe Ĥebduła Zekî da konfiȓans girtin û têda Komîteye Ȓêvberiye Ĥîzbe Dêmukȓate Kurdistanê damezrandin.

Di sała 1972 EĤmed Nistanî ji Bexda yê wezevriye başurê Kurdistanê û ji aliye Komîteye Ȓêvberiye ĤDK tê banghêşt kirin û lêpirsin ji wê tê kirin. Di wê lêprisînê da EĤmed Nistanî got ku Mela Ĥebduła Hesenzada ji Bexda yê pê ȓa gotiye: "eger li bi girtdane EĤmed Tofîq

da alîkar bî, pile û paye (miqam) didayne te û emniyete te jî di parêzin". Min jî bełênî (soze alîkariyê) pêdan.

Eĥmed Nistanî gotibû: "Mela Ĥebduła Hesenzada bi fermane Duktor Ĥebduřehman Qasimlu min řaspard ku nameyêk ji Bexda yê bo başurê Kurdistanê bênim. Min jî pirsî ku ew name çiye û ji bo kêye. Hate gotin ku ew name bi navê Eĥmed Tofîq hatîye nivîsandin û bo Mela Mistefa Barzanîye. Paşan em karek dikeîn ku li îstgehe pişkinîne (seîtereye) Kerkukê ji aliye karbidastên dastgehe emniye Beĥse Iřaqê řa bêye girtin û name jî bête aşkira kirin. Te jî paş girtinê bêje ew řaste û Eĥmed Tofîq ser bi Barzanî û Emerîka ye û bi zor min şandiye wê çalakiyê".
Ji min řa gotin: "Kak Eĥmed Nistanî hîç nigerane xwe mebe, emê paşan te azad bikeîn û wisa Eĥmed Tofîq têda dibeîn û xwe dast bi ser ĤDKê da dagrîn û dibîne xodan řêxistin".

Pilan çewa Duktor Ĥebduřehman Qasimlu dařişti bû, bi heman řewişê ser ket û Eĥmed Tofîq ji aliye dastełate Iřaqê řa hate girtin û wî xistne bendîxaneye Ebûxrêbê.

Hêjayê bałkêşê ye Tahîre û Xefure ku hevalên Eĥmed Tofîq bûn bi wî ȓa li zîndane Ebûxrêb bûn, bi çav bestî bîsti bûn ku Ĥemedamîn Sîȓacî bi fermane Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu şikenceye Eĥmed Tofîqî kiri bû.
Eĥmed Tofîq ji Ĥemedamîn Sîȓacî pirsî bû:
"Gelo te çima min şikence dikeî heî xaîne ȓûvî, di her cilekî da bî, ez te naz dikem, heî na mirove xwefroş, min çi xrapeyêk darheqe te kiriye".

Ĥemedamîn Sîȓacî bersîv da bû:
"Ewe dasture Duktor Ĥebduȓehman Qasimluye û te dibê di nav tîzav (esîd) da bêye kułandin".

Wisa seroke şoȓeşa wê damê ye ȓojhełate Kurdistanê û sikirtêre ĤDKê Eĥmed Tofîq bi daste Ĥemedamîn Sîȓacî û bi dasture Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu û Seddam Husên di nav tîzavê da hate kułandin û terme wî jî hate wenda kirin.
Eĥmed Tofîq ji sała 1950 ta 1971 ku hate bêseruşwên kirin, ȓêbere şoȓeşa ȓojhełate Kurdistanê û sikirtere ĤDKê bû. Ew miroveke şoȓeşgeȓ û diłsoze gel û

nîştman bû ku di kar û xebate ȓamyarî yê da nawberdane wî ne bû. Ew qas nîştimanperwer bû ku tenanet digot:
Kurdistan dilgista mine û ta Kurdistan azad ne bê, ez zemawend na kem.
Ta gyanbext kirine xwe her bi hivîye serxobûne Kurdistanê bû.

Beȓêz Qendîl pêş gyanbext kirine xwe wisa ji ser Eĥmed Tofîq gotibû:
"Eĥmed Tofîq serkirdayêke şoȓeşger bû ku di nav gelê Kurd da kêm mînak bû. Di kar û xebate ȓamyarî yê da bêdîmen û mandînedanas bû. Ew serkirdayêk bû ku bi hevalên xwe ȓa piranî li çya bû. Tenanet wek pêşmergeyêk herdam çek beşan bû û bi pê havałên xwe dameşiya û xûdî kar û xebate taîbet bû. Her ji ber wê bû ku xeyanetkar û nayarên Kurdistanê belaye ku bi ser Eĥmed Tofîq anîn ta niha bi ser kes ne anîne".

Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu di sała 1972 bi alîkariye dastełate Beĥse Iȓaqê civîneke nihênî li Bexdaê bi nave kongre ya sêhemine ĤDKê best û ȓêxistineke bi nave

"Ĥîzbe Dêmukr̂ate Kurdistane Îranê" (ĤDKI) damezrand. Dastełate Beĥs peîve "Îran"ê bi nave ĤDK zêda kir û Duktor Ĥebdur̂ehman Qasimlu ji kire sikirtêre wê Ĥîzibê.

Paş aşbitałe Mistefa Barzanî di sała 1975, endamên Komîteye R̂êvberiye ĤDKê ku havałên Eĥmed Tofîq bûn û li binare Qendîlê dijiyan, ji aliye dastełate Îran û Ir̂aqê r̂a hatine dorpêç kirin û ji naçarî daxwaze mafe penaberiye r̂amyarî ji dastełate Ir̂aqê kirin. 55 kes ji Komîteye R̂êvberiye ĤDKê li bajeroke Sengesere başurê Kurdistanê, bi alîkariye "Baîzî Hebasaxaî Serkepkan" ku serok xêłeke wê herêmê bû, daxwaziye mafe penaberî yê ji dastełate Ir̂aqê kirin.
Ew 55 kese bo 9 r̂ojan li bajare R̂anye hatine r̂agîrtin û paşan dastełate Ir̂aqê bir̂yar da ku mafe penaberiye wan bida. Bełê paş têper̂bûne dû r̂oj bi ser wergirtine mafe penaberiyê, Kerîm Ĥeddad û Ĥemedamîn Sîr̂acî bi cil û bergên serbaziye Ir̂aqê (mixawîrî) û çend trumbêlên mezinên serbazyî (Zîl Ĥeskerî) û serbazeke zêda hatine bajare R̂anye û wan 55 kesan xistne nav trumbêlan û berve Kerkuk, Xaneqîn û paşan di heman

r̂ojê da bi sinure Xusrewî da wan r̂adaste jandirme yên Îranê kirin. Wisa pilane hawbeşe dar̂êjrawe Duktor Ĥebdur̂ehman Qasimlu, Mela Ĥebduła Ĥesenzada, Mela Ĥesen R̂estigar, Kerîm Ĥeddad, Ĥemedamîn Sîr̂acî û Kerîm Ĥîsamî bi alîkariye Seddam Ĥusên û dastełate Beĥsê geîşte encam. Ev pilane r̂eş di dîroke gelê Kurdistanê da bi "Şanoye Xiyanetê" hate navzed kirin.

Wên ku hatne r̂adast kirin, hatne zindanî kirin ta ku dastełate Şa yê Îranê bi şor̂eşa gelên r̂ojhełate Kurdistanê û Îranê di 11/2/1979 da hate r̂uxan. Pişte ku hevalên Eĥmed Towfîq hatne azad kirin r̂oleke girîng di serketine şor̂eşa azadiye r̂ojhełate Kurdistanê da girtne ser milê xwe. Pişte azad bûne r̂ojhełate Kurdistanê û r̂uxane Şa ye Îranê, dastełate Beĥse Ir̂aqê darudasteye Duktor Ĥebdur̂ehman Qasimlu bi draw û çekan şanda r̂ojhełate Kurdistanê û wisa bi nave ĤDKI, dast bi ser wê herêmê dagirt.

Beşêk ji şor̂eşger̂ên Komîteye R̂êvberiye ĤDK paş ji zîndan azad bûnê, bo ku şer̂e nav xwe çê nebê,

"Komełe ya Yeksaniye Kurdistanê" di sała 1979 da damezrandin û bi wê nave dijî dagîrkere Îranê xebat kir ta ku piraniye serkirdayên wan ji pênav sexobûne Kurdistanê gyan bexit kirin.

Komełe ya Yeksaniye Kurdistanê bo Kurdistaneke serbexwe xebat dikir û grêdrawe dagîrkeran ne bû. Her ji ber wê bû ku ta dawiye henase (bine) serberzane jiyan û serberzane jî, ji pênave axe pîroze Kurdistanê, gyan fîda kirin. Wek Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu ne bûn ku bo geîştin bi dastełateke çewte axayetî dast bo her karek berin.

Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu ȓojêk paş kîmyabarane bajare Helebce yê di axeftineke telefîzone Iȓaqê da got: "Helebce ji aliye dastełate Îranê ve hatîye kîmyabaran kirin. Kurdên Iȓaqê otonomiye xwe hene, eger Kurdên Îranê ew mafan heban ku bi zimane xwe bixwênin û binvîsin, idî em tişteke dîn ne daxwast." Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu di wê axeftinê da qet peîvek jî ji ser wendahî yên Helebce yê ne got.

Paş bêseruşwên kirine Eĥmed Tofîq û řadastkirine 55 kes ji hevalên wî, hevaleke Duktor Ĥebduřehman Qasimlu bi nave "Seîd Ȓesuî Babî Gewre" ji Qasimlu pirsî bû, ku çîme te hemî serkirdayên ĤDKê řadaste Îranê kirin, bełê Eĥmed Tofîqt bo xwe kuşt. Duktor Ĥebduřehman Qasimlu gotibû: "Eĥmed Tofîq ji min jê hatîtir û zanatir bû, li her darekê ba, dikarî Ĥîzbeke bi twanatir ji min çê ka. Min ne dikarî berengare wî bim, wî têda bir ku bikarim bi asûdayî sikirtêretî bikem. Bełê wên dîn ku řadaste Îranê hatne kirin, îdî Sawak di nav zîndanan da wan biřizînê û darsek bidate wan ku nikarîn ji hember min serkevîn."

Hinek ji wan kesên ku di pilane Şanoye Xeyanete Duktor Ĥebduřehman Qasimlu da řadaste dastełate Îranê hatne kirin:

- Mamosta Ȓeşîd Ĥusênî (Şeîda ya Kurdistan) endame komîteye navendî ya ĤDKê, sikirtêre giştiye Komełe ya Yeksaniye Kurdistanê û seroke Yekêtiye Cutyarên Kurdistanê bû. Di şeře dijî bekrêgîrtiyên Îranê da di 5/6/1979 li herême Kerefto ya ser bi bajare Seqizê gyan bext kird. Goře ye wê şořeşgeřê li gořistane Seqize.

- Ĥebduła Zekî (Qendîl) ku çavedêre mezine r̂amyariye ĤDK, endame serkirdayetîye komîteye ber̂êweberayetî ye ĤDKê û paşan jî endame komîteye navendiye Komełe ya Yeksaniye Kurdistanê bû. Di şer̂ê dijî dagîrkere Îranê di 28/8/1982 li gunda Badînawê ya ser bi bajare Pîranşarê gyan bext kir. Gor̂e ye wê şor̂eşger̂ê li gor̂istane gundê Tirkeşe ser bi Pîranşarê ye.
- Hełbestwane mezine Kurd Mamosta Salar Hewramî (Ĥelî Qutbî) kadreke ĥegite ĤDK û endame komîteye navendiye Komełe ya Yeksaniye Kurdistanê bû. Di şer̂e dijî hêze Supaye R̂izgarî ku bekrêgirtiyên Ir̂aqê bûn di 29/7/1980 li gundê Bêsarane ser bi bajare Merîwanê gyan bexit kir. Gor̂e wê şor̂eşger̂e li gor̂istane gundê Bêsarane.
- Mamosta Xidir Qadir (Xidir Kurdistanî) ji bajare Serdaştê ye û kadreke çalake ĤDK bû û kadrêke serkirdayetiye Komełe ya Yeksaniye Kurdistanê ye ku herdam dijî neyarên Kurd şor̂eşger̂ane xebat kiriye û paşan ji naçarî penabere Swêdê bûye.

- Beȓêzêk bi nave Qadraxa li zîndane Sawak da li jêr şikence yên serbiȓ (cellad)ên Îranê da di sała 1975 gyane xwe ji dast da.



Ji Milê ȓast ȓa: Eĥmed Tofîq (Ĥebduła Îsĥaqî), Ȓeşîd Ĥusênî (Şeîda ya Kurdistan) û Ĥebduła Zekî (Qendîl).

## 2-36. Şoȓeşa bakur bi serokatiye Ĥebduła Ocelan (Apo) di sała 1970

Li bakurê Kurdistanê bikar anîne peîve Kurd û zimane Kurdî qedaxe bû û her kes base Kurdayetiyê kirdiba, ji aliye dastełate dagîrkere Tirkiye, di hate hełwasîn. Di wê dame dijwar û hestyar da, Apo wek laweke têkoşer û xwêndkareke zanko, hest bi xwe nasîn û Kurd nasînê kir. Apo zanî ku dastełatên dagîrkerên Kurdistanê, neteweye Kurd kirine koîle û dixazin wî tine biken. Ji bo wejiyan dine neteweye Kurd, Apo şoȓeşgeȓane û bwêrane dast bi hewł û têkoşanê kir. Apo di nav xwêndkarên zanko yên Ankara da dostayetî bi Kemał Pîr, Cemîl Baîq, Mezłum Doxan, Miĥemmed Xeîrî Dormîş û Heqî Qeraî çê kir.

Wan kesan kombûne yêkem li Ankara yê di 21/3/1974an di bin darekê pêk anîn û di wê kombûnê da biȓyare drust kirine dasteyêke şoȓeşgeȓ dan.

Kombûne dûhem li geȓeke Dîkmene Ankara yê di sała 1976an pêk anîn û têda biȓyare drêjedan bi xebat ji Ankara yê berve Kurdistanê hate daîn. Her yêk ji wan çû


bejêreke Kurdistanê û dast bi şiyar kirine gel kir. Wan kesan di heman sałê da dasteyêk bi nave Grupe Aîdolojî ê pêk anî û ji wê damê ve bi nave Apoçî xebat di kirin. Di sała 1976an hevał Aîdan Guł ku yêk ji endamên wê grupê bû bi daste çepên Tirk li bajare Dêrsîmê hate kuştin.


Di řoje 27/11/1976an yêkem kongre ya Apoçîyan li gundê Fîsê ser bi bajeroke Lîcê ye herême Amedê hate bestin ku têda Partiye Karkerên Kurdistanê (PKK) hate damezrandin.


Paşan hevał Heqî Qerar li Entab (Dîlok)ê di 18/4/1977 bi daste Partiye Pêşeng ku Kurd bûn, hate kuştin.
Kemał Pîr ku yêkemîn doste Apo bû, di sała 1979 li Xarpît (Elĥzîz)ê bi Mezlum Xeîrî Dormîş řa ji aliye dastełate Tirkiye hatine girtin û xrane zîndane Amedê.

Mezlum Doxan endame Komîteye Navendiye PKK bû, di newroze 1982an agir berda bedane xwe û bi şewtandine xwe newroz di nav zîndanê dujmin da pîroz kir û ne tenê ser bo daxwaze xwe bedastewedanê dujmin netawand,

belkî bi wê çalakiyê r̂unahî xiste dilê hevalan û bû bi qabûse şevezenge dagîrkeran.
Kemał Pîr û Miĥemmed Xeîrî Dormîş di berxodane nav zîndanê da, bi druşme anjî azadî anjî mirin di 14/7/1982an dast dan bi grêve birçî bûnê û paş dû heîvan şor̂eşger̂ane gyan bexit kirin.


Kemał Pîr


Mezlum Doxan


Xeîrî Dormîş

Apo bo berdawame xebate r̂amyariyê naçar bû di sała 1979an li bakurê Kurdistanê berve Suriye û Lubnanê biçî.

PKK bi ar̂mance serxobûne Kurdistanê hate damezrandin û ji ser wê binasê xebatê xwe drêje pêda. Di 15/8/1984an bir̂êveberiye heval Ĥegîd (Meĥsum

Qur̂qumaz) ku fermandaye giştiye er̂teşe r̂izgarî ye Kurdistanê bû, li dijî Tirkiye dagîrker dast bi şer̂ê çekdariyê kir. Ĥegîd ji Farqîn (Sîlwan)ê ser bi Amedê bû û di 28/3/1985an li çyaye Gever̂ê li şer̂e dijî Tirkiye dagîrker da gyan bexit kir.



Ĥegîd

Di sała 1993 PKK agirbeste yêkalî r̂agehand û Turgut Ozał serokomare Tirkye dasteyêk ji par̂limantarên Kurdên bakurê Kurdistanê bi Celal Tałebanî û çend

r̂ojnamewan, bi ar̂mance çareseriye pirse Kurd û bo axevtinê bi Apo r̂a şanda Şamê. Pêş wezvrîne wê daste yê dastełate Tirkiye Turgut Ozal kuşt û r̂agehand ku Ozal bi sekteye dił mirye. Wisa pilane Turgut Ozal ku boxwe jî Kurd û hawbajare Apo bû negeîşte encam.

Hêjayê gotinê ye ku pişte darbaz bûne 68 sałan bi ser na yasayî bûne zimane Kurdî, ber̂êz Turgut Ozal di sała 1991an axeftin bi zimane Kurdî li Tirkiye û bakurê Kurdistanê azad kird.

Di sała 1988an dastełate Tirkiye bi alîkariye NATO û piştgîriye Emrîke zexit xiste ser dastełate Suriye û wê naçar bi darkirine Apo li Şamê kir.

Apo di r̂oje 9/10/1998an ji Suriye berve Yunan, paşan berve R̂ûsiye û Îtalye r̂êket. Apo bi mebeste çareseriye kêşeye Kurd bi awayeke r̂amyarî û aştîxazane r̂û kire Eurupa yê, egîna dikarî bam gerîlayan li çya xebat bika. Li Îtalye Apo daxwaze bestine konfir̂anseke navneteweyî bo çareseriye kêşeye gelê Kurd kir. Belê hemî dastełatên cîhanê bi taîbet Emrîka û Ełmanye pir na mirovane dijî

daxwaze Apo westiyan û berjewendiye abûrîyên xwe û dostayetî bi dagîrkerên Kurdistanê r̂a, ji mafên gelê Kurd, grîngtîr zanîn.

Guşarên Tirkiye, Emrîka û Ełmanye, dastełate Îtalye naçar kir ku Apo dar kir û di encamê da berve nadyarên din awêt. Bałefire Apo li azman (asman)e Ewrupa dagerye û hîç welatek mafe wenîştinê neda. Di akam da berve R̂ûsiye, Tacikistan, Yunan û Kînye çu. Paşan dastgehe sîxur̂iye Musada Îsr̂aîlê û CIA yê Emrîka yê di r̂oje 15/2/1999an Apo bi balefirê r̂ifandin û pir na mirovane bi nîve bêhoşkirî dane daste dastełate faşîste Tirkiye.

Welatên r̂ojava xwastin bi wê karê şor̂eşa gelê Kurd têk biben û hawdam şer̂ li Kurdistanê berdawam bê ku berjewendiye abûrî û r̂amyariyên xwe baştir biparêzin.

Paş wê karesatê, gelê Kurd şor̂eşger̂ane hate meîdan û bi nar̂ezayetî xwe selmand ku Kurd bi darê zorê nayete tine kirin.
Di wan nar̂ezayetiyan da 150 Kurd ji her çar parçeyên Kurdistanê û hendaran xwe şewtandin û hirs û qîne xwe



wisa dijî dagîrkerên Kurdistanê û duȓuiye cîhane bi nav mirovatiyê darbiȓȋn. Di heman damê da li xopîşandanên Kurdên ȓojhełate Kurdistanê, gelê Kurd kete ber dastȓêje gullebarane xwênȓêjên dastełate dagîrkere Komare Îslamiye Îranê û di ȓojêk da 27 kes li bajare Sine ku dû kes zava û bûke heman ȓojê bûn hatne kuştin. Dû kesên din li bajare Wirmê hatine kuştin û bi dahan kes jî hatne birîndar bûn û zindanî kirin.
Di xopîşandanên Kurdên Ałmanye li ber dargehe bałwêzxaneye Îsȓaîlê, çend gencek ketne ber dastȓêje gulleye karbedastên bałwêzxaneyê û di akam da çar gencên Kurd hatne kuştin û bi dahan ji hatne birîndar kirin.
Hêjayê gotinê ye ku paş serhełdane PKK li bakurê Kurdistan û Tirkiye, hinek ȓunakbîrên Kurd, Partiye Damokratixwaze Gel (HDP) di 7/6/1990 damezrandin. Paşan HDP ji aliye dastełate Tirkiye hate qedaxe kirin û serkirdayên wî jî hatne dastbeser kirin anjî kuştin û hinek jî ji naçariyan penabere Ewrupa yê bûn. Paşan Partiye Dêmukȓate Azad (OZDP) di 19/10/1992an hate damezrandin ku di 23/11/1993 ji aliye dastełate Tirkiye ȓa hate qedaxe kirin. Paşan Partîye Dêmukȓat (DAP) di

7/5/1993 hate damezrandin ku di 16/6/1994 ji aliye dastełate Tirkiye r̂a hate qedaxe kirin. Înca Kurdan di 23/5/1996 Partiye Dêmukr̂ate Gel (HDP) damezrandin. Paş qedaxe kirine wî, DTP û paş qedaxe kirine DTP, PDP saz kirin ku di hełbijartinên sała 2007 da, karî 21 par̂limantaran bişêne par̂limane Tirkiye û 99 şaredare bakurê Kurdistanê jî qazanc bika.

Di sała 1993 dastełate Tirkiye pilane li navbirine par̂limantarên Kurd pêk anî û di akam da Miĥemmed Sîncar ku nwênere bajare Mardînê bû di 4/9/1993an li Batmanê ji aliye supa ye dagîrkere Tirkiye hate kuştin. Çend par̂limantarên wek Leîla Zana û Xetîb Dîcle ku nwênere Amedê bûn, Selîm Sadaq û Erham Doxan ku nwênere Mardînê bûn di 2/3/1994 xirane bendîxaneye Ankara û her yêk ji wan pazda sał zîndanî bi ser da sepandîn û ji kare r̂amyariyê hatne dûr xistin. Ewên din jî wek Zubêr Aydar, R̂emzî Kartał, Yaşar Kaye, Nîzametîn Tuxuç û Ĥelî Yigit ji naçariyê penabere Eurupa yê bûn û di sała 1995an Par̂limane Dareweî Kurdistanê li Biljîkê damezrandin. Paşan di 24-27/5/1999an Kongireya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK) li Holandê damezrandin.



Apo di dame bergirî kirinê li dadgehe serbazîye Tirkiye di 1999

Tawanên dastełate faşîste Tirkiye darheq bi gelê Kurd

Di sała 2010 "Parte Dêmukȓate Gel" hate qedaxe kirin û Kurdan "Parte Aştî û Dêmukȓasî" (BDP)ê damezrandin. Pir bałkeşe ku bi hemî zextên û gendałkarî yên dastełate Tirkiye, BDP karî di hełbjartine sała 2011 da 36 kursîyan li paȓlimene Tirkiye bidast bixe.

Hêjayê pêzanînê ye ku PKK berpirsyaretiye dîrokiye xwe li beşên dinê Kurdistanê jî pêk anîye û alîkarîye Kurdan kirîye ku rêxistinên xwe pêk bênin.

Parte Çareseriye Dêmukȓate Kurdistanê (PÇDK) di sała 2002an li çyaye Qendîlê bi serokatiye Duktor Faiq Gułpî hate damezrandin û niha bi serokatiye Dîar Xerîb li başurê Kurdistanê xebate ȓamyarî yê dike.

Partîye Yêkyetiye Dêmukȓat (PYD) di sała 2003 li çyaye Qendîlê hate damezrandin û niha wek bihêztirîn ȓêxistine ȓojavaye Kurdistanê li karên ȓamyariye wê beşê Kurdistanê da gel biȓêxistin dike.

Partiye Jiyan e Azada Kurdistanê (PJAK) di sała 2004 bo parastine gelê ȓojhełate Kurdistanê bi serokatiye Mihendîs Ȟebduȓehman Hacî Eȟmedî li çyaye Qendîlê hate damezrandin. PJAK di dameke kurt da karî xebateke bi nirxe neteweyî biȓêve biba û wek bihêztirîn ȓêxistine ȓojhełate Kurdistanê û Îranê piştgîriye gelê ȓojhełate Kurdistanê bidast bixe.

## 2-37. Şoȓeşa cemawere başurê Kurdistanê di sała 1991

Dastełate Iȓaqê di dawîye ȓojên havîne sała1990 welate Kweytê bê teqe dagîr kir. Paşan dastełatên cîhanê di jêr nave Neteweyên Yêkgirtî û bi ȓêveberîye Emrîka li dijî Iȓaqê biȓyare şeȓ dan. Ew şeȓ ne ji ber xoşewîstî û parêzgarîye mafe gelê Kweytê bû, belkî bo xoşewîstîye newit û girtne daste dastełate wê herêmê bû. Wisa di 17/1/1991 êrişkra ser Iȓaqê û şeȓ ta 28/2/1991an kişand. Dastełate Iȓaqê paş 41 ȓojan bi zêdatir ji sedhezar kuştîyan, sedan hezar pekkewte û birîndaran, têkşikîye û paşekşe kir û ji Kweytê darket.

Wê damê li başurê Kurdistanê dastełate Iȓaqê bêhêz bû, gelê Kurd bi darfet zanî û di 5/3/1991an li bajare Ȓanye û paşan li gişt başurê Kurdistanê dijî dagîrkere Iȓaqê serhełdan û di dameke kurt da gişt başurê Kurdistanê azad kirin. Di newroze 1991an bajare Kerkukê ji aliye gelê Kurd ȓa hate azad kirin.

Gelê başurê Kurdistanê xyal dikir ku Emrîka û Neteweyên Yekgirtî çewa ji pênav berjewendiye xwe gelê Kweytê dijî êrişe Seddam Ĥusên parastin, wisa ji wan biparêzn û piştgîriye serhełedane Kurdan biken. Bełê Neteweyên Yekgirtî serhełdane gelê Kurd li berjewendiye xwe ne zanî û tirse wî hebû ku dastełateke serbixoye Kurdistanî çê bê, ji ber wê îzin bi dastełate Iȓaqê dan ku êrişe se gelê başurê Kurdistanê bika.

Dastełate Iȓaqê di ȓagehandinên xwe da heȓeşeye kîmyabarane gelê Kurd di kir û paşan li pêş çavên Neteweyên Yekgirtî di 15/4/1991an bi balefirên şer ku fiȓîne wan ji aliye Neteweyên Yekgirtî li başurê Kurdistanê  hatibû qedaxe kirinê, bajarên başurê Kurdistanê bombaran kir û bi dahezaran Kurd di wê êrişê da hatne kuştin. Dastełate Iȓaqê di êrişan da herêmên Kerkuk û Musił dûbare dagîr kir. Kurd ji tirse kîmyabaranê ȓû kirne ȓojhełat û bakurê Kurdistanê. Di vê koçberiyê da zêdatir ji dû milîon Kurd koçbere beşên dinê Kurdistanê bûn. Dastełatên Tirkiye û Îranê tixuban bi ser koçberan da girtin û dastpêkê da îzin ne dan kes bi wan sinuran da darbaz bibê. Ji ber wê pir Kurd ji birçan û

serman mirin. Tenanet jandirmeye Îranê li sinure Temerçyane nizîk bajare Pîranşarê, êriş kire ser koçberan û bi dahan kes kuşt û birîndar kir. Jandirmeye Tirkiye jî li bajarên Siłupî û Şemzînan, koçberên Kurdan da ber dastȓêje gullan û bi dahan kes kuştin û birîndar kirin. Di vê koçberiyê da bi sedan kes bi mînan gyan ji dast dan û pekkewtî bûn.

Paşan Neteweyên Yêkgirtî hêłe qedaxeye fiȓîne 36 pileyan bo dastełate Iȓaq dyar kir ta fiȓokeyên Iraqê li azmane parêzgehên Hewlêr û Dihok û Slêmanî ne fiȓîn û hawdam wan parezgehên başurê Kurdistanê di jêr çawedêrîye Netewe yên Yêkgirtî da ma. Hêłe 36 pile herêmên Kerkuk û Musłî di xwe da ne dagirt û wisa sê yêke axe başurê Kurdistanê di jêr dastełate Iȓaqê da ma.

Dame wê ȓapeȓînê serkirdayên ȓêxistinyên başurê Kurdistanê li Îranê dijiyan û paş azad bûne başurê Kurdistanê, wezevrîne ser hazirîyê û çun ȓûyên Seddam Ĥusên maç kirin û dastkevtên wê ȓapeȓînê nizananî frotin.

Paşan par̂limanike hawbeş pêk anîn ku tenê nwênere hinek ji r̂êxistinan têda bû. Ji ser dastełate çewte r̂êxistinayetî par̂liman nikarî berdawam bê û Celal Talibanî û MesĥudBarzanî şer̂e nav xwe dast pêkirin. Zêdatir ji dah hezar Kurd bi daste yêktir bi kuşt dan. Paş 4 sałan şer̂e brakujî, Barzanî û Talibanî wê beşê Kurdistanê kirne dû parçe û her yêk ji wan par̂limane xwe drust kir. Tallibanî bi alîkarîye dastełate Îranê li Slêmanî yê û Barzanî bi alîkarîye dastełate Ir̂aqê di hewlêrê dastełate xwe drust kir.

Aşkraye nemane sê (sêber)e şume dagîrkere Iraqê li Kurdistanê hêjayê dilxoşi û şanazîye her Kurdake tînîya azadîya Kurdistanêye, bełê şer̂e nav xwe zyaneke brakujî û koçr̂ewîye hendaran bo gelê Kurd têda bû.Dîroke wan r̂existinan ku bi navên Kurd pir sałê piranîye yasa yên dastełate Ir̂aq li Kurdistanê bir̂êve di ben, r̂eştir kir. PDK bi r̂êveberiye małbate Barzanî û YNK bi r̂êveberiye małbate Tałebanî, başurê Kurdistanê kirne meîdane sîxur̂yî û çetegerîye dastełatên dagîrkerên Kurdistanê.

Her car supaye dagîrkereke Kurdistanê bi wê beşê Kurdistanê da darbaz dibê û baregehên xwe têda damezrênê. Tenê eȓteşe Kurdistanê mafe hebûnê wî li başurê Kurdistanê nîye, egîne hemî dagîrker ji pêk anîn û mołdane supa û sîxuȓên xwe li Kurdistanê serbestin. Bo mînak di 31/8/1996 (31 Ab) paş wê ku PDK zanî bi YNK ȓa nikarî yêkyetîye xwe çêke, bi enfalçîyên supaye Iȓaqê û Seddam Ĥusên ȓa êriş kire ser Hewlêrê. Di akam wê xeyanete Mesĥud Barzanî da sedan Kurd hatne kuştin û herême Hewlêr û Slêmanî jî ketne jêrdaste supaye Iȓaq û Barzanî. YNK jî ji xeyanetê dûȓî ne kir û herême Slêmanî bi alîkarîye spaye Îranê ji daste PDK dar anî û piȓ kir ji sîxuȓên Îranê.



Ałaye başurê Kurdistanê

Mixabin zêdatir ji 22 sała małbatên Barzanî û Tałebanî bi darudasteyên xwe samane gelê beşurê Kurdistanê bitałan diben, bi bê ku kes hisabek ji wan bipirsî. Bi cêye serusaman dan bi Kurdistanê, ȓikeberekîye (ȓeqabete)

draw wegwastinê bo bankên dagîrkerên Kurdistanê û cihanê diken. Başurê Kurdistanê kirine mołgeye îslamî yên řegezperistên Tirk, Fars û Ĥeřeb. Dagîrkeran bi nave olî, çandî, zanistî, serbazî û bazirganiyê dahan bingehên sîxuřî û mêjîşuştîyê bo gencên Kurd wekirin. Dagîrker bi nave xwêndine zankoyî, doreye taybetî bo zarokên berpirsîyarên Kurd wedaken ku piranîye berpirsyarên pêşeřojê sîxuře Tirk, Îran û Iřaqê bin. Dû řêxistinîye dastełatdare başurê Kurdistanê "PDK û YNK" qase dahan pişt draw řagwêstine hendaran ku torînên (nevîyên) wan jî ji dahate wê dizîyê behremend dibin.

Hêjayê zanînê ye ku ew pařliman û dastełate herême Kurdistanê ku li başurê Kurdistanê hatîye damezrandin, tenê bo çavpoşîye gel û bi yasa kirine PDK û YNK bi ser gelê başurê Kurdistanê daye. Eger gelê Kurd bo xwe dastełatêke Kurdistanî bi dar ji PDK û YNK damezrêne, ew dû řêxistine her wek di dîroke xwe da nîşan dane, bibne darudasteyên hemî dagîrkerên Kurdistanê bo têkdan û řuxandine wê dastełatê, egerçî ew dastełat jî hełbjartiye gel bê û berjewendiyên nîştîmanî jî pir baştir ji PDK û YNK biparêzê.



Mesĥud Barzanî û Celal Tałebanî

## 2-38. Şoȓeşa gelê Kurd li Kurdistane Sor di sała 1992

Paş şeȓe cîhanê yêkem beşeke biçuke axe Kurdistanê kete bindaste dastełate Ȓûsiye. Paş êrişe dastełate Ĥusmanî di sała 1915 bo ser bakurê Kurdistanê, bi dahan hezar Kurdên êzîdî (zerdaştî) koçbere Kurdistane Sor û welatên Yêketîye Sovyetê bûn. Di serdame dastełatdarîye sosyalîstî hemî neteweyên Yêkyetîye Sovyet mafe netewîye wan hate pesend kirin, bełê neteweye Kurd bi biȓyare Stalîn wek dom (qerec) hate nasandin û di nav welatên Yêkyetîye Sovyetê da wek Ermenistan, Gurcistan, Azerbaycan, Qezaqistan û Ȓûsiye hate dabeş kirin. Di sała 1990 û paş lêkhełweşane Yêkyetîye Sovyetê, piranîye neteweyên wê yekyetîyê, serxobûnê ȓagehandin. Di wê damê da Kurdên yezîdiye Kurdistanê Sor bi ȓêveberiye "Wekîl Mistefa" bo daxwazîye mafe neteweye Kurd, eȓteşe gelê Kurd damezrandin û serxobûne Kurdistanê Sor ȓagehandin ku têda bajare "Laçîn" wek paîtexte Kurdistanê Sor hate dyarî kirin. Di sała 1992 dastełatên Ermenistan û Azirbaycan li ser dagîr kirine axe

Kurdistane Sor şeȓ hełgîrsandin. Dastełate Ermenistanê daxwaz ji Wekîl Mistefa kir ku Kurd bi dastełate Ermenistanê ȓa li dijî Azerbaycanê şeȓbiken. Pişte serketinê, Ermenistan mafe otonomîye Kurdistane Sor nas bika. Dastełate Azerbaycan ji li ole îslamê kelk wergirt û bi nave alîkarî û nasîne mafê Kurdan, piştgîrîye Kurdan bidast anî. Wisa Kurdên musiłman xapand. Di akam da ji ser dagîr kirine Kurdistane Sor di nav Ermenistan û Azirbaycanê da şeȓeke xwênawî dast pêkir û sê sałan kişand. Di wê şeȓe da bi hezaran Kurd hatne kuştin û bi dahan hezar jî ji naçarî li herêmê koçber bûn û Kurdistanê Sor bicêhêştin. Paşan Ermenistan û Azerbaycan di sała 1995 ji ser dabeş kirine Kurdistanê Sor pêkhatin û piranîye Kurdan ji Kurdistane Sor darkirin û koçbere welatên Qefqaziye, Ȓûsiye û Ewrupayê kirin. Wisa şoȓeşa Sor şikist anî û Kurdistane Sor jî dû bare hate dagîr kirin.



Wekîl Mistefa

**2-39. Serhełdanên Kurdistanê di sedeyên 19 û 20e zaînî**

Serhełdanên dinê gelê Kurd hebûne ku ji ber zext û zordarîye dagîrkeran hatine têkşikandin û ni karîne di aste neteweyî da bêne nasîn. Serkirdayên wan serhełdanan ji aliye dagîrkerên Kurdistanê ȓa hatne kuştin anjî sêdare kirin. Navê wan şoȓeşgêȓ û serhełdanan wisaye:

- Bakurê Kurdistanê

Serhełdane Biłbas di sała 1818e zaînî, Mîr Bedirxan Bege Botan di sała 1852 ta 1855e zaînî, serhełdane Ĥekkarî di sała 1895, serhełdane Êzîdîyan di 21/9/1920 bi serokatîye Dawd Lidawd û Ȓeşe Qulu.

- Ȓojhełatê Kurdistanê

Serdar Ȓeşîd Cwanȓo, Cafir Sułtane Hewraman, Mela Xelîle Mîrawê ye Serdaşt, Gełbaxyên Dîwandare, Ȓapeȓîne Omer Paşa li herême Serdaşt di sała 1934 ta 1935an.

- Başurê Kurdistanê

Serhełdane Ȓeĥman Paşaye Baban di sała 1806î zaînî, Mîr Ĥemeye Ȓewandizî (Paşa Kore) di sała 1826e zaînî, serhełdane Şêx Ĥebdulselam Barzanî di sała 1911 ta 1912, Ȓaperîne Şêx Seĥîd Berzencî dijî Tirkên Ĥusmanî di sała 1913 ta 1914an, Ȓaperîne Goban li Zaxo di 4/4/1919, Îbȓahîm Xane Dało di 22/8/1920, Ȓaperîne Şêx Eĥmeda Barzan di sała 1921 ta 1932e zaînî.



Ȓeĥman Paşa ye Baban


**Beşe Sêhem**

## 3 – Xalên girîngên cugȓafî ya Kurdistanê

### 3-1. Şwêngehe Kurdistanê

Kurdistan dakevê başurê ȓojavaye qaȓeye asya û navenda ȓojhełate navîn û sinurên wê wisane:

Li bakur: Azirbaycan, Ermenistan, Daryaye Ȓeş û Tirkiye.
Li başur: Îran û Kendawê Medya.
Li ȓojhełat: Îran û Daryaye Xezer.
Li ȓojava: Iȓaq û Suriye.




Kurdistan çar r̂êyên daryay heye, bełê dagîrkeran Kurdan bi dare zorê ji herêmê daryayê koçber kirine û netewe yên Tirk, Fars û Ĥeȓeban nîştecê kirine.

**3-2. R̂ûpêve (r̂ûber, bergeh) axe Kurdistanê**

Axe Kurdistanê 550 hezar kîlometre çargoşeye û qase welate Fer̂anse dibê. Bełê tenê di 230 hezar kîlometrên çargoşeye Kurdistanê da gelê Kurd dijî.

R̂amyariy(syaset)e bi Ĥer̂b,Tirk û Fars kirine Kurdistanê û koçberiyên zordarî û niştecê kirine netewe yên Tirk, Ĥer̂eb û Fars li piraniye herêmên sitratijiyên wek Kerkuk, Musł, Xaneqîn, Xarpît, Erzin, Erzincan, Erzir̂om, Tepeye Qazî ( Gazî tepe), Ĥeleb, Wirmê, Nexeda, Myandwaw, Hemedan, Melaîr, Îlam, Kirmaşan, Xoristan (Xuzistan), Kazrun(Bûşehir), Şarî Kurd, Kohgîloyê, Dizful  bûye binase çol kirin û şêwandine nexşeye Kurdistanê. Ew r̂amyarye dagîrkeran bi kirdawe tawîn û bi r̂eçełek sir̂îne Kurdan li Kurdistanê ye.

## 3-3. Bajerên girîng û parêzgehên Kurdistanê

Welate Kurdistanê ji 38 parêzge û 220 bajaran pêk hatye.

Paîtexte Kurdistanê bajare Amed (Dyarbekir)e ku hejmare şêniyên wî di sała 2013 bi yêk û nîv milyon kesan hatîye xemłandin (ĥesbandin). Mezin tiring bajare Kurdistanê Kirmaşane ku şêniyên wî bi dû milyon kes hatîye xemłandin.

Parêzgehên Kurdistanê wisane:

Bakurê Kurdistanê (19 parêzge):

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Darsîm | Bîngol | Xarpît | Melatye | Mereş |
| Gazî Anteb | Sêrt | R̂uha | Adyaman | Amed |
| Ĥekkarî | Îxdir | Agrî | Bîngol | |
| Wan | Bitłîs | Muş | Erzir̂om | Erzincan |

R̂ojhełate Kurdistanê (10 parêzge):

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| Xoristan(Xuzistan) | Lur̂istan | Kirmaşan | Wirmê | Sine |
| Kazrun(Bûşehir) | Bextyarî | Kuhgîluye | Îlam | Şarî Kurd |

Başurê Kurdistanê (6 parêzge):

| | | |
|---|---|---|
| Kerkuk | Slêmanî | Xaneqîn |
| Dihok | Neynewa (Musł) | Hewlêr |

R̂ojavaye Kurdistanê (2 parêzge):

| | |
|---|---|
| Ĥełeb | Qamîşlu |

Kurdistane Sor̂ (1 parêzge):

| |
|---|
| Laçîn |

## 3-4. Serhejmarî ya şênîyên Kurdistanê

Kurdistan welateke dagîr kirîye û serhejmarî ya neteweye Kurd ne kareke asane, çimkî ne di berjewendîye dagîrkerên Kurdistanê daye ku dan bi hebûne neteweye Kurd binên û hejmare Kurdan kêmtir ji řastiyan dinivisênin.

Ji gor wan serjmêrên ku ta sała 2013e zaînî ji alye dagîrkerên Kurdistanê řa hatine kirin, neteweye Kurd bi 25 milyon kes serjimêr kirine (Ĥesbandine). Bêguman serjimêre gelê Kurd ji wê pir zêdatire, çimkî beşek ji Kurdan ne wêrane ji tirsê dagîrkeran xwe bi Kurd binasênin anjî dagîrkeran bi darê zorê wan bi Tirk, Fars û Ĥeřeb nivîsandine. Beşeke ji ber şerme ku ji wan řa ne bêjin Tirkê çiya û bi nizan naz neken, xwe bi Tirk nivîsîne. Hinek ji bo ku ji kar, xwêndin û jiyan e civakî qut ne bin û bêbeş neyêne kirin û bi cihêrengîye řegezî û siteme neteweyî řubiřu ne bin, xwe bi Kurd ne nivîsandine.

Di wan serjmêryan da ku ji aliye dastgehên Kurd wek Kongireya Neteweyî ya Kurdistanê ȓa hatne kirin, gelê Kurd bi 42 milyon kes hatye hesbandin. Dyare ew serjmêrye bi xemłandinê hatîye kirin, çimkî welate Kurdistan hatîye dagîr kirin û gelê Kurd tenanet mafe wê niye ku Serjmêrî ya xwe jî bika. Serjmêrî ya Kurdan ji gore Yêketiye Welatên Ewrupa yê di sała 2013an bi 32 milyon kes wisa hatîye hesbandin:

Bakurê Kurdistanê û Tirkiye 15 milyon kes,
Ȓojhełatê Kurdistanê û Îranê 9 milyon kes,
Başurê Kurdistanê û Iȓaqê 5 milyon kes,
Ȓojavayê Kurdistanê û Suriye 2 milyon kes,
Kurdistane Sor, welatên Qefqazya û Ȓûsiye 400 hezar kes,
Ałmanye 300 hezar kes,
Brîtanye û Îrlenda 100 hezar kes,
Feȓanse 60 hezar kes,
Lubnan 50 hezar kes,
Hulenda 40 hezar kes,
Awistirye 30 hezar kes,
Swêd 30 hezar kes,

Swîs 20 hezar kes,

Îtalye 15 hezar kes,

Danmark 13 hezar kes,

Yunan 12 hezar kes,

Biljîk 10 hezar kes,

Nirwêg 10 hezar kes,

Fînland 5 hezar kes,

Qibrîs 4 hezar kes,

Welatên Yêkgirtî yên Emrîka 60 hezar kes,

Ûstir̂alya 30 hezar kes,

Mîsir, Ĥer̂ebistane SiĥudÎ û Kiweyt 15 hezar kes,

Îsr̂aîl 100 hezar kes.

**3-5. Abûrî ya Kurdistanê**

Jiyane abûrî ya Kurdistanê beşek bi kiştukałê birêve diçî, çimkî keş û heva û axe Kurdistanê bo kiştukałê guncavin.

Kurdistan welateke ji ser zêȓe ȓeş (newit) westiya ye û di bin zevîya (herda) her çar parçeyên Kurdistanê, çałên mezinên newitê peîda dibin û mezintirîne wan li Baba Guȓguȓe herême Kerkukê başurê Kurdistanê ye.

Hêjayê gotinê ye ku abûrî ya Kurdistanê ta niha ji ser wê newtê neçerxaye û newit ne tenê ne bûye samanek bo gelê Kurd, belkî bûye sedame serekeye dagîr kirine wê nîştimanê ji alye Tikiye, Îran, Iȓaq, Suriye, Ermenistan û Azerbaîcanê ȓa.

Aşkraye ku newit li welatên Ĥeȓeb bûye maye ya dawłemend bûnê, bełê li Kurdistanê bûye sedame çewsandin û kuştar gelê Kurd.
Bilî ji newit li Kurdistanê kaneye (meĥdan) cor bi cor hen ku ji kevirkên wan kaneyan ta niha dagîrkerên

Kurdistanê bi hezaran ton Ĥasin, Zêȓ, Zîv, Baqir, Granît û ... Paławtine.

Hêjayê zanînê ye ku li bin zeviye Kurdistanê hemî core kevîrik têdaye ku dikarê bên paławtin û kelik jê wergirtin. Dyare dagîrkerên Kurdistanê herdam wê karê kirine û niha jî her li ser berdawamin û ȓojane li çyayên Kurdistanê bi hezarn ton kevirkên bi qîmet didizin û wedakêşne navxoye welatên Îran, Iȓaq, Tirkiye û Suriye.

Hêjayê gotinê ye ku ev beşekin ji sedamên sereke ku dagîrkeran ji dagîrkirne Kurdistanê ne dastbernadan û têçuneke zêda diken û tenanet xwêne neteweye xwe jî bo daȓêjin. Dagîrkeran baş dizanin ku paş wan hemî şeȓ û kuştar û têçunan, di akamda qazanceke zêda ji berhemên axe Kurdistanê dagrin. Ji ber wêye ku dagîrkeran ne hêştine zanist û têknolojî li Kurdistanê pêşbikevê. Tenanet ji hemî aliyan û bi hemî coran ji pêşketine gelê Kurd ȓêgiriyê diken. Dagîrkeran û neyarên Kurdistanê bi zêdatir girîng dan bi zîndî kirine xêłan (ĥeşîretan), ole îslamê, wekirîne mizgevt, feqêxane, xwêndingehên olî, gelê Kurd mêjîşor diken. Herwiha bi

bełav kirine mosîqaye sûk û bênaveroke Farsî, Tirkî, Ĥeȓebî û dûr ji şaristaniyete çaweşan bo gelê Kurd ferhengsaziyê diken. Ji aliyeke din bi błav kirine madda yên bêhoş kirinê, cigere, bêkarî û damezrandine kesên dûr ji pȓinsîbe mirovatiyê ji ser postên dastełatê, ȓûmete ȓesene dabûneryete Kurdawarî dişêwênin.

**3-6. Çałên newit (petrol)e Kurdistanê**

Kurdistan ji aliye newitê yêk ji welatên dawłemenda cîhanê ye û ta niha bi dahan çałên newitê têda hatine lêdan. Nav û cêye hinek ji wan çałên newitê wisane:

* Bakurê Kurdistanê
- Çałê Ȓamanş- li nizîk bajarê Batmanê ye
- Çałê Sêrt- li nizîk bajarê Amedê ye
Hêjayê zanînê ye ku ji sała 1954 ȓa dastełate Tirkiye newite wan çałane dardixa û didizî.

* Ȓojavaye Kurdistanê
- Çałê Qereşuk- li bajeroke Malikiye ye parêzgehe Qamîşlu ye.

- Çałê Sorî- li başurê çałê Qereşuk hełketiye.
- Çałê R̂omîlan- li nizîk çałe Sorî hełketiye.

Hêjayê nivîsandinêye ku dastełate Suriye ji sała1980an r̂a r̂ojane 520 hezar boşke newit ji wan çałane didizî û tałan dika.

* Başurê Kurdistanê
- Çałê Ĥeînzale- li bakurê r̂ojavaye Musiłê hełketiye.
- Çałê Bêtme- li nizîk bajare Musiłê hełketiye.
- Çałê Babegur̂gur̂- li nizîk bajare Kerkuke. Ta niha 150 bîrên newitê hatine têda lêdan û ji seda şeşe newite cîhanê ji wê çałê ye.
- Çałê Bay Ĥesen- li bakurê r̂ojavaye bajare Kerkukê ye.
- Çałê Zenbûr- li başurê r̂ojhełate Kerkukê ye.
- Çałê Newitxane- li başurê bajare Xaneqîne.
- Çałe Şêweşok- li nizîk bajeroke Teqteqe ser bi parêzgehe Hewlêrê ye.

Paş sała 2000 çend çałên newite dinjî li parêzgehên Slêmanî, Hewlêr û Dihokê da hatine wedozîn ku ji alîyên małbate Barzanî û Tałebanî r̂a hatine herzan firoş kirin.

* R̂ojhełate Kurdistanê

- Çałê Axacarî- li bajare Axacarî hełketiye û dastełate Îranê bi jêrzevî da newite wê bi kanał kêşî yê didizî û li pałêwgehe Abadanê dar dixa ku berheme řojane ye wî zêdatir ji 100 hezar boşkeye.
- Çałê Paznan- li ser řêgeye mabeîne bajarên Behbehan û Axacarî ye.
- Çałê Geçsaran- li bajare Geçsaranê hełketiye.
- Çałe Mescîd Suleîman- li bajare Mescîd Suleîmane.
- Çałê Newite Spî- li bakurê řojavaye bajare Heftkolê hełketiye.
- Çałê Newit Şa- nizîke başurê řojavaye çyaye Zagrosê ye.

Dyare bilî ji wan çałane, bi dahan çalên newitê dinjî hen ku hinjî ne hatine darxistin ku sûd û qazance hemîyan dařjête gîrfane dagîrkerên Kurdistanê. Tenanet bi dahate wê newitê, dagîrkeran çek û teqemenî yê dakiřin û bo kuştine Kurdan û kavil kirine Kurdistanê bikar tênin. Eger ji seda pênce dahate wê newitê bo gelê Kurdistanê bihatiba bikar anîn, Kurdistan dikarî ji aliye pêşketinê da li ast welatên pîşesazî û tiknolojî ye cîhanê da řikeber ba.

## 3-7. Kan

Li Kurdistanê bi sedan kan (meĥdan)ên cor bi cor hen ku dagîrkeran ji her çar alîyan xerîk darxistin û dizîne berhemên wanin. Bo mînak kanên Meȓmeȓ, Ĥasin, Zeȓînc, Kȓom, Mengenêz, Gugrid, Ȓesas, Fosfat, Baqir, Ûranîom, Zêȓ, Zîv, Ałmas...

## 3-8. Samane av li Kurdistanê

Kurdistan ji babet ave şirîn pir dawłemenda û bi serçaveyêke mezin û girînge ave cîhanê tê hejmartîn. Samane ave sałaneye Kurdistanê bi hezaran milyon mître sêgoşe tê hejmartin. Bełê piranî bi xoȓayî (belaş) diçî û daȓjête kendawên Medya, daryaye Medîterane û gole Xezer.
Ȓołe av li cîhanê ȓoj bi ȓoj li zêda bûn daye û tê pêşbînî kirin ku li pêşeȓoj da, av pir ji newitê grantir û grîngtir dibê. Pȓojeyên wegwastine av li bakurê Kurdistanê bo Ewrupe û Îsȓaîlê dast pêkiriye. Li Îranê jî wegwastine av li ȓojhełate Kurdistanê ȓa bo nav bajarên Îranê wek Îsfehan û Tewrêzê dast pêkiriye.

Herwek dîrok nîşan daye ku dagîrkerên Kurdistanê û hawpeîmanên wan xwastîne gelê Kurd bi błêseye agre newite çałên Kurdistanê bişewtênin, eger Kurd şyar ne bê, di pêşeȓojê da, di nav şepolên avên welatê xwe da bixiniqê.

### 3-9. Çemên girîngên Kurdistanê

Furat û Dîcle drêjtirîn ȓubarên Kurdistanê ne. Ȓubarê Furatê ku drêjtirîn ȓubarê Kurdistanê ye, ji serçave ta bi ȓubare Dîcle têkił dibê, 2800 kîlometre. Drêjaiye Furat di nav axe Kurdistanê da 2170 kîlometre. Ȓubare Furat li çyayên bakurê Kurdistanê diherikê û ji têkiłiye ȓubarên Qeresu ku 46 kîlometre û Murat 615 kîlometre pêkdê.

Drêjaiye ȓubare Dîcle ku ji grave (gole) Gułçuke bakurê Kurdistanê dast pêdika û ji serçave ta bi ȓubarê Furatê têkeł dibê 1900 kîlometre ku 847 kîlometran bi nav axe Kurdistanê da darbaz dibê.

## 3-10. Daristane Kurdistanê

Nizîk 10% zeviye Kurdistanê li daristan û cengełê pêk hatîye. Ji wan darane 65% ji małbate dar beȓun, 20% ji małbate dare ben, 5% ji małbate dar çeqale (badam) û ewê din jî ji darên cor bi corên wek hencîr, tu, henar, çinar, snewber, tirş û... pêkhatine.

## 3-11. Beriztrîn çyayên Kurdistanê

Li Kurdistanê çyayên pir bilind bi berzaye 500 ta 5000 metiran li ser aste daryayê hene. Beşek ji çyayên berzên Kurdistanê wisane:
Agrî Mezin (Aȓaȓat) 5137 metire, li nizîk bajare Agrî ye.
Kuh zerd (Zerd kêw) 4548 metire, li herême Luȓistanê ye.
Dînar 4409 metire, nizîk bajare Dêhloȓane.
Tepê Ȓeşko 4134 metire, nizîk bajare Hekkarî ye.
Sîpan 4058 metire,
Wiştran Kêw 4050 metire,
Agrî Biçuk 3896 metire,
Mor 3807 metire,
Samrî 3794 metire,

Qeredax 3752 metire,

Başteq 3684 metire,

Spîrîn 3668 metire,

Endruk 3660 metir,

Gerîn 3645 metire,

Berdař̂eş 3608 metire,

Dardař̂eş 3608 metire,

Sumbûl 3607 metire,

Hełgurd 3607 metire,

Syakêw 3578 metire,

Murat Baş Aładax 3510 metire,

Qendîl 3452 metire,

Şaho 3390 metire,

Peřo 3357 metire û ...

### 3-12. Pile (darece) ya germaî ya sałane ya Kurdistanê

Li Kurdistanê bi giştî berziye germa yê 40 pile ser sifre û nizmiye serma yê 30 pile jêr sifre. Kurdistan welateke çar werziye û her werze jî sê heîvan dakşênê. Werzên Kurdistanê brîtîne ji bihar, havîn, paîz û zivistan. Başur û řojavaye Kurdistanê germesêrtirin li bakur û řojhełate

Kurdistanê. Bakur û ȓojhełate Kurdistanê jî kwêstantirin li başur û ȓojavaye Kurdistanê.

### 3-13. Ȓêje ya nexwêndawarî li Kurdistanê

Ȓêjeye nexwêndiwarî li Kurdistanê li sała 2013 nizîk bi %35 tê xemłandin (hesbandin) ku li hemî welatên cirane xwe zêdatire. Sedame wê nexwêndiwariyê ji aliyek wedagerê ser jêrdastbûne Kurdistanê û ji aliye din dagîrkeran ji ber berjewendiye ȓamyarî û abûrî yên xwe, gringî bi xwêndiwarî li Kurdistanê ne dane. Dagîrkerên Kurdistanê ne xwastine Kurd ji hîç alîyan da pêşkevîn û nasname ya xwe û mafên seretaiyên xwe nas biken. Dujmin dixwazin ku Kurd her nizan û nexwêndiwar bin, bo wê ku her li jêr daste wan da koîle bimênê. Tenanet xwêndine seretayî li piraniye welatan bi zimane zigmakê (daîkê)ye bełê li piraniye çarparçeyên Kurdistanê xwêndin bo zarokan bi zimanê dagîrkerane.

Hêjayê gotinê ye li Kurdistanê tenanet bi zimane dagîrkeran jî bi hemî kesan darfete xwêndinê nayê daîn. Dagîrkerên Kurdistanê bi cêye xwêndin û pêşketinê,

zêdatir gringî didan bi şeř û hałoziye nav xwe ye Kurdistanê û bi cêy teknolojî û zanistê, çek û teqemenî bo wêrankirine Kurdistanê berhem tênin.

### 3-14. Kiştukał

Kurdistanê li bware kiştukałê da yêk ji dawłemendtirîn welatên řojhełate navîne. Hemî core danewêłeyek wek genim, ceh, řiz, nok, maş, nîsk, lubya û ... lê berhemdê. Li mîve û sewzî da pir dawłemenda û mîveyên weku hermê, sêv, trê, qeîsî, henar, gelas û... sevziyên wek pîvaz, temate, kewer, spînax û ... lê şîndibê.

## 3-15. Ajeł

Kurdistan ji aliye ajełdar (dawerdar) iyê dawłemenda û ajełên wek yêksim (hesp, qatir, ker), małat (pez, bizin, manga, gamêş, ask, beraz) û... dikarîn têda jiyan  biken. Zor pelewerên corawcor wek mrîşk, mrawî, qaz, qel, kotir, kew, çwêleke û ... Di Kurdistanê dajîn.

## 3-16. Netewe ya Kurd

Netewe ya Kurd bi Kirmanc, Soran, Lur̂, Kełhur̂, Bextyar̂î, Goran, Zaza û Hewramî tê gotin. Bi sedame qedaxebûne xwêndin bi zimane zigmakî, zaraveyên Kurdî ji hev dûr ketine, bełê her Kurdak hewił bida, bi asanî ji zaraveyên dinê Kurdî têbiga û bikarê Kurdî ye xwe jî bi hin bûne hemi zaraveyên Kurdî dawłemendtir bika. Dyare di nav piraniye neteweyên dinê cîhanê, zaraveyê cor bi cor hen ku gelê wan tenanet ji hev du tênagen, bełê zimane fermî û xwêndine wan yêk zimane. Di nav piraniye netewan da pispor̂ên zimanzan, zimaneke yêkgirtiye neteweyî pêk anîne. Ew kare bo Kurd jî guncave û dikrê di pêşer̂ojê da, zimaneke

yêkgirtiye Kurdî bo nivîsîn û xwêndinê bête bikar anîn.
Bo şêwaze nivîsîn jî çimkî şêwaze latînî nawneteweyî tire û bi jiyan e serdamê guncav tire, boye baştire ku di pêşeȓojê da zêdatir latînî bête bikar anîn.
Kurd bi bikar anîne şêwaze latînî dikarin xwe zêdatir ji geƚên pêşketîxwazên cîhanê nizîktir biken. Ji alîyêke din zanistên cîhanê jî zêdatir bi pîtên latînî hatine nivîsandin ta bi pîtên Aramî.

Hêjayê gotinê ye ku neteweye Asurî û Suryanî Kurdistanîn û nizîk ji seda dû yê şêniyên Kurdistanê pêk tênin.

**Beşe Çarem**

**4- Olên Kurdistanê**

Ol dyarîdayeke drustkrawe dastên mirovane ku bo bidast anîne xwast û wîstên xwe wê bikar anîne. Mirov bi drêjaiye dîrokê xwaste dastełatdarî û dawłemend bûne têda hebûye. Ev wîst bi şêwazên cor bi cor wek xudêyî, pêxemberî, împiȓatoȓî, paşayetî û ȓamyarî xwe bi ser civakê dasepandiye. Pir caran ev dastełat ji hevker û pir caran jî bi terse hevdu bûn, bełê her hemî bo bi dastxistine dastełat, sermaye û jinan bûne. Xudê di hinek olan da tişteke dîtînî û di hinekan da ne dîtînî bûye. Her civakek ji gore pêdavistiyan, serusaman bi xudê û pêxemberên xwe daye. Di akam da sedan xudê û pexember hatine drust kirin ku hemî ji gor berjewendiye dastełatdaran hatine pêk anîn û hîç ji wan bi ȓastî û zaniste mirovatiyê na yene guncan û pir ji hevdû nakokin ji. Li wir da Kurd jî qase xwe xudê û pêxembere xwe hene ku li kirdawe û felsefe da pir nakokin. Tiştê ku pir bałkeşe, neteweyên dinê cîhanê û cîranên Kurdan hemî bo dawłemend bûn û nasandine nasname ya neteweye

xwe ji olan kelkê xwe wergirtine, bełê bi tersa hemî neteweyêk, ol jî ji Kurdan ȓa bûye binase têkçune nasname ya xwe ku Kurdistanî bûne. Piraniye Kurdan tenê bi nav Kurdin, egîna di kirdwe da ȓojane 17 car kiȓuşim diben bo Ĥeȓeban. Bitaîbet Kurdên musiłman, nasname ya Ĥeȓeb, Fars û Tirkan biî pesend kirine û bi kirdawe jî wê biȓêve diben, bê ku hest bi wê tawane mezin biken ku dijî xwe bikar tênin.

Ȓastî eger lêprisînek li dinyayeke din hebê, Kurdên ku çanda Ĥeȓeban bi nave ole îslamê pesend kirine, têne lêpirsîn û darizandin. Ji ser wê li hember sizayên ku qet ne hesbandibin ȓast tên.

## 4-1. Gemî ya Nûĥ

Piraniye piȓtûkên olî bas li Gemî ya Nûĥ û beserhate wê diken ku Nûĥ ji xełkê serdame xwe xwastiye ku ji gendałkariyê dûrbin ku civat di aştî, tebaî, yeksanî û asudaiyê da bijîn. Nûĥ di xebatê da serneket û bo wê ku mirovatiyê ji xerapkaran paqij bika, gemîyêke mezin drust kir û baweȓpêkrawên xwe û ji her ajełek nêr û mêyek xiste nav wê gemiyê. Paşan ji xudê xwast ku lehîyêke cîhanî ȓaka ku hemî gendałkar têda bixeniqin. Pişte lehîyê ew gemî bo damek li nav avê da ma û paşan li ser çyaye Cudî li bakurê Kurdistanê lenger girt. Bi wê corê xełkên baş li daste xerapkaran ȓizgar bûn.


Hêjayê pêzanînê ye ku lêkolerên pispoȓ paşmahîye Gemî ya Nûĥ li çyaye Cudî wedîtine, ku drêjaiye wî 170 û panaye wî 45 metir bûye. Twêjeran dîroke wê gemiyê wedagêȓen nizîk sed hezar sał pêş.

Goȓe Nûĥ (berînaiye 2 metire û drêjaiye 9 metire) li bajare Cizîre bakurê Kurdistanê ye û dikewê dawêne çyay Cudî. Eger ev goȓe li her dareke wê cîhanê bibe,

dibû bi mezintirîn pîrozgeh bo hemî xełkên cîhanê. Bełê dagîrkerên Kurdistanê ne heştine û na xwazin ku bajareke Kurdistanê bibê pîrozgeyêke mezintir li Mekke, Kerbela û Oȓşelîm. Ne karîne ku çyaye Cudî anjî tirb (goȓe) Nûĥ veguhastine nav welatê xwe, egîna wê karê dikirin.



Çyaye Cudî (Cêye cêgîrbûne Gemî ya Nûĥ)



Çarçêveye Gemî ya Nûĥ

## 4-2. Ole Zerdaşt

Ole zerdaşt bi kevintrîn ole neteweye Kurd hatîye nasîn û dastpêke peîdabûne wî bo nizîk hezar sał pêş ole krîstyanî (300 sał pêş newroze kawe) wedageȓê. Zerdaşt li herême Wirmê (bajare Serdaşt) û li małbateke bi nav Spî Tama li dayk bûye. Spî Tama di zimane Awêstaî da tê wateyê tam spî, tam ȓastî û tam drustiyê. Wê małbatê navê lawê xwe kirine Aşo Zerdaştra Spî Tama. Peîve Aşo li aştiyê ȓa hatîye. Zerdaşt her li zarokiye ȓa pir şyar bû û di temene 30 sałî, xwe ji xełkê dûr xist û xerik (mijul)e xopêgeyandin û hîn bûnê bû. Be awayeke felsefyane bernameye biȓêvberiye civake serdame xwe ji gore olî daȓêşt.

Zerdaşt bo yêkem car di temene 40 sałî li dam çeme Aras xełkê bo ser ole Zerdaştî bangêşt kir û mujdaye Ahuramezda (xudê) bo gelê Medya wek gata anî. Çeme Aras li çyayên mabeîne bakurê Kurdistanê û Kurdistane Sor dastipêdaka û bi sinure ȓojhełate Kurdistanê da têpeȓdibê û daȓjê (daherikê) daryaye Xezer. (Çeme Aras tixubên dastkirda dagîrkerên

Kurdîstanê wate Tirkiye, Ermenistan, Azirbaycan û Îranê pêk tênê).

Pişte wê ku Zerdaşt nawbang darkir, gelên Medya û Pars baweȓî bi ole Zerdaştî anîn. Zerdaşt bo nasandine olê ȓu li paşaye Giştasib (Vîştasp) kir. Welate Giştasib axe Îran û her çar parçeye Kurdistane îȓo di xwe da digirt.

Paşaye Giştasib ole zerdaştî pesend kir û Zerdaşt ji ser nasandine olê xwe berdawam bû ta di şeȓe mabeîne Ercasib paşaye welate Toran (Tirk û Azerî) û Giştasibê da beşdarî kir û di wê şeȓê da bi daste Ercasib hate kuştin.

Zerdaşt paş 37 sał têkoşan bo biłav kirin û nasandine ole Zerdaştî di temene 77 sałan da hate kuştin.

Li ȓwangeye (goȓe) ole Zerdaşt cîhan ji dû hêzên ȓunahî û tarîkiyê pêk hatîye. Ew dû hêz herdam bi hev ȓa di şeȓê dan û cîhanê di nav xwe da dabeş kirie. Serkirdaye ȓunahiyê Ahoramezdaye û beşe tarîkiyê jî Ehrîmene. Ji

goȓ wê olê Ahuramezda heft frişte û Ehrîmen jî sê frîşte hene.
Di ole Zerdaştî da gyan li nav naçê û paş mirinê bo sê şev û ȓojan hest bi xoşî û na xoşiyê dika. Înca ȓu bi dadgeh û lêpirsînewe dibê û ji berdam sê dadweran tê dadgehî kirin. Di wê dadgeyê da, çake û xirapeyên mirov daxrêne terazuyê û biȓyar ji ser tê daîn. Eger çakeyên mirov zedatir bin, gyan êi ȓunahî û xoşyê da damênê û eger jî xirape zêdatir bin, gyan di tarîkî û naxoşiyê da wedamênê. Eger çake û xirape ya mirov yeksan bin, gyane wî kesê, xoşî û naxoşiyê bibînê.

Di ole Zerdaştî bo wê ku gyan bi beriztrîn pile û paye biga, dibê mirov bi sê qonaxên "fikre baş, gotine baş û kirdaweye baş" da darbaz bibê.

Hêjayê gotinê ye ku ole hemî neteweye Kurd berê zerdaştî bûye bełê paş dagîr kirine Kurdistanê, supaye dagîrkere Ĥeȓeb bi zebre şimşêr, xwên ȓiştinê û komełkujiyê, karîn çanda xwe bi nave îslamê bi ser gelê Kurd da bisepênê. Peîve îslam ji teslîm bûnê ve hatîye ku bi Kurdî dibê serşoȓyî û stuxwarî. Her kes ku li

hember supaye Ĥeȓeban ȓadest ne bûba û kiȓnoş û sucday bo wan ne birdiba, bi nave Kafir û Gawir bûnê, wî zînda biçał û kevirbaran dikirin.

Piȓtûke ole Zerdaştyan "Awêsta"ye ku bi zimane Awêsta wate zimanî Kurdî ye wê serdamê hatîye nivîsandin. Nivîsên Awêsta wekî gata hatine nav birin. Gata ji peîve gotinê ȓa hatîye. Gatayên Zerdaşt, yanî gotinên Zerdaşt. Hêjayê gotinê ye ku di ole Zerdaştî da hîç sinurbendiyêk bo mirov ne hatîye dyarî kirin û di çarçêweyêk da ne hatîye dor peç kirin. Zerdaşt ȓêgeye pêşketinê ji xełkê ne girtiye û ȓênwêniye hêvîbexiş bi mirovan daye. Piȓtûke oliye awêsta yeksanîxwazane base jiyan e civakî dika û jin û mêr wek yêk dibînê û maȓê wan yeksan dipejrênê. Wate di hawjîniyê da her kes tenê maȓe hebûne yêk hawjîn wî heye. Jin û mêr xudiyê maȓên yeksanin. Piraniye cêhên olî û dîrokiyên Zerdaştî ji aliye musiłmanan hatine têkdan û şewtandin. Li Kurdistanê pir şûneware dîrok yê Zerdoştî hatine wedozîn, bełê dagîrkeran zêȓê wan didizin û şûnewaran ji têkdidin. Bo mînak li bajare Serdaşt ku bi paîtexte ole Zerdaşt tê nasîn, ta niha çendîn car şûnewar û peîkerên dîrokî

hatine wedozîn, bełê dastełate Îranê hemî şûnewin kirine û dizîne.

Ev du mumyaiyên ku li nizîk bajare Sine di sała 2008an da hatine wedozîn (binêre dîmene jêrî) yêk Zerdaşt û wê din Geştasibe, bełê dastełate Îranê wan bêseruşwên kir û wek hemî samanên dinê Kurdistanê bitałan bir.



Hinek ji şûnewarên dîrokiyên Zerdaştî ku ta niha mane:
Tepke Newşîgyan (Newşî Can Tepe) ku li 60 kîlometriye başurê Hemedan û 20 kîlometriye ȓojavaye bajare Melaîrê ye. Drêjaiye wî 80 metre, panaiye wî 30 metire û błindaiye wî 37 metire.
Tepke Babegyan (Baba Can tepe) ku li sed kîlometiriye başure ȓojavaye Tepke Newşî Gyan hełketiye.

Di herdû şûnewaran da bi dahan agirdan hatine drust kirin, çimkî agir di ole Zerdaştî da hêma (nişane)ye pîroz û xoşikiyê dida.



Ev dîmene Zerdaşt pir wek wê momyaiyê diçî ku di sała 2008an li nizîk bajare Sine hate wedozîn û ji aliye dagîrkere Îranê řa hate bêseruşwên kirin.

**4-3. Ole Cû (Cihû, Musayî)**

Peyamnêr (Pêxember) Musa di çerxe 14e pêş zaînê di nav xełke Oȓşelîm dast bi bławkirine ole cu kir û piȓtûke ole Tewȓatê bo gel bi dyarî anî.

Peîdabûne ole cu li Kurdistanê da wedageȓê bo sała 587e zaînî ku supaye Babil bi serkirdayetiye "Ebûxudneser" hinek ji cuyên Orşelîmê di şeȓ da bi dîl girt û bo babilê bir. Li Babil ȓa hinek ji wan cuyan hatine Kurdistanê û têkiłiye xełke herêmê bûn. Paş drust bûne dastełate Îsȓaîlê piraniye wan cuyan ku li Kurdistanê dijiyan  û li wê darê ji daîk bi bûn, wezevrîne Îsȓaîlê. Wan cuyên ku wegeȓyane Îsȓaîlê ji ser doze Kurd ta niha bê hełwêst bûne.

## 4-4. Ole Krîstyan (Fele)

Peyamnêr Ĥîsa ji kiçeke mêr nekirî (bakire) bi nave Miryem (Mary) li bajare Beytuleĥimê ji daîk bû û li ser bławkirine ole xwe di temene 33 sałî da hate xaç (dar) kirin.

Ole krîstyan ji aliye xêłe Hewariyan li Kurdistanê hatîye bław kirin. Bo mînak li bajarên Ȓuha û Dyanan ku navên wan jî, ji olê hatine, ole krîstyanî hatîye biłav bûn û alîgir peîda kiriye.

Piȓtûke krîstyanî Încîle ku di zimane Kurdî da wataye mizgênî dida. Nizîke seda dahe (10%) şêniyên Kurdistanê krîstyanin. Asurî û Suryanî beşekin ji krîstyanên Kurdistanê.

## 4-5. Ole Îslam

Hezrete Miĥemmed (drudê xudê jê bê) her di temene gencye xwe bi karwançyetî û bazirganîyê serketineke baş bidast anî û înca řaman dastełat xwazî û sermayedarî ya wê drust bû. Paş top kirine řeşuřutên Ĥeřeb û wekřîne hezaran koîle (berda), supayêke bi hêze toqêner (tirsêner) pêk anî. Her dam supaye hezrete Miĥemmed (drudê xudê jê bê) bi serketî êrişe ser karwan û herêmên din di kir. Çimkî esĥabeyên hezrete Miĥemmed (drudê xudê jê bê) îzne kuştin û tałankirine her kesyan hebû. Bo her herêmê êriş kiriban, xełkê di gole xwênê da digewzandin û her kes ji hembere wan řadest ne buba, wî dikuştin. Di akam da supaye wî karî bi ser piraniye hêzên nawçeye Mekke û Medîne da serketî bê. Hezrete Miĥemmed (drudê xudê jê bê) paş bi dast anîne dastełat û samene hozên Ĥîcaz (Ĥeřebistan)ê, bo pitew kirine dastełate xwe, bi nave ole îslamê, karî şeř bi welatên cîran řa damezrêne. Her kes li beranber supaye hezrete Miĥemmed (drudê xudê jê bê) řadest ne buba (teslimîyetê qibûł nekirba), di řêye Ełła da, dihate kuştin.

وَقَاتِلُوا فِي سَبِيلِ اللَّـهِ وَاعْلَمُوا أَنَّ اللَّـهَ سَمِيعٌ عَلِيمٌ.

Bikujn diȓêye Ełła da, baş bizanin ku Ełła bîser û zanaye (Suȓeya Albeqre [manga] Ayete 244).

Musiłman Quȓan piroz bi piȓtûke here bi nirxe cîhanê dizanin û wisa difikrin ku hîç nakokîyêk di vê piȓtûkê da nîne, herwek Ełła bixwe jî dibêjê:

أَفَلَا يَتَدَبَّرُونَ ٱلۡقُرۡءَانَۚ وَلَوۡ كَانَ مِنۡ عِندِ غَيۡرِ ٱللَّهِ لَوَجَدُواْ فِيهِ ٱخۡتِلَٰفٗا كَثِيرٗا

Gelo çime baş vê Quȓanê na bînin, eger ji aliye her kes bilî ji Ełła ȓa bihatiba, bêguman gelek nakokîyên tevlîhev têda dahatne dîtin (Suȓeya Alnisa, Ayete 82).

Dyare her dastełatdarek Quȓanê ji gor berjewendiye xwe şîrove (tefsîr) kiriye, çimkî şîrovegeran zanîne ku eger daqe Quȓanê wek xwe webizevrête ser zimanên di, tijîye ji nakokî. Le wir bo nasîne ole îslamê çend nakokîyên ayetên Quȓane pîroz dipejrênîn:

خَلَقَ ٱلۡإِنسَٰنَ مِنۡ عَلَقٍ

Mirov ji parçe xwênek hatîye drust kirin (Suȓeya Alĥeleq, Ayete 2).

خَلَقَ ٱلۡإِنسَٰنَ مِن نُّطۡفَةٖ فَإِذَا هُوَ خَصِيمٞ مُّبِينٞ

Mirov jî ji nutfeyek bidî anî, egerçê bi zuyî dujmineke aşkraye (Suȓeya Alneĥil, Ayete 4).

وَلَقَدۡ خَلَقۡنَا ٱلۡإِنسَٰنَ مِن صَلۡصَٰلٖ مِّنۡ حَمَإٖ مَّسۡنُونٖ

Bêguman em mirovê ji herî hîşkbûye ȓeşe bingenî drust kir (Suȓeya Alhcir, Ayete 26).

خَلَقَ ٱلۡإِنسَٰنَ مِن صَلۡصَٰلٖ كَٱلۡفَخَّارِ

Mirov ji heȓîyek hîşkbûye wekî swałet (kevin, bikar hatî) drust kir (Suȓeya Alȓeĥman, Ayete 14).

وَهُوَ ٱلَّذِي خَلَقَ مِنَ ٱلۡمَآءِ بَشَرٗا فَجَعَلَهُۥ نَسَبٗا وَصِهۡرٗاۗ وَكَانَ رَبُّكَ قَدِيرٗا

Her ew jî mirov ji avê drust kir, paşan kirine bi ȓegez, jin û jinxwazî, xudê hemrdam bitwanaye.

(Suȓeya Alfirqan, Ayetî 54).

وَمِنۡ ءَايَٰتِهِۦٓ أَنۡ خَلَقَكُم مِّن تُرَابٖ ثُمَّ إِذَآ أَنتُم بَشَرٞ تَنتَشِرُونَ

Ji nîşaneyên wîye ku hûn ji heȓî drust kir, paşan hûn ji nişkêve dibin bi mirov û biłav dibin (Suȓeya Alȓom, Ayete 20).

أَلَمۡ نَخۡلُقكُّم مِّن مَّآءٖ مَّهِينٖ

Gelo hûnê ji aveke bê bayex drust ne kir (Suȓeya Alimirasilat, Ayetî 20).

فَلۡيَنظُرِ ٱلۡإِنسَٰنُ مِمَّ خُلِقَ

خُلِقَ مِن مَّآءٖ دَافِقٖ

يَخۡرُجُ مِنۢ بَيۡنِ ٱلصُّلۡبِ وَٱلتَّرَآئِبِ

Disa ba mirov wird bibê (bifikrê) ku ji çî hatîye drust kirin. Ji aveke bazirqebes (bi tund hatnexwar) hatîye drust kirin. Ku ji nav biȓbiȓyên piştê û qefeseye sîngê daherikî (Suȓeya Altariq, Ayetên 7,6,5).

Gelo Ełła dibê mirovî ji çî drust kiribê, ji av, heȓî, nutfe, anjî xwên? Ev hemî nakokî çine? Geło emê ji piȓ bibne mirov û paşan błav dibîn? Gelo ev pir ji ȓastîyê ne dûrin? Drust bûne mirov ji ave mabeîne biȓbiȓeye pişt û qefeseye sîngê pir nakoke bi zanist pizîşkîye îȓo? Ȓastî pêwîste mirov bifikrê û ȓastiyan bibînê.

هُوَ الَّذِي خَلَقَ لَكُم مَّا فِي الأَرْضِ جَمِيعًا ثُمَّ اسْتَوَى إِلَى السَّمَاء فَسَوَّاهُنَّ سَبْعَ سَمَاوَاتٍ وَهُوَ بِكُلِّ شَيْءٍ عَلِيمٌ.

Here ew xudêye tiştên ser herdê, têkȓa bo hûn drust kiriye, paşan xwast û ȓukire azmanê, heft azman bidî anî, her ew jî agadare hemî tiştane (Suȓeya Albeqere, Ayete 29).

Hebûne heft azman bi zaniste îȓo pir nakoke. Eger Quȓan gotinên xudêne çime agadariye na drust têda hene?

لَّيْسَ عَلَيْكَ هُدَاهُمْ وَلَكِنَّ اللَّهَ يَهْدِي مَن يَشَاء وَمَا تُنفِقُواْ مِنْ خَيْرٍ فَلأنفُسِكُمْ وَمَا تُنفِقُونَ إِلاَّ ابْتِغَاء وَجْهِ اللَّهِ وَمَا تُنفِقُواْ مِنْ خَيْرٍ يُوَفَّ إِلَيْكُمْ وَأَنتُمْ لاَ تُظْلَمُونَ.

Musiłman kirine xełkê ji ser te pêwîst (feȓiz) ne hatîye kirin, belkî keîfe Ełła ji her kesekê bê, hîdayete dika û wî musiłman dika, tiştên ku didan ji çake û xêr bo hûne, çimkî tenê ji ber Ełła mał û samane xwe di bexşîn, her mał û samanên didan, bi têr û zêdayî ji we ȓa tê daîn, stem jî ji we nayete kirin (Suȓeya Albeqeȓe, Ayete 272).

Di ayete 244e Suȓeya Albeqeȓe, Ełła dafermê ku di ȓêye Ełła da xełkên bê baweȓ bikujin, bełê di ayete 272e heman Suȓeyê da, dafermê musiłman kirine xełkê ji ser te ne hatîye pêwîst kirin û her kes ku Ełła bixazê hîdayet dika û hez jî neke, gumȓah dika. Wate musiłman bûn û kafir bûn her dûk ji karên Ełłan. Ev dû ayete hem bihev ȓa nakokin û hem jî bi hemî îslamê ȓa nakokin. Çimkî musiłman herdam ayete 244an bicê anîne û di ȓêye Ełła da her kes xwastibin kuştine.

وَمِنْهُم مَّن يَسْتَمِعُ إِلَيْكَ وَجَعَلْنَا عَلَىٰ قُلُوبِهِمْ أَكِنَّةً أَن يَفْقَهُوهُ وَفِي آذَانِهِمْ وَقْرًا وَإِن يَرَوْا كُلَّ آيَةٍ لَّا يُؤْمِنُوا بِهَا حَتَّىٰ إِذَا جَاءُوكَ يُجَادِلُونَكَ يَقُولُ الَّذِينَ كَفَرُوا إِنْ هَٰذَا إِلَّا أَسَاطِيرُ الْأَوَّلِينَ.

Hinek ji wan gûhê ji te dagrin, bełê ez çend perda kişandine bi ser diłê wan, ta têneg̃en, gûhye wan jî keȓ kirîye, eger hemi bełge û nîşaneyan jî bibînîn hinjî her baweȓîye wan naye. Dibêjin ku ev bilî ji efsaneyên puçên pêşînîyan tiştê din nîne (Suȓeya Alanĥam, Ayete 25).

وَلَوْ شَاءَ اللَّهُ لَجَمَعَهُمْ عَلَى الْهُدَىٰ

Eger Ełła bixwastiba, hemyan ji ser yêk hîdayet û ȓênasî top dikir (Suȓeya Alanĥam, Ayete 35).

وَالَّذِينَ كَذَّبُوا بِآيَاتِنَا صُمٌّ وَبُكْمٌ فِي الظُّلُمَاتِ مَن يَشَإِ اللَّهُ يُضْلِلْهُ وَمَن يَشَأْ يَجْعَلْهُ عَلَىٰ صِرَاطٍ مُّسْتَقِيمٍ

Wên wisa ayet û nîşaneyên me bi direv dizanin, di nav tarîkîyê dan û keȓ û lałin, Ełła keîf ji ser herkes bê,ȓêye ȓast łê wenda dika, keîf ji ȓênasîye herkes jî bê, daxate ser ȓasteȓêye (Suȓeya Alanĥam, Ayete 39).

فَمَن يُرِدِ ٱللَّهُ أَن يَهْدِيَهُۥ يَشْرَحْ صَدْرَهُۥ لِلْإِسْلَٰمِ وَمَن يُرِدْ أَن يُضِلَّهُۥ يَجْعَلْ صَدْرَهُۥ ضَيِّقًا حَرَجًا كَأَنَّمَا يَصَّعَّدُ فِى ٱلسَّمَآءِ كَذَٰلِكَ يَجْعَلُ ٱللَّهُ ٱلرِّجْسَ عَلَى ٱلَّذِينَ لَا يُؤْمِنُونَ.

Ca herkesek xudê bixazê ȓêye ȓast nîşan dida, darune wî fireh dika bo îslametîyê, ger bixazê jî ȓêye wî wenda dika, dił û darune wî teng dika, wek ku pir bi astem (zeĥmetî) berve azmanê serdikevê, wisa xudê xirape, na

paqijî û siza dida bi wan kesan ku bawer û îman ni anîne (Suȓeya Aalanĥam, Ayete 125).

مَن يُضۡلِلِ ٱللَّهُ فَلَا هَادِىَ لَهُ ۚ وَيَذَرُهُمۡ فِى طُغۡيَـٰنِهِمۡ يَعۡمَهُونَ

Kesê ku Ełła wî gumȓah bika, hîç ȓênasî kereke wî niye, ji wan durî dika ku di yaxî (asî) bûne xwe da bitlêneve (bi lihin) (Suȓeya Alanĥam, Ayete186).

وَمَآ أَرۡسَلۡنَا مِن رَّسُولٍ إِلَّا بِلِسَانِ قَوۡمِهِۦ لِيُبَيِّنَ لَهُمۡۖ فَيُضِلُّ ٱللَّهُ مَن يَشَآءُ وَيَهۡدِى مَن يَشَآءُۚ وَهُوَ ٱلۡعَزِيزُ ٱلۡحَكِيمُ

Hîç pêxemberan me ne nardiye, bi zimane hoze wan ne bê, ta ku hemî tiştan ȓun bika, paşan xwast xudê ji ser herkes bê gumȓah dika, xwast ji ser herkes jî bê, berve şarezaîyê diba, her ev zał û karbecêye (Suȓeya Abrahîm, Ayete 4).

وَعَلَى ٱللَّهِ قَصۡدُ ٱلسَّبِيلِ وَمِنۡهَا جَآئِرٌۚ وَلَوۡ شَآءَ لَهَدَىٰكُمۡ أَجۡمَعِينَ

Ji ser Ełłêye ȓun kirine ȓêbazên ȓast, hinek ji ȓêbazan na drustin, eger xuda bixwastiba, beȓastî we hemi zana dikir (Suȓeya Alneĥil, Ayete 9).

وَلَوۡ شَآءَ ٱللَّهُ لَجَعَلَكُمۡ أُمَّةً وَٰحِدَةً وَلَـٰكِن يُضِلُّ مَن يَشَآءُ وَيَهۡدِى مَن يَشَآءُۚ وَلَتُسۡـَٔلُنَّ عَمَّا كُنتُمۡ تَعۡمَلُونَ

Eger Ełła bixwastiba bêguman hûn dakire yêk gel, bełê xudê wê ku bixazê gumȓah dika, wîst ji ser herkesek jî

bê, berve r̂êbaze r̂ast diba, bêguman pirsyar tê kirin ji ser wan karên ku hûn kirine (Sur̂eya Alneĥil, Ayete 93).

أُوْلَـٰٓئِكَ ٱلَّذِينَ طَبَعَ ٱللَّهُ عَلَىٰ قُلُوبِهِمۡ وَسَمۡعِهِمۡ وَأَبۡصَـٰرِهِمۡۖ وَأُوْلَـٰٓئِكَ هُمُ ٱلۡغَـٰفِلُونَ

Ew wan kesên ku Ełła mor xistiye ser dił, darun, gûh û çavên wan, her ew jî bê agan (Sur̂eya Alnehil, Ayete 108).

...إِنَّا جَعَلۡنَا عَلَىٰ قُلُوبِهِمۡ أَكِنَّةً أَن يَفۡقَهُوهُ وَفِىٓ ءَاذَانِهِمۡ وَقۡرًاۖ وَإِن تَدۡعُهُمۡ إِلَى ٱلۡهُدَىٰ فَلَن يَهۡتَدُوٓاْ إِذًا أَبَدًا

...bir̂astî em perda kişand bi ser dilê wan da, ta ku ji wî tênegen û gûhê wan jî ker̂ kir, eger bang jî bikeî bo hîdayet û şarezaîyê, tûcar r̂êye hîdayet û şarezaîyê na girneber (Sur̂eya Alkehef, Ayete 57).

أَلَمۡ تَرَ أَنَّآ أَرۡسَلۡنَا ٱلشَّيَـٰطِينَ عَلَى ٱلۡكَـٰفِرِينَ تَؤُزُّهُمۡ أَزًّا

Gelo nizanîn ku em şeîtan şanda nav dił û darune bê bawer̂an, ta wan pałbida (teşwiq bika) û bixapênê (Sur̂eya Miryem, Ayete 83).

وَلَوۡ شَآءَ رَبُّكَ لَأٓمَنَ مَن فِى ٱلۡأَرۡضِ كُلُّهُمۡ جَمِيعًاۚ أَفَأَنتَ تُكۡرِهُ ٱلنَّاسَ حَتَّىٰ يَكُونُواْ مُؤۡمِنِينَ

Eger perwerdigare te wîstiba, bêguman wê ji ser zevî (herdê)ye hemî bihev r̂a bawer̂ (îman) di anîn, gelo te zorî ji xełkê dikeî ta ku bibne bawer̂dar (Sur̂eya Ynis, Ayete 99).

وَلَوۡ شِئۡنَا لَأٓتَيۡنَا كُلَّ نَفۡسٍ هُدَىٰهَا وَلَٰكِنۡ حَقَّ ٱلۡقَوۡلُ مِنِّى لَأَمۡلَأَنَّ جَهَنَّمَ مِنَ ٱلۡجِنَّةِ وَٱلنَّاسِ أَجۡمَعِينَ

Eger êm Bixwazin, şarezayî û hîdayet dabexşî bi hemi kesan, bełê niha biȓyar ji aliye minê cêgîr bwe, bêguman dozex tijî dikem ji cinok û mirov be têkȓayî (Suȓeya Alsucda, Ayete 13).

Di wan çend ayetên sereve xuyanî dika ku Ełła xwe biȓyar daye kê musiłman anjî kafir bibê û mirovan li hember çarenivîsa xwe bê dastełat hêştiye. Gelo Ełła dibê hez ji şeȓ û xwênȓiştinê kirbê ku wan nakokyan di nav mirovan da drust kiriye? Dabê tawanbar bo mirov bê ku Ełła çendîn perda bi ser dił û gûhye wan da kişandiye ku çake ne bîsin û xirape ȓeçav ken?

لَا شَرِيكَ لَهُۥ ۖ وَبِذَٰلِكَ أُمِرۡتُ وَأَنَا أَوَّلُ ٱلۡمُسۡلِمِينَ.

Şerîk û hevałê wî niye, bi wê ji min ȓa ferman daye, ez jî yêkem musiłmanim (Suȓeya Alnĥam, Ayete 163).

مَا كَانَ إِبۡرَٰهِيمُ يَهُودِيًّا وَلَا نَصۡرَانِيًّا وَلَٰكِن كَانَ حَنِيفًا مُّسۡلِمًا وَمَا كَانَ مِنَ ٱلۡمُشۡرِكِينَ

Îbȓahîm ne cuhî bû, ne Ĥîsayî, belkî ĥeqxwaz û musiłman bû, jî havełdaneran jî ne bû (Suȓeya Alĥmran, Ayete 67).

Ĥezrete Îbr̂ahîm hezar sał pêş ji daîk bûne ĥezrete Miĥemmed çote ser dilovaniye xwe. Ev nakokyeke mezine ku Qur̂an ji aliyek dibêjê ĥezrete Îbr̂ahîm musiłman bûye, ji aliyekî din dibêjê ĥezrete Miĥemmed (druda xudê jê bê) yêkem musiłmane. Ev nakokiye şik û gumanan drust dika ku nivîskare Qur̂ane pîroz dibê kê bê, mirove anjî Ełła ye?

يَٰبَنِيٓ ءَادَمَ لَا يَفۡتِنَنَّكُمُ ٱلشَّيۡطَٰنُ كَمَآ أَخۡرَجَ أَبَوَيۡكُم مِّنَ ٱلۡجَنَّةِ يَنزِعُ عَنۡهُمَا لِبَاسَهُمَا
لِيُرِيَهُمَا سَوۡءَٰتِهِمَآۚ إِنَّهُۥ يَرَىٰكُمۡ هُوَ وَقَبِيلُهُۥ مِنۡ حَيۡثُ لَا تَرَوۡنَهُمۡۗ إِنَّا جَعَلۡنَا ٱلشَّيَٰطِينَ
أَوۡلِيَآءَ لِلَّذِينَ لَا يُؤۡمِنُونَ

Ey nevşên Adam! Şeîtan we ne xapênê, herwek bav û daîkê we ji nav wê biheştê darkir, cil û berge ji ber wan dar̂inîn, ta şerimgayên wan pîşane yêktirî bida, şeîtan û darudasteye wî bi corek dibînin, ku hûn wan nabînin, bêguman em şeîtan kir, bi dost û yarmetîdare wan kesan ku bawer̂ û îman na yênîn (Sur̂eya Alaĥraf, Ayete 27).

Ełła çima şeîtan drust kiriye û kiriye bi doste kesanek ku îman ne hênin, gelo çima dibê mirov tawanbar bê ji kirdaweyên ku Ełła bi alîkarîye şeîtan pêk aniye?

يَـٰٓأَيُّهَا ٱلرَّسُولُ لَا يَحۡزُنكَ ٱلَّذِينَ يُسَـٰرِعُونَ فِى ٱلۡكُفۡرِ مِنَ ٱلَّذِينَ قَالُوٓاْ ءَامَنَّا بِأَفۡوَٲهِهِمۡ وَلَمۡ تُؤۡمِن قُلُوبُهُمۡۛ وَمِنَ ٱلَّذِينَ هَادُواْۛ سَمَّـٰعُونَ لِلۡكَذِبِ سَمَّـٰعُونَ لِقَوۡمٍ ءَاخَرِينَ لَمۡ يَأۡتُوكَۖ يُحَرِّفُونَ ٱلۡكَلِمَ مِنۢ بَعۡدِ مَوَاضِعِهِۦۖ يَقُولُونَ إِنۡ أُوتِيتُمۡ هَـٰذَا فَخُذُوهُ وَإِن لَّمۡ تُؤۡتَوۡهُ فَٱحۡذَرُواْۚ وَمَن يُرِدِ ٱللَّهُ فِتۡنَتَهُ ۥ فَلَن تَمۡلِكَ لَهُ ۥ مِنَ ٱللَّهِ شَيۡـًٔاۚ أُوْلَـٰٓئِكَ ٱلَّذِينَ لَمۡ يُرِدِ ٱللَّهُ أَن يُطَهِّرَ قُلُوبَهُمۡۚ لَهُمۡ فِى ٱلدُّنۡيَا خِزۡىٌۖ وَلَهُمۡ فِى ٱلۡأَخِرَةِ عَذَابٌ عَظِيمٌ

Ey pêxember! Wan kesên ku ji bê baweȓî da pêşbiȓkê diken, te peroş û xembar neken,...herkes Ełła bixazê bîxate nav gumȓahiyê, îdin (îitr) te li hemebr xudê da nikarî hiç bikey, wan ew kesin ku xudê na xazê diłê wan pak û paqij bika, di wê cihanê da ȓiswa dibin û di paşeȓojê da li hemebr cezrebe (şikence)yêke mezîn ȓast tên (Suȓeya Almaîda, Ayete 41).

Eger xudê bo xwe nixazî diłê kesanek paqij bike, gelo çima pêxember şandiye ku zehmetê bi wan ȓa bikşênê? Ev nakokî dar dixa ku dibê nivîskare wê piȓtûke pîroze kê bê?

أَوَلَمۡ يَرَ ٱلَّذِينَ كَفَرُوٓاْ أَنَّ ٱلسَّمَـٰوَٲتِ وَٱلۡأَرۡضَ كَانَتَا رَتۡقًا فَفَتَقۡنَـٰهُمَاۖ وَجَعَلۡنَا مِنَ ٱلۡمَآءِ كُلَّ شَىۡءٍ حَىٍّۖ أَفَلَا يُؤۡمِنُونَ

Gelo wan kesên ku bê baweȓin wird nabin ku biȓastî azmanekan û ev zewye pêk ȓa liçka (grêdra) bûn, em ji

hev cuda kirin. Hemî zîndaweran ji av drust kir, gelo çima îman na înin (Suȓeya Alanbya, Ayete 30).

وَجَعَلۡنَا ٱلسَّمَآءَ سَقۡفٗا مَّحۡفُوظٗاۖ وَهُمۡ عَنۡ ءَايَٰتِهَا مُعۡرِضُونَ

Em azman kir bi baneke parastî, egerçî wan ji nîşaneyên azmanê xwe diparêzin (Suȓeya Alanbya, Ayete 32).

أَلَمۡ تَرَ أَنَّ ٱللَّهَ سَخَّرَ لَكُم مَّا فِي ٱلۡأَرۡضِ وَٱلۡفُلۡكَ تَجۡرِي فِي ٱلۡبَحۡرِ بِأَمۡرِهِۦ وَيُمۡسِكُ ٱلسَّمَآءَ أَن تَقَعَ عَلَى ٱلۡأَرۡضِ إِلَّا بِإِذۡنِهِۦٓۚ إِنَّ ٱللَّهَ بِٱلنَّاسِ لَرَءُوفٞ رَّحِيمٞ

Gelo na binî her tiştê ku di zevî daye xudê ji bo we kedî (tamijî) kiriye, gemî jî kedî kiriye û her bi fermane wî li darya da dêt û diçî, azman jî ȓagiȓtiye ta ne kevê bi ser zevîyê, meger bi xwe xwast ji ser bê, bi ȓastî Ełła bi xełkê ȓa pir diłsoz û diłovane (Suȓeya Alhec, Ayete 65).

Azman tenê betałaîye û serbane zevîyê niye. Ev gotine Ełła ji aliye zanistî pir nakoke bi ȓastiyê ȓa. Ełła çon di karê hem tirsêner, şewtêner, sizadar, tołestêner û di heman dam jî da diłsoz û diłovan bê? Wan ayetan dardixen ku ev nivîse hełbestrawe aste şyariye mirove sedaye şeşe zaînî bûye û bi gotinên xudê na guncên û tenê bo berjewendî û dastełatxwaziyê hatine nivîsandin.

قُلۡ مَن رَّبُّ ٱلسَّمَٰوَٰتِ ٱلسَّبۡعِ وَرَبُّ ٱلۡعَرۡشِ ٱلۡعَظِيمِ

Bêje gelo perwerdigare heft azman û perwerdgare wê texte mezin kîye (Suȓeya Almuminun, Ayete 86).

Ji bware zanisitî azman betałaye û ser û bane wî nîne ta 7 dane bin. Xiȓike zevî jî xiȓe ne texte, tê wê wateyê ku zanist û gotinên Ełła nakokin?

لَّا تَجۡعَلُواْ دُعَآءَ ٱلرَّسُولِ بَيۡنَكُمۡ كَدُعَآءِ بَعۡضِكُم بَعۡضٗاۚ قَدۡ يَعۡلَمُ ٱللَّهُ ٱلَّذِينَ يَتَسَلَّلُونَ مِنكُمۡ لِوَاذٗاۚ فَلۡيَحۡذَرِ ٱلَّذِينَ يُخَالِفُونَ عَنۡ أَمۡرِهِۦٓ أَن تُصِيبَهُمۡ فِتۡنَةٌ أَوۡ يُصِيبَهُمۡ عَذَابٌ أَلِيمٌ

Hergîz bang kirine pêxember bo we, wek bang kirine hinke ji hinekan ji we damenên, bêguman Ełła heîya ji wan kesaneye ku xwe didizin, wên ku ji fermane pêxember serpêçî diken, ji wê bitirsin bełayek tuş bibin, yan sizayeke bijan bigrin (Suȓeya Alnur, Ayete 63).

Ev ayete xełkên sawêlke mêjîşuştî kirye ku kiȓnoşber û milkeçe pêximber û Ĥeȓeban bin. Xełkên Emrîka, Ewrupa, Ûstiȓalya, Kaneda, Çîn û Japon bi drêjaye dîrokê serpêçye fermanên pêxember û Ełła kirine û hin jî hîç sizayeke bijan beroke wan ne girtiye, belkî baştirîn xizmetguzaryan ji bware pîşesazî û zanistyê pêşkeşe

gelên cîhanê kirine. Xełkên musiłman jî bi piştevanîye Qur̂ane pîroz, gelên dinê cîhanê bi cîhadê ditirsênin û ev jî bi şanazî, dahêner û dyariye Ełła bo mirovatiyê dibînin.

قُلۡ أَئِنَّكُمۡ لَتَكۡفُرُونَ بِٱلَّذِي خَلَقَ ٱلۡأَرۡضَ فِي يَوۡمَيۡنِ وَتَجۡعَلُونَ لَهُۥٓ أَندَادٗاۚ ذَٰلِكَ رَبُّ ٱلۡعَٰلَمِينَ

Bêje gelo hûn ji r̂astî da bê bawer̂in bi wê kesê ku ev zevî di dû r̂ojan da bidî anî? Şerîk û havał jî bo bir̂yar didan! Ew perwerdgare cîhaniyane (Sur̂eya Fêslet, Ayete 9).

فَقَضَىٰهُنَّ سَبۡعَ سَمَٰوَاتٖ فِي يَوۡمَيۡنِ وَأَوۡحَىٰ فِي كُلِّ سَمَآءٍ أَمۡرَهَاۚ وَزَيَّنَّا ٱلسَّمَآءَ ٱلدُّنۡيَا بِمَصَٰبِيحَ وَحِفۡظٗاۚ ذَٰلِكَ تَقۡدِيرُ ٱلۡعَزِيزِ ٱلۡعَلِيمِ

Wê damê heft azman di dû r̂ojan da bidî anî, di her azmanek da kar û bare taîbet bi xwe pêr̂agehand û azman dinya jî, bi çira werazand û parast, eve endazegire zał û zanaye (Sur̂eya Feslet, Ayete 12).

ٱللَّهُ ٱلَّذِي خَلَقَ ٱلسَّمَٰوَٰتِ وَٱلۡأَرۡضَ وَمَا بَيۡنَهُمَا فِي سِتَّةِ أَيَّامٖ ثُمَّ ٱسۡتَوَىٰ عَلَى ٱلۡعَرۡشِۖ مَا لَكُم مِّن دُونِهِۦ مِن وَلِيّٖ وَلَا شَفِيعٍۚ أَفَلَا تَتَذَكَّرُونَ

Her ev Ełłaye ku azmanan û zevî û wê di mabeîne wan daye di şeş r̂ojan da drust kir, paşan li ser texte fermanr̂ewaiye xwe damezra, bilî ji wî hîç yarmetîdareke we niye, gelo çima na fikrin (Sur̂eya Alsucda, Ayete 4).

Dibê çima nusere Quȓanê bîr ne kiribê ku nakokî heye di nav wan sê ayetên sereve. Dû ȓoj di geł dû ȓoj di bê çar, ji aliyeke din di bêje şeş ȓoj kişand (2 + 2 = 4 na bê 6).

وَكَذَٰلِكَ أَوۡحَيۡنَآ إِلَيۡكَ قُرۡءَانًا عَرَبِيًّا لِّتُنذِرَ أُمَّ ٱلۡقُرَىٰ وَمَنۡ حَوۡلَهَا وَتُنذِرَ يَوۡمَ ٱلۡجَمۡعِ لَا رَيۡبَ فِيهِۚ فَرِيقٌ فِى ٱلۡجَنَّةِ وَفَرِيقٌ فِى ٱلسَّعِيرِ

Her bi wê ȓewişê quȓanêke Ĥeȓebî ji te ȓa şand, ta ku tirsê binye şêniyên bajar û herême Mekkeyê, tirse ȓoje top bûnê jî binye ber wan ku hîç guman têda niye dasteyêk ji wan di biheşt û dasteyêk jî di dozexê dan (Suȓeya Alşura, Ayete 7).

Ji wê ayetê sereve dardikevê ku nusere Quȓan tenê zanyarî ji ser bajare û herême Mekkeyê bûye, ne zaniye ku xiȓikê zevî xiȓe û li Emrîka û Ûstiȓalya jî mirov dijîn ku li zimane Ĥeȓebî her tênagen. Bi awayeki din xudê Quȓan tenê bo xełkê Ĥeȓeb şandiye û piȓtûkeke cihanî niye? Dabê paş wan xwêndinan, mirov her xwe di mêjîşoriyê da bihêlê anjî şyar bibê û tobe ji ferhenge Ĥeȓeb bika?

ثُمَّ أَخَذۡتُ ٱلَّذِينَ كَفَرُواْۖ فَكَيۡفَ كَانَ نَكِيرِ

Min xezeb girt ji wan ku kafir û bê baweȓ bûn, îdî siza û tołeya min çewa bûya (Suȓeya Fatir, Ayete 26).

Egerçî piraniye xełkên Çîn, Japon, Emrîka, Ûstiȓalya, Ewrupa û Kaneda kafirin (ne musiłmanin), bełê ne ketne ber xezebe Ełla, belkî ketne ber berekete wî. Herçî zanist û pêşketine di wan welatane daye û herçî mirovkuj û paşketî jî di welatên musiłman da tên perwerda kirin.

وَٱلشَّمۡسُ تَجۡرِى لِمُسۡتَقَرٍّ لَّهَاۚ ذَٰلِكَ تَقۡدِيرُ ٱلۡعَزِيزِ ٱلۡعَلِيمِ

Ȓoj (xor) jî dimeşê berve wê qonaxê ku hatîye diyar kirin, ew jî endazeye diyar krawe xudêye zał û pir zanaye (Suȓeya Ys, Ayete 38).

لَا ٱلشَّمۡسُ يَنۢبَغِى لَهَآ أَن تُدۡرِكَ ٱلۡقَمَرَ وَلَا ٱلَّيۡلُ سَابِقُ ٱلنَّهَارِۚ وَكُلٌّ فِى فَلَكٍ يَسۡبَحُونَ

Ne ȓoj dikarê biga bi heîvê, ne ew jî pêş ȓojê dikevê, her yêk ji wan di cixzêk (xetek) da ajinîyê diken (Suȓeya Ys, Ayete 40).

Ji gorî wan dû ayetên serve ȓoj û heîv herdûk di hałe geȓan dan! Ew pir nakoke bi zaniste îȓo ku zevî bi dore ȓojê da dizevirê û ȓoj bê cułeye (seknîye). Ji wê

dardikevê ku îslam drustkrawe Ĥezreta Mihemmeda, nek xudê. Çimkî xudê ku r̂oj drust kiriye dizanê ku bi dore zevî da na zevirê.

ٱقۡتَرَبَتِ ٱلسَّاعَةُ وَٱنشَقَّ ٱلۡقَمَرُ

Dame pesłan (qyamet) nizîk bûye û heîv jî let (dû qût) bûye (Sur̂eya Alqemer, Ayete 1).

Ev ayete 1400 sał pêş hatîye gotin, çima ta niha jî qyamet r̂a ne bûye û heîv jî let ne bûye?

مَّن ذَا ٱلَّذِى يُقۡرِضُ ٱللَّهَ قَرۡضًا حَسَنًا فَيُضَـٰعِفَهُۥ لَهُۥ وَلَهُۥۤ أَجۡرٌ كَرِيمٌ

Kiye ku qerze baş dida bi Ełła, ta ku Ełła jî çend qat bo wî wezevrênê, padaşe hêjaye wî jî heye (Sur̂eya Alĥedîd, Ayete 11).

Di çendîn ayetan da gotiye ku Ełła ji hemî kesan bênyaze, gelo çima qerzê ji xełkê dixwazî? Gelo pêxember bo xwe nyaza wî bi sermaye bûye û wisa kasipî kiriye?

هُوَ ٱللَّهُ ٱلَّذِى لَآ إِلَـٰهَ إِلَّا هُوَ ٱلۡمَلِكُ ٱلۡقُدُّوسُ ٱلسَّلَـٰمُ ٱلۡمُؤۡمِنُ ٱلۡمُهَيۡمِنُ ٱلۡعَزِيزُ ٱلۡجَبَّارُ ٱلۡمُتَڪَبِّرُۚ سُبۡحَـٰنَ ٱللَّهِ عَمَّا يُشۡرِڪُونَ

Her ew Ełłaye ku hîç peristrawek bilî ji wî niye, paşa û xodan dastełate, pak û paqije, sax û bêĥeîbe, aram bexiş û hêmine, çawedêr û parêzere, hemî kêm û kuȓyan çareser dika, hêjayê hemî mezinyane, pak û paqije ew Ełłaye ji wan hawbeşan ku ji bo wî dadinên (Suȓeya Alĥeşir, Ayete 23).

Meger ev kêm û kuȓî niye ku gelên Tirk, Azerî, Ĥeȓeb û Fars welate Kurdistanê dagîr kirine û hemî ȓojan mirovkujîyan diken? Çima Ełła çavpoşî li diȓindayî û hovyetîye wan netewan dika?

إِن تُقۡرِضُواْ ٱللَّهَ قَرۡضًا حَسَنًا يُضَـٰعِفۡهُ لَكُمۡ وَيَغۡفِرۡ لَكُمۡۚ وَٱللَّهُ شَكُورٌ حَلِيمٌ

Eger qerz bidan bi xudê bi qerze baş, xudê jî çend beraber zêdatir dikat bo we, ji gûneh û şaşîyên we jî xoş dibê, xudê pêzan û arame (Suȓeya Altexabin, Ayete 17).

Meger here ev Quȓane ne gotiye ku Ełła ji hemî şitêk û hemî kes bê nyaze, gelo çima xwaste qerzê ji bendyan dike, dibê xudê qerzê bo çî bê? Meger Quȓan ne gotiye

sûd wergirtin naȓewaye (ĥerame), îdî bo xuda dixazê sûd û qazancê bidate bendayan? Dibê ew qerzane bi kê da bo Ełła bişênin? Eger pêxember û îmamên pêş wê erkeyan hebûbê, dibê îro Teyb Edoxan,Ĥelî Xaminey û şêxên Ĥeȓeb wan draw û qerzan bişênin bo Ełła? Eger ev nakokî nebin, dibê çî nakokî bê? Dibê mirov kijan damê mêjî û ȓaman xwe bikar bênê?

يَا بَنِي إِسْرَائِيلَ اذْكُرُواْ نِعْمَتِيَ الَّتِي أَنْعَمْتُ عَلَيْكُمْ وَأَنِّي فَضَّلْتُكُمْ عَلَى الْعَالَمِينَ.
Ey ȓołeyên Îsȓaêl, wan naz û niĥmetan ji ber çavan bigrin ku min ȓişt bi ser we, ku min ȓêze we da bi ser hemî xełkê serdame we (Suȓeya Albeqere, Ayete 40).

Ełła le wir da cudayî xistiye nav neteweyan ku boxwe drust kiriye, gotinên xudê yeksanîxwazane nîne.

فَوَيْلٌ لِّلَّذِينَ يَكْتُبُونَ الْكِتَابَ بِأَيْدِيهِمْ ثُمَّ يَقُولُونَ هَذَا مِنْ عِندِ اللّهِ لِيَشْتَرُواْ بِهِ ثَمَناً قَلِيلاً فَوَيْلٌ لَّهُم مِّمَّا كَتَبَتْ أَيْدِيهِمْ وَوَيْلٌ لَّهُمْ مِّمَّا يَكْسِبُونَ.
Serencam hawar bo ew kesên ku bidaste xwe piȓtûk dinivîsênin û paşan dibêjin ew ji aliye Ełła ye, ta ku kałaye (sermaye)ke kêm pêbikȓin, dak têda çin û

sernegun bin, bo wan tiştên ku di nivîsênên û bo wê jî bidast tênin (Suȓeya Albeqere, Ayete 79).

Le wir da Ełła cenêv (dijûn)an bi xełkê didat û sukayetî bi kesên ku nivîsên din dinivîsênin dika. Dibê Ełła çima xwe hênabê ȓêze wan mirovan ku wan xirap zaniye û bi naşîrnî ji wan ȓa ayat şandiye. Di serdame îȓo da mirove têgeîştî eger ȓexne jî lê bigrin û dijî nivîse wî, nivîseke dine bihêztir anjî bêhêztir binivîsênin, bi dıłeke fireh wê pesend dika û dibêjê ba civak biȓyardar bê, kîjan tişt hez kir û bi ȓast zanî, ba hełbjêrin. Eger wê hełwêste Ełła ku li hembere mirovan girtiye, îȓo keseke di bigrî, nayete pesend kirin.

ثُمَّ أَنزَلَ ٱللَّهُ سَكِينَتَهُۥ عَلَىٰ رَسُولِهِۦ وَعَلَى ٱلْمُؤْمِنِينَ وَأَنزَلَ جُنُودًا لَّمْ تَرَوْهَا وَعَذَّبَ ٱلَّذِينَ كَفَرُوا۟ ۚ وَذَٰلِكَ جَزَآءُ ٱلْكَٰفِرِينَ

Paşan Ełła aramî û xoȓagriye xwe ȓijand bi ser pêxember û baweȓdarn, supayekê şand ku ji aliye hûn ne dahatne ditinê, wan kesan jî siza da ku kafir bûn, wisaye tołeye kafiran (Suȓeya Altobe, Ayete 26).

Dibê Ełla bo supayeke ne dîtî ne şênî bo darkirine dagîrkerên Ĥeȓeb, Fars, Tirk û Azerî li Kurdistanê?

فَإِذَا ٱنسَلَخَ ٱلۡأَشۡهُرُ ٱلۡحُرُمُ فَٱقۡتُلُواْ ٱلۡمُشۡرِكِينَ حَيۡثُ وَجَدتُّمُوهُمۡ وَخُذُوهُمۡ وَٱحۡصُرُوهُمۡ وَٱقۡعُدُواْ لَهُمۡ كُلَّ مَرۡصَدٖۚ فَإِن تَابُواْ وَأَقَامُواْ ٱلصَّلَوٰةَ وَءَاتَوُاْ ٱلزَّكَوٰةَ فَخَلُّواْ سَبِيلَهُمۡۚ إِنَّ ٱللَّهَ غَفُورٞ رَّحِيمٞ

Dama heîvên yasaxkraw hatine dawîyê, li her cêyek hûn muşrîkan dî, wan bikujin, bigrin, abluqe û gemaroyan bidan, li hemî heşarge (çeperge) yêk da xwe ji wan bixene çeperê, ca eger tobe kirin, nimêj kirin, zekat dan, îdî ȓêyê ji bo wan weken, bêguman xudê lêbûr û dilovane (Suȓeya Altobe, Ayete 5).

يَٰٓأَيُّهَا ٱلنَّبِيُّ جَٰهِدِ ٱلۡكُفَّارَ وَٱلۡمُنَٰفِقِينَ وَٱغۡلُظۡ عَلَيۡهِمۡۚ وَمَأۡوَىٰهُمۡ جَهَنَّمُۖ وَبِئۡسَ ٱلۡمَصِيرُ

Ey pêxember! Bi kafir û dûȓuyan ȓa cîhadê bike, bi wan ȓa tund û tîjî binwêne (bikar bêne), cêye seknine wan jî dozexe, çend çarenuseke xirape (Suȓeya Altobe, Ayete 73).

يَٰٓأَيُّهَا ٱلَّذِينَ ءَامَنُواْ قَٰتِلُواْ ٱلَّذِينَ يَلُونَكُم مِّنَ ٱلۡكُفَّارِ وَلۡيَجِدُواْ فِيكُمۡ غِلۡظَةٗۚ وَٱعۡلَمُوٓاْ أَنَّ ٱللَّهَ مَعَ ٱلۡمُتَّقِينَ

Ey baweȓmend û îmandaran, wan ciranên bê baweȓ qetił biken, ba tund û tîjî le hembere wan bikar bênin, bizanin bi ȓastî xudê bi parêzkaran ȓaye (Suȓeya Altobe, Ayete 123).

Ji wan ayetên sereve dê xoyanî kirin ku ole îslam ola şer̂ û kuştine, nek ola aştî, bexşiş û diłifreh bûnê.

خُذۡ مِنۡ أَمۡوَٰلِهِمۡ صَدَقَةٗ تُطَهِّرُهُمۡ وَتُزَكِّيهِم بِهَا وَصَلِّ عَلَيۡهِمۡۖ إِنَّ صَلَوٰتَكَ سَكَنٞ لَّهُمۡۗ وَٱللَّهُ سَمِيعٌ عَلِيم

Ji mał û samanên wan sedaqe û xêr wergire, ta ku wisa wan pak û paqij bikeî, duĥa bo wan bike, çimkî duĥaye te aramîye bo wan, xudê bîser û zanaye (Sur̂eya Altobe, Ayete 103).

Pêxember bi wê bihaneyê sermaye ji xełkê standiye, her ji ber wê melayên Kurd jî zekat, berat û ser ça kirinê bo xwe werdagrin.

لَكُمۡ دِينُكُمۡ وَلِيَ دِينِ

Ole we bo we, ole me bo me (Sur̂eya Alkafirun, Ayete 6).

Pir balkeşe ku pêxember di wan damên ku hîz û dastełate wî xûrt bûye, bir̂yare qetił û cîhadê daye, belê dama ku r̂û be şikistê bûye, gotîye ole we bo we, em ole îslamê bi ser we da na sepênîn.

قَدۡ مَكَرَ ٱلَّذِينَ مِن قَبۡلِهِمۡ فَأَتَى ٱللَّهُ بُنۡيَٰنَهُم مِّنَ ٱلۡقَوَاعِدِ فَخَرَّ عَلَيۡهِمُ ٱلسَّقۡفُ مِن فَوۡقِهِمۡ وَأَتَىٰهُمُ ٱلۡعَذَابُ مِنۡ حَيۡثُ لَا يَشۡعُرُونَ

Bi r̂astî wan kesên ku pêş wan bûn, pilan û nexşe kîşandin, serencam xudê mał û xanîyên wan ji binçîne û bineȓet ȓa dar anî, serbanên wan bi ser da tepî û ȓuxa, siza û ĥezab ji aliyek ȓa hat, ku hest pênedakirin (Suȓeya Alneĥil, Ayete 26).

وَإِن مِّن قَرۡيَةٍ إِلَّا نَحۡنُ مُهۡلِكُوهَا قَبۡلَ يَوۡمِ ٱلۡقِيَٰمَةِ أَوۡ مُعَذِّبُوهَا عَذَابًا شَدِيدًاۚ كَانَ ذَٰلِكَ فِي ٱلۡكِتَٰبِ مَسۡطُورًا

Hîç bajar u gundak niye emê di pêş ȓoje pesłan (qyamet)ê da kavil nekeîn, sizayeke tund û piȓ ji hêş nedaîn, ev jî di piȓtûke xudê da hatîye tomar kirin (Suȓeya Alasra, Ayete 58).

وَمَنۡ أَعۡرَضَ عَن ذِكۡرِي فَإِنَّ لَهُۥ مَعِيشَةً ضَنكًا وَنَحۡشُرُهُۥ يَوۡمَ ٱلۡقِيَٰمَةِ أَعۡمَىٰ

Her kesek pişt ji min kir, bêguman jiyan eke teng û dijware wî bibê, di ȓoje pesłan jî da bi korî tê heşruneşir keîn (Suȓeya Te, Ayete 124).

Suȓeyên sereve hemî heȓeşe û tirisn. Ji aliye saîkolojî wireye (xîrete) mirovan dadibezênin ku ser şoȓ û xwe ȓadestkerê wê olê bin. Her ji ber wê musiłmanan hem li dunya û hem ji axiretê pir datirsin. Zêdatir ji 691 car

peîvên tiris, ĥezab, agir, şewtan, heȓeşe û guȓeşe yên Ełła di Quȓan da hatine dûbare kirinê. Pêxember mezintrîn darunnase wê cihanê bûye û bi dûbare kirine gotinên xwe zaniye di karê di mêjîşuştîyê xełkê da serketî bê.

وَقِيلَ لِلَّذِينَ ٱتَّقَوۡاْ مَاذَآ أَنزَلَ رَبُّكُمۡۚ قَالُواْ خَيۡرٗاۗ لِّلَّذِينَ أَحۡسَنُواْ فِى هَٰذِهِ ٱلدُّنۡيَا حَسَنَةٞۚ
وَلَدَارُ ٱلۡأَخِرَةِ خَيۡرٞۚ وَلَنِعۡمَ دَارُ ٱلۡمُتَّقِينَ

Hate gotin ji wan kesan ku ji xudê tiris bûn, perwerdgare we çi şandiye xwarê? Gotin bo wên ku di wê dunyayê da cake û xêrê encam dane, xêr, padaş û çake hatîye dan, bi ȓastî małe pesłan jî baştrîn małe, ay çiqas xoşe małe ji xudê tirsan (Suȓeya Alneĥil, Ayete 30).

جَنَّٰتُ عَدۡنٍ يَدۡخُلُونَهَا تَجۡرِى مِن تَحۡتِهَا ٱلۡأَنۡهَٰرُۖ لَهُمۡ فِيهَا مَا يَشَآءُونَۚ كَذَٰلِكَ يَجۡزِى ٱللَّهُ
ٱلۡمُتَّقِينَ

Bax û baxatên ku cêye wemanên, çendîn çemên di jêr darên wan diherikin, herçî bixwazin ji wê bo wan amadaye, wisa xudê padaşe ji xudê tirsan bida (Suȓeya Alneĥil, Ayete 31).

Van padaşên Ełła zêdatir ji 182 caran di Quȓanê da hatîye dûbare kirin. Ev dûbare kirin bûye binase

serekeye mêjîşuştîye xełkê û di encam da ole îslam r̂oj bi r̂oj fireh bûye.

وَمَن كَانَ فِى هَٰذِهِۦٓ أَعۡمَىٰ فَهُوَ فِى ٱلۡأَخِرَةِ أَعۡمَىٰ وَأَضَلُّ سَبِيلاً

Herkes di wê dunyayê da kûr bê, di paşer̂oj jî da kûr û zêdatir r̂ê lêwine (Sur̂eya Alasra, Ayete 72).

Xudê xwe kûr drust kiriye, çewa dibê bi şkandin û bêr̂êzî yê base wî bika? Xudê dibê pir ji wê mezintir bê ku sukayetî bi drustkraweke xwe bika? Gelo ev darnaxa ku Qur̂an hełbestrawe mirove?

يَٰٓأَيُّهَا ٱلنَّبِىُّ إِنَّآ أَحۡلَلۡنَا لَكَ أَزۡوَٰجَكَ ٱلَّٰتِىٓ ءَاتَيۡتَ أُجُورَهُنَّ وَمَا مَلَكَتۡ يَمِينُكَ مِمَّآ أَفَآءَ ٱللَّهُ عَلَيۡكَ وَبَنَاتِ عَمِّكَ وَبَنَاتِ عَمَّٰتِكَ وَبَنَاتِ خَالِكَ وَبَنَاتِ خَٰلَٰتِكَ ٱلَّٰتِى هَاجَرۡنَ مَعَكَ وَٱمۡرَأَةً مُّؤۡمِنَةً إِن وَهَبَتۡ نَفۡسَهَا لِلنَّبِىِّ إِنۡ أَرَادَ ٱلنَّبِىُّ أَن يَسۡتَنكِحَهَا خَالِصَةً لَّكَ مِن دُونِ ٱلۡمُؤۡمِنِينَۗ قَدۡ عَلِمۡنَا مَا فَرَضۡنَا عَلَيۡهِمۡ فِىٓ أَزۡوَٰجِهِمۡ وَمَا مَلَكَتۡ أَيۡمَٰنُهُمۡ لِكَيۡلَا يَكُونَ عَلَيۡكَ حَرَجٌ وَكَانَ ٱللَّهُ غَفُورًا رَّحِيمًا

Ey pêxember, bêguman em wan jinan ku te mareiyên wan daye, bo te hełal kir, wan kenîzan jî ku di ceng (şer̂) da Ełła kiriye bi nisîbe te, kiçên ap, xał, pur û ên ku bi te r̂a penaber bûne, her jineke musiłman jî eger xwe pêşkeş bi pêxember kir, eger pêxember jî hez kir, ew

hemî taybete tene nek musiłmanan, bêguman em baş dizanîn çî ji ser jinan û kenîzeyan pêwist kiriye ta girift neyête r̂êye te, xudê jî herdam lêbûr û diłovane (Sur̂eya Alahzab, Ayete 50).

Dibê Ełła çima azadî bi pêxember dabê ku bi keîfe xwe jinan bênê û tenanet bi keîfe xwe bi kenîzan r̂a r̂abwêrê (sekis bike)? Kes ji musiłmanan mafe hełbijartine kenîzeyan ne bûye ta pêxember hez lê kiribin? Gelo hebûne dahan jin û kenîze bo xoşr̂abwardinê kareke mirovîye? Gelo ew ayete ne bese bo wan musiłmanan ku hîn bibin ku bi r̂astî îslam tê wateye teslîm bûnê li hembere xwastên taîbetîye pêximber û bi gişitî stoxwar kirine li hemeber çanda neteweye Ĥer̂eb? Gelo ji wê ayetê têgeîştin pir zehmete?

هُوَ ٱلَّذِى يُحۡىِۦ وَيُمِيتُۖ فَإِذَا قَضَىٰٓ أَمۡرًا فَإِنَّمَا يَقُولُ لَهُۥ كُن فَيَكُونُ

Here ewe ku dubare zîndî dika û dimirênê, damê xwast ji ser karek bû, tenê dibêjê bibe, ew jî dibê (Sur̂eya Ĥafir, Ayete 68).

Dibê kengê Ełła xwast ji wê bê ku bêjê dagîrkerên Kurdistanê; Fars, Azerî, Tirk û Ĥeȓeb li Kurdistanê darkevin û îdî bese qetił û dagîrkarî? Anjî bêjê mamostayên olî, ȓastiyan bi gelê Kurd ȓa bêjin, egîna xwaste min jî ji ser we tê guhaȓîn û di qyametê da sizayeke tund û tîj bo we dibê?

ٱتۡلُ مَآ أُوحِىَ إِلَيۡكَ مِنَ ٱلۡكِتَٰبِ وَأَقِمِ ٱلصَّلَوٰةَۖ إِنَّ ٱلصَّلَوٰةَ تَنۡهَىٰ عَنِ ٱلۡفَحۡشَآءِ وَٱلۡمُنكَرِۗ
وَلَذِكۡرُ ٱللَّهِ أَكۡبَرُۗ وَٱللَّهُ يَعۡلَمُ مَا تَصۡنَعُونَ

Her çî bo te hetiye şandin di pertukê da bixwêne, nimêjan jî bike, bi ȓastî nimêj bergirî dika ji karên xerap, yadê Ełła jî mezine, Ełła jî dizanê çî diken (Suȓeya Alĥenkebût, Ayete 45).

Hezrete Ĥumer, îmam Xumeînî, Ĥelî Xamneî, Seddam Ĥusên, Beşar Esed û Teyb Erduxan hemî nimêjkerin, gelo çima dibê nimêjên wan pêş bi wan negritibin ji kavil karî û qetił kirine xełkê bêtawane Kurdistanê? Gelo nimêj kirin nabête binase mêjîşuştîye xełkên Kurdistanê ku hem hevdû bikujin û hem jî çav binuqênin (bigirin) ji diȓendaî (weĥşigerî)ye dagîrkerên Ĥeȓeb,Tirk, Azerî û Farsên musiłman li Kurdistanê?

أَمَّا ٱلَّذِينَ ءَامَنُواْ وَعَمِلُواْ ٱلصَّٰلِحَٰتِ فَلَهُمۡ جَنَّٰتُ ٱلۡمَأۡوَىٰ نُزُلَۢا بِمَا كَانُواْ يَعۡمَلُونَ

Bełê wên baweȓ û îman anîne û kirdaweyên baş encam dane, ji ber wan karên ku kirine, bax û baxatê wan hene ku cêye ȓasteqîne û mîvandariyane (Suȓeya Alsucda, Ayete 19).

Gelo hîç ȓewaye hezrete Ĥumer, Xumeînî, Seddam, Erduxan û hemî alîgrên wan li biheştê di nav bax û baxatan da bin û di dam ȓubar şeȓab û hengvîn, bi dayan Ĥorî mîwandarye wan biken, bełê dah hezar kinîzeyên Kurdî ȓifêndraw û sedan hezar Kurdên qetiłkirî bi daste hezrete Ĥumer, 182 hezar Kurdên enfal kirî, dah hezar Kurdên kujrawe cîhada îmam Xumeînî, Kurdên kujrawe bi fermane Mistefa Kemał Paşa ta Teyb Erduxan, di dozex da bişewtên, çimkî Kurd û azadîxwaz bûn, nek ser şoȓ û dagîrkerperist?

أَوَلَمۡ يَهۡدِ لَهُمۡ كَمۡ أَهۡلَكۡنَا مِن قَبۡلِهِم مِّنَ ٱلۡقُرُونِ يَمۡشُونَ فِي مَسَٰكِنِهِمۡۚ إِنَّ فِي ذَٰلِكَ لَأٓيَٰتٍۚ أَفَلَا يَسۡمَعُونَ

Gelo ji bo wan darneketiye ku çendîn gel me pêş wan qiȓ kir, ku di małên xwe da li cimucoł (tevger) da bûn, bi ȓastî

di wer da çendîn nîşane û bełge hen, gelo bo nabîsn?
(Sur̂eya Alsicd, Ayete 26).

Gelo bo xudê pişt kiriye xełkê Kurd, dibê kengê neteweyên Azerî, Tirk, Fars û Ĥer̂eb li Kurdistanê di małên xwe da qir̂ka? Çima Ełła wê lava ya 42 milon Kurdan na bîsî?



Hezrete Miĥemmed (druda xudê jê bê) di sała 570ye zaînî li bajare Mekke hate dinê. Di sała 610 di eşkevte Ĥîra ku sê kîlomîtir ji Mekkeyê dure, Ełła bi r̂êye Cubr̂aîlê Qur̂an bo wî şand. Di sała 622 li Mekke r̂a penabere bajare Medîne bû û di wê damê da pir alîgir peîda kir û

paşan di sała 642 li êrişêk da bajare Mekkeyê girte bin fermanȓewaîya xwe. Wate pêxember li hemî jiyane xwe da tenê karî beşek ji şêniyên bajare Mekke û Medîne bika musiłman. Ĥezrete Miĥemmed (druda xudê jê bê) neh jine wî bi fermî hebûn. Bi Ĥaîşeye kiçê Ĥumer û Selmeye kiçê Ebûbekir hawjînî kir (zewci bû). Fatimeye kiçê xwe da bû ĥezrete Ĥelî û Sumeye ye kiçê xwe da bû bi ĥezrete Ĥusman. Wate her ew małbat jî bûne xelîfeyên îslamê. Xelîfeyên îslamê jî ser dastełat û têgeîştin ji îslamê nakok bûn.Tenanet ĥezrete Ĥaîşe (xudê lê ȓazî bê) li nizîk medîne bi sware ĥuştirê bi ĥezrete Ĥelî (xudê lê ȓazî bê) şeȓ kir ku bi şeȓe Cemel (Ĥuştir) hatîye nasîn. Pêxembere îslamê di sała 632 di temene 63 sałan ço ser dilovaniye xwe û çendîn jin û kenîze paş xwe cê hêşt.

Peîdabûne ole îslamê li Kurdistanê wedageȓê bo sedaye heftem wate sałên 634 ta 644e zaînî. Di wê damê da ĥezrete Ĥumer (xudê lê ȓazî bê) bi nave bîr û baweȓe îslamê hêriş kire Kurdistanê û bi supaye Ĥeȓeb got ey musiłmanan êriş berne ser kafiran (Kurdan û zerdaştiyan) û di ȓêye Ełła da wan bikujn, samane wan jî

bitałan berin, jin û kiçên wan bo xwe bi koîleye sêksî (kenîze) bigrin."

Wisa bi bihaneye ole îslamê, Ĥeȓeban êrişe ser Kurdistanê kir. Di akam da ta karîn Kurdan kuştin û welate wan jî xapur kirin. Kurdan ole zerdaştî hebû û baweȓmend bi xudê bûn bełê hezrete Ĥumer (xudê lê ȓazî bêt) xudê bifermî nas ne dakir û digot hîç xudêyek niye, tenê Ełła nebê (la îlahe îleła).

Ĥeȓeban bo dasepandine çanda Ĥeȓeb û ĥelandine çanda Kurdî, mêrên Kurdan kuştin û zarokan bi zorî hîne nimêj û ȓojîye Ĥeȓebî kirin. Esĥabeyên îslamê kiçên Kurdan bi ȓewa (ĥełał) dizanîn û bi zor dastdrêjîye sêksîye wan dikirin. Di akame wê sukayetî û bêȓewiştîyê da dah hezar kiçên genc ji małbatên wan standin û birne Ĥicazê. Hezrete Ĥumer (xudê lê ȓazîbê) 113 kiçan ji wan Kurdan kire koîleye sêksîye xwe (kenîze).

Dyare gelê Kurdistanê bi xoşîye xwe ne bû ku ole îslamê pesend kir, belkî bi zebre şimşîr û xwênȓiştinan bû.

Ĥeȓeban bo betałan birine saman Kurdistanê êriş kirne Kurdistanê û xełkê bêtawan komełkuj kirin. Kujrawan kirne sedan çałên mezin û li hinek daveran kełeke gawiran li ser wan çê kirin. Hezaran Kurd bi birîndarî

girtin û kuştin. Wan Kurdên ku li hember şimşêre Ĥeȓeban da ȓadest ne bûn, ta navqed di axê girtin û li pêş çave małbatên wan kevirbaran kirin.

Şûneware hovyetîye Ĥeȓban hinjî li Kurdistanê maye. Di jêr wan kełeken gawran da terme bi hezaran Kurdên wełatparêz û şoȓeşger hen ke amada ne bûne ku ser bo dagîrkerên Ĥeȓeb bitawênin.
Gawir ew Kurdên şoȓeşgere Kurdistanê bûne ku dijî dagîrkere Ĥeȓbe musiłman şeȓ kirin û di ȓêye azadîyê da gyanye xwe bexit kirn.
Ji ser goȓe esĥabeyên Ĥeȓeb ku li şeȓe dagîr kirine Kurdistanê d hatIne kujtin, şał hełdane û bi zorî kirine pîrozge (merqed). Di ȓastî da esĥabe dujminên Kurdan bûne û xwêne neteweye Kurd, li ser axe Kurdistanê ȓiştine.
Hêjayê zanînê ye ku yêk ji sedame bêçareya neteweya Kurd ku wek pêwîste pêş ne ketiye û wek gelên dinê cîhanê ne bûye xodan nasname û kyane serbexwe, ewe ku Ĥeȓeban ji serdame ĥezrete Ĥumer (xudê lê ȓazî bê) gelê Kurd bi ser çendin şêx û serok xêłan da dabeş kirine ku niha jî di sedaye bîst û yêkê da Kurd ji dast wê

paşketinê dinałênin. Supaye Ĥeȓeb bo çend sałan li Kurdistanê ma ta ku bingehe xwe wekir. Ĥeȓeban bi zorî sîxuȓan bo xwe li nav Kurdistanê peîda kirin û nav nan seîda ewlada pêxember (kake kuȓê peyamnêr), şêx (pîr), darwêş (nedar) û sofî (ȓadest bû). Şêx û seîdan tene bo Ĥeȓeban kar dikirin û hemî samane Kurdistanê top dakirin û di daste Ĥeȓeban dikirin. Egerçî îȓo piȓaniye xełkên Kurdistanê hatine mêjîşor kirin û ȓastiye wan ȓudawane nizanin û bûnete musiłman, bełê hin jî piraniye daraîye Kurdistanê nadrête Kurdan û berhemên Kurdistanê bo dagîrkerane.

Dagîrkerên Kurdistanê herdam ji nave ole îslamê kełik wergirtine, Kurdan xapandine û karîne bi ser wan da zał bin, daraye Kurdistanê jî bîdizin û bo xwe biben. Her boye Ĥeȓeb, Tirk û Fars ji aliyek ne hêştine Kurd dîroke xwe bi drustî fêr bibin û ji aliye din ji ne hêştine Kurd yêkgirtî bin û berjewendiye neteweye xwe bi zanin. Dagîrkeran piraniye gelê Kurd wisa di daryaye ol da gêj kirine û daxwaze gelê Kurd ew qas nizim kirne ku Kurd ji hemî tiştekê zêdatir bi kêşeye ole îslamê sergerim bin û wîste dinê wan ne bê. Kurdistan eger di aştî da bê, ewe

biheşte ser cîhane ye, bełê îr̂o qazanc û xoşiye wê bo dagîrkerane. Beşe piraniye gelê Kurd jî, ole îslam û serdanewandin bi hêviye biheştêke na dyare.


Di nav ole îslamê da wan bîrur̂ayên cor bi corên jêrî hen ku her yêk ji wan xwe ji wê din baştire dizanin û hevdû pesend naken: Şafiĥî, Ĥenefî, Ĥenbełî, Malikî, R̂êbaze Qadrî, R̂êbaze Neqişbendî, R̂êbaze R̂efaĥî, Bektaşî, Ĥelî îlahî, Şebek, Qelem Ĥacî, Bewerî, Feîlî, Ĥelewî û Esna Ĥeşerî.

### 4-6. Ole Êzîdî

Ole êzîdî yêk ji olên dinê gelê Kurdistanê ye ku ji aliye Adi kuȓê Musafir di seda ya 12 zaînî hatîye nasandin. Êzîdî bi zimane Kurdî xudê peristiyê diken û baweȓmendin ku xudê ye wan jî bi Kurdî diaxvî. Êzîdî xwe bi beşek ji ole zerdaştî dizanin û ole xwe bi hinek gohertinan, bi nave êzîdî ji êriş û komełkujiye musiłmanan parastine. Egerçî di kirdawe da pir peîv û çandên Îslamê bikar tênin.

Êzîdî baweȓmend bi yêk xudêne bi nave Yezdan û wî bi drust kere gerdun (cihan) û heft firişte û adamê dizanin. Mezine firişteyan "Meleke Taws"e. Êzîdî baweȓmendin ku paş mirinê gyan ji aliye heft parêzeran ȓa tê dadgehî kirin.

Wan kesên ku şeȓe wan ji xêr zêda tire, dakene tarîkî yê. Wên ku xêr û şeȓe wan yeksane, dakene zînexê ku têda xoşî û naxoşiyê dibînin. Wên ku xêre wan jî zêdatire dakene biheşt (cennet)ê.



R̂ugeye êzîdîyan Lalişe ku li nizîk bajare Musiłe başurê Kurdistanê ye. Êzîdî di yêkem r̂oje heîve R̂ezber (Oktobir) li Lalişê zyarete gor̂e pîr Ĥuda (Adî) diken.

## 4-7. Ole Yarî

"Pîr Binyamîn Şahoyî" wek drust kere ole yarî (yarsa) tê nasîn, bełê "Sułtan Sehak Berzencî" di sała 1250 zaînî ole yarî řagehand.
Piřtûke ole yarsa bi nave Dafter (Daftere Pirdiurî)e ku bi Dîwane Gewre (Mezin) yan "Daftere Serencam" jî nav diben. Di wê dafterê da gotinên "Bihlul" û "Paşa Xoşîn Luřistanî" tê da hatine nivîsandin. Çend dafterên dinjî wek "Daftere Îlbege Caf" ji sedaye pazda, "Daftere Xan Îlmas" û "Daftere Pîr Emîr" û "Daftere Brake Goran" di sedaye hejdaye zaînî da hatine nivîsandin. "Sawe" û "Goran" dafterên here nûyên ole yarsanin.
Ji gor ole yarsa xudê ji xawenkaran (xudêkaran)ên wek "Îbřahim, Zerdaşt, Sułtan Sehak, Pîr Musa, Dawd Dudanî, Baba Yadgar, Daye Ȓemizbar" û zanayên wek "Keîxusrew, Kaweî Asinger, Eflatun, Suqřat, Hafiz, Bihlul Mahî, Baba Serheng Dudanî, Baba Naws Caf, Baba Cîl, Pîr Şaho" xwe gehandiye mirovan.
Yarsayî dû řûgehên wan hen. Yêkem řûgehe darunî ye bi nave "Dastgah Xwawendigarî" (Cem)e û Dûhem jî "Piřdiûr"e ku nizîk gundê Pîran(Şêxan)e Hewramane

r̂ojhełate Kurdistanê ye. Gor̂e Sułtan Sehak û hinek ji zanayên yarsayî li wirin.

Yarsayî bawer̂men bi biheşt û cihendam (dozex)ê nîne belkî di ole yarî da, kirdaweyên mirov ji aliye "Pîr Musa" r̂a tên nivîsandin û mirov ji gor̂ aste baş anjî xirap bûne wan, di mirov anjî ajeł (ĥeîvan)ên din da dûbare ji daîk dibin.

Hêjayê gotinê ye ku r̂êbazên wek Ĥeqqe û Kakeyî ji ber nizîk bûne wan, bi beşek ji peîr̂ewên ole yarsa têne nasîn.

**Beşe Pêncem**

## 5- Sedamên pêşneketine civake Kurdawarî

Kurdistan welateke hatîye dagîr kirin û dagîrkeran furset bi gelê Kurd ne dane ku xwe pêşbixa û wek neteweyên din bi awayeke pêşketîxazane alîgirî ji nasname û bûne xwe bika.
Civake Kurdawarî hemî r̂êyên pêşketinan lê hatine girtin, her boye li bwarên abûrî, teknîkî, r̂amyarî, felsefî, çandî û civakî wek pêwîst pêş ne ketiye.

Dagîrkerên Kurdistanê bo gehîştin bi berjewendî yên abûrî bi pilaneke havbeş û tokmekirî (dar̂êştî) xwe bi ser xełkê Kurdistanê da. Her Kurdak berxwe dabê ku sepandine xwe anjî civake Kurdawarî pêş bixa, ji aliye neyarên koneperist û dagîrkerê Kurdistanê bi şêwaze durxistin, zîndanî kirin, bêseruşwên kirin û kuştinê r̂a hatîye serkut kirin.
Wisa ne hêştine Kurd biga ar̂manc û wek gelên dinê cîhanê di pêşketin û şaristaniyetê da bijî.

Dagîrkerên Kurdistanê bûne sedame nexwêndiwarî, nizanî, fereh bûne çanda xêłekî, drust bûne ȓêxistin, hêzên zordar û kesayetî yên berjewendîxwaz di nav civake Kurdawarî da.

Kurdistan ta çar parçe bê, ȓêxistin jî ji aliye ȓamyarî û berjewendî yên xwe dahan parçe bin, îdî civate Kurdawarî her wisa di paşvemayî yê û jêrdastî yê da wedamênê.

Kurdistan damek pêş dikevê ku hemî ȓêxitin bi kirdawe bo bi dast anîne nasname ya neteweyî û damezrandine civakeke dadperwer û yeksanîxwaz têbikoşin.

Hêjayê gotinê ye ku gelê Kurd çend darfetên dîrokî bo hatîye pêş ku biga aȓmancên xwe, bełê her car çend giriftên ȓojevê bûne asteng. Wan faktên jêrî bûne sedame sereke ku Kurd nikarin qasî ku pêwîste ji darfetên dîrokî kelk bigrin:

1- Nebûne řêxistineke neteweyî ku bikarê dinav Kurdistan û di aste cîhanê da nwênerayetîye gelê Kurdistanê bika.
Ev řêxistin dibê taîbetmendî û twanaye yêkxistine gelê Kurdistanê hebê. Bo nasandin û cêxistine nasname ya Kurdistanê di nav xwe û di aste cîhanê da têbikoşê. Ta îřo li Kurdistanê wisa damezraweyeke xodan karêzmaye mezin nebûye.

Di sała 1999 Kongreya Neteweî ya Kurdistanê li Bruksêlê hate damezrandin û manîfêste neteweyî li gore řojevê gełałe (organize) kir. KNK xebateke pêwist řekxistîye û hêjaye kar bo geşestandine wê bête kirin.

Pêwîste Kurdistanyan û řêxistinyên Kurdistanê piştgîrî ya řêxistineke nîştmanperwer biken ku di qeîran (kirizan) da, bikarê erkên neteweyî ya xwe çalakane biřêve bibe. Piştgîrî ya hemî alîyên nîştmanperwer ji damezraweyeke neteweyî dibê sedam xûrt bûne doze Kurd di aste nawneteweyî da. Çimkî ev řêxistine neteweî ye dikarê bi yêk bername û sitratijî bo çareserîyê kar û xebatê bika.

2- Ne bûne yêketîye neteweyî ya Kurd anjî ne bûne aştî di nav r̂êxistinyên Kurdistanê.

Bi sedame parçe bûne gelê Kurd û dabeşkirine Kurdistanê bi ser çar dagîrkerên hovî, ta niha yêkyetîyeke bi hêze neteweî ya Kurd pêk nehatî ye ku bersiva nasname û kesayetîya netewe ya Kurd bê. Her ev parçe bûn jî bûye sedame drustbûne r̂êxistinên cor bi core Kurdistanî ku hinek ji wan tenê bo geîştina bi berjewendî ya şexsî û małbatî nave Kurdistanê kirdne ser xwe. Beşek ji wan r̂êxistinên berjewendîxazên Kurd, netenê li çaresere doze Kurd da r̂ołeke erênîye wan ne bûye, belkî bûne asteng û kêşeye kêşe û şer̂ên navxo. Tenanet li dijî r̂êxistinên dinê Kurdistanê alîkarî ya dagîrkerên Kurdistanê diken.

3- R̂amyarîye berteske r̂êxistinî û şexsî di nav hinek r̂êxistinên Kurdistanê.

Hebûne sinure dastkirda dagîrkeran di nav çar parçeyên Kurdistanê û şer̂e dastełatdarên dagîrkerên Kurdistanê bihev û bi gelê Kurd r̂a, bûye sedame drustbûne r̂êxistinên cor bi cor li Kurdistanê. Hinek ji wan r̂êxistinane tenê bi fikre bejewendî ya şexsîn û bi

nave Kurdayetî bazirganîyê diken. Wan r̂êxistinane netenê kêşe ya Kurd çareser naken, belkî bi sedame alîkarî û grêdrav bûn bi dagîrkeran, bûne binase sereke ya ałoztirbûne doze Kurd û na aramî ya Kurdistanê. R̂amyarîye wan r̂êxistinan na ga serkevtinê û pêwîste serkirdaye wan, pêşe r̂oje xwe baştir bimêzin û bizanin doze neteweyî wisa her paş dikevê û di akamda hemî gelê Kurdistanê zerermend bibê. Eger qazance aliyek jî têdabê, wê damî bê û di dimahikê da ew alî jî zerermend bibê.

Her wek di dîroke gelê Kurd da nebûne r̂amyaryeke druste hinek r̂êxistinên Kurd di ast doze Kurdistanê da bûne sedame bêhêzbûn û têkçune wan r̂êxistinan. Erke dîrokî û berpirsyaretî ya her endameke wan r̂êxistinane ku bi drustî ji çareserîya kêşe ya Kurd bifikrin û kar li pênav berjewendî û bihayên neteweî ya gelê Kurdistanê biken. Dibê gelê Kurdistanê ji berjewendî yên r̂êxistinî û şexsî durî biken. Pêwîste ku her Kurdistanîyek, damek berjewendî ya neteweyî di metrisî da dî, rênwênî ya serkirda ya xwe bika anjî alîgire r̂amyarî ya şaşe wan neka. Bitaîbet r̂amyarîyên

ku bibe sedame şeȓe brakujî, biher navek anjî bihaneyek bê, nayete pesend kirin. Erke her welatparêzeke ku di beşdarî kirin anjî piştgîrî kirine pilanên Kurdistanî kujî, xwe dur bike.

Hêjayê gotinê ye ku şeȓe navxwe di berjewendî ya Kurdan da niye, çimkî ji aliyek dagîrkeran kelk (sûd)e ȓamyarî ya xwe jê dagrin û ji aliyek dibê pałpişte bidîhatine berjewendî ya biçukên şexsî, małbatî û ȓêxistinî. Di dumahîyê da serkirda yên ȓêxistinên şeȓker bibê zerermend bibin anjî kesek ji małbate wan bête kujran û paş bikujdane hezaran Kurd bi daste yêktir, bo xwe aştîyê diken. Bo mînak binêre wan şeȓane:

- PDK û YNK ku di çendîn şeȓên brakujî da bi hezaran Kurd têda kuştin, bełê paşan Barzanî û Tałebanî aştî kirine û hîç yêk zerermend nebûne, belkî bi wan şeȓên brakujî bazirganî yê kirne û hejmare (ĥisab) bankên xwe tijî kirn ji draw (pare) yên Îran, Tikiye û Iȓaqê.

- Şeȓê brakujî ye Komełeî Zehmetkêşane Îranê û Ĥîzbe Dêmukȓate Kurdistane Îranê ku bi hezaran kes têda

hatne kujtin, bełê hîç zererek bi małbatên Duktor Ĥebduȓehman Qasimlu, Ĥebduła Muhtedî, Braîm Ĥelîzada û Mensur Ĥikmet neket.

- Herweha di şeȓên ĤDKI û ĤDKI-Şoȓeşgêȓ da, małbatên Ĥebdułła Hesenzada û Celîl Gadanî pê dawłemendtir bûn û ji xwe geyandine Ewrupa yê û dabîn kirine asayş bo zarokên xwe ȓikeberekî di kirin. Di heman damê da bi sedan lawên Kurd bi dastên yêktir bi kuşt dan û paş çendin sałan aştî kirin.

- Şeȓe kêrên navbere ĤDKI bi ȓêberayetî ya Mistefa Hîcrî û ĤDK bi ȓêberayetî ya Ĥebdułła Hesenzada ku tê da bûye duberekî ya nav gelê ȓojhelate Kurdistanê, bełê wan serkirdane kasbî jê diken. Haw dam bi çewaşe karîyên xwe mêjîşuştî ya civakê diken û bo ziȓandine nasnave xwe, yêk piştî yêkê jiyan-name û beserhatên piȓ ji xeyanetên xwe bi drust bi ser civake Kurdistanê da disepênin.

4- Cê û ȓêye stratijîye Kurdistanê û neteweye Kurd ku di nav sê neteweyên paşmahî hełketîye û her yêke ji

wan netewane bi drêjaîye dîrokê nikołî (ĥaşatî) ji hebûnê neteweye Kurd kiriye.
Sê netewey Tirk, Ĥeȓeb û Fars bi drêjaîye dîrokê ji ser wê ku kîjan axe Kurdistanê zêdatir dagîr bika, şeȓ kirine û wisa Kurdistanê kirne meîdane şeȓ û milimilaneye xwe. Ji aliyeke din bi drêjaîye dîrokê wan şeȓ bi Kurdan frotine û bi komełkujyên hovîyane, koke dujminayetîyê di Kurdistanê û herêmê da çandine.

Sedame wîjî wedageȓê ser wê ku di dîrokê da dastełatdarên Îran, Iȓaq, Tirkiye û Suriye azadîxwaz û pêşketîxwaz ne bûne. Belkî dastełatdarên berjewendîxwaz û dîktatoȓ bûne ku tamezroye şeȓ û ajawe û xwên ȓiştinê kirne.
Ji aliyeke din neteweyên dagîrkere Kurdistanê pir zu hest be dawldimend bûne axe Kurdistanê kirne. Ji ber wê her yêk hewił dane ku beşeke zêdatir ji wê axê dagîr biken. Çimkî her yêk ji wan dagîrkerane zanîne çi qas axe Kurdistane wan hebê, ew qas jî, ji ȓikeberê din bihêztir dibin. Wan sê netewane nikołî ji bûne Kurd û axe Kurdistanê kirne û sermaye ya wî jî bo xwe dizîne. Ev ȓamyare çewte dagirkeran bûye sedame

pêşneketine neteweyê xwe jî. Çimkî herdam bangewaze şeȓ kirne û neteweyên xwe bo şeȓxwazî û mirovkujî perwerda kirne. Eger neteweyên dinê cîhanê dixwazîn ȓaman pêşketin, teknolojî û zanistê di nav xwe da bihêztir biken, neteweyên Tirk, Ĥeȓeb û Fars tenê ȓaman çek, şeȓ û xwênȓiştinê diken. Ji wê jî xeraptir her wê ȓaman namirovane jî hîne zarok û nevşên pêşeȓojê diken.

Wan netewane pêwîste ku tenanet bo pêşketine xwe, aştî û aȓamîyê di herêmê da pêk bênin. Çimkî ne bûne aştî dibête sedame paşketine wan netewan û hełbiȓane ji cîhane teknolojî û pêşketîye iȓo. Ji aliyekî din xełkên herêmê û tenanet beȓêwberên dastełatan jî saîkolojyeke aramtir û jiyaneke xoştire wan di aştiyê da dibê ta di şeȓ da. Şeȓ bûye binase małwêranîye herêmê û aştî jî bibê sedame aramî û pêşketine çandî û zanistîye neteweyên herêmê.

Di misoger kirine aştîyê da, gelên Tirk, Ĥeȓeb û Fars dikarin di nav gelên dinê cîhanê da şanazî bi azadîxwaz û pêşketîxwaz bûne xwe biken. Dikarin

bibne xodan tazetrîn teknolojî ya zanistî bo xizmet bi xwe û bi gelên dinê cîhan.

Bo geîştin bi wê pêşketin û aramîyê, pêwîste dastełatên herêmê, mirovdost û adaziwaz bin. Ji bo wê ku kêşeya herêmê bi aştî û dyalogê çareser bibê, dibê hengavên aştîxwazane bêne hawîştin û darên dyalogê bi Kurdan ȓa bên wekirin. Eger kêşeya nasname ya hemî gelanên herêmê çareser bibê û darfet bo azadî û wekhevîyê drust bibê, aştî û pêşketinxwazî di herêmê da seqamgîr (maînda) bibê. Ew aştîye bibê şanazîya hemî gelên ȓojhełate naveȓast û bihêz bûnê di nav gelên dinê cîhanê. Ew dam gelên dinê cîhanê jî hîsabeke baştir ji ser gelên ȓojhełate naveȓast biken û bi çavên ȓêzê wan bibînin.

5- Hełeyên ȓamyarî ya ȓêxistînên Kurdistanê û dûbare kirine wan.
Hinek ji ȓexistinên Kurdistanî ew qas serbixwe nîn ku li pênave aştî bo Kurdistanê, hengaveke biwêrane bavêjin. Wate fedakar nînye û ȓamyareke drust ji hember doze Kurdan nadan bikar anîn. Tenê bîr ji

dastełat û ji ser kar bûne û behêztir bûne xwe diken. Di wê pênavê da amadan dast bo her kareke namirovane û bê pȓinsîpe ȓamyarî berin û tenanet bo hełgîrsane şeȓê xuşk û birakujîyê dast pêşxer bin. Bo mînak PDK, YNK, ĤDKI, PDKT, PDKS, ĤDK, PSK, hemî Komełyên Komenîst û Îslamî yên Kurdistanê.

Pêwîste di hengave yêkem da serkirda yên wan ȓêxistinan baş bizanin ku Kurdistan małe hemî Kurdistanîyane, tenê axe tapokrawe çend małbatan û ȓêxistinan niye ky wê bîkene goȓepane berjewendî ya teske takekesî û ȓêxistinya xwe. Ev ȓêxistinane şaşin û pêwîste ku bi zuyî xwe ji wê ȓamyarîya nadrust dûr bigrin û xwe serȓast biken. Dibê bi drustî bîr ji çareserî ya kêşeya Kurd weken û biwêrane û aştîxwazane bo çareserî yan gav bawêjin.

Erke wełatparêzîya hemî ȓexistineke ȓamyarîye ku berjewendî ya neteweyî ji serê bejwendîyên ȓêxistine xwe bibînê û bi hemî hêze xwe bo seqamgîr kirne aştî ya navxwe û çareserî ya kêşeya Kurd karbika. Çimkî berjewendiyên ȓêxistinî, berjewendî ya damîn, bełe

berjewendîyên neteweyî herdamîn û dibne şanazî ya dîrokî ya gelê Kurdistanê.

6- Kêm bûne heste neteweyî û namobûne (ni nasîne) nasname ya Kurdistanê bam Kurdistanîyan.
Yêk ji sedamên danemezrane dastełateke Kurdistanî û kêşeyên takên Kurd eve ku heste neteweyî bêhêze û bam hinek ji Kurdan şerme bêjin ku em Kurdistanîn. Piranîye neteweyên cîhanê serbexwene, bi welat û netewe ya xwe şanazin (serberzin). Ji her darê anjî her welatê da bijîn, serberzane piştgîrî ya netewe ya xwe diken. Hinek neteweyê biçuk jî hen egerçî welate wan nîne bełê bi nave netewe ya xwe serberzin û ji ser kêşe û giriftên neteweyî yêkgirtîn.

Di dîroke kevîn û tenanet di serdame cîhanî-bûn (globalîzm)ê da, gelên ku hestên neteweî ya xwe zor berz ȓagirtine, karîne serbexwe bûne xwe bi dast bixen û di nav netewe yên din da xodan nasname bin.

Hêjayê gotinê ye ku hemî kêşe yên civakî tenî bi beriz bûne hestên neteweyî nayete çareser kirin, bełê

pêwîste her endameke civakê, navneteweyî jî bifikrî û heste hawpiştî û yeksanîxwazî ya wî hebê. Her wisa ji mafên hemî mirovan r̂a r̂êzdar bê.
Bo çareserî ya kêşeyên her neteweyêk, pêwîste yêkyetî kirdarî ya wê netewe yê pêk bê. Ta heste neteweyî berz nebê, ev netew nikarê yêkyetî ya xwe çê bika û biga aste bi netewe bûnê. Bo mînak Suêdî, Japonî, Înglîsî  û... Her hemî serberzin bi netewe, ała, ax û zimane xwe. Ji her takeke wan bête pirsîn, bi şanazî dibêjin ku ser bi kijan netewe û welatin. Bełê heste hinek ji Kurdan ewqas nizme ku şerm bi Kurdistanî bûne xwe diken. Pir̂anîye Kurdan çi li Kurdistanê û çi li tarawge (her dareke dine cihanê), xwe bi netewe yên din wek Tirkî, Îranî, Ir̂aqî û Surî dinasênin û şanazî jî bi wan navên dagîrkeran diken. Ev karesate, nexoşyeke darunîye. Binasê wê jî wedazevrê ku netewe yên dinê cîhanê bo xwe, xwe hîn kirne ku kîn û dibê kî bibin. Her ji zarokî r̂a heste neteweyî bûye binase şanazîyê û ev hest xurtir bûye û bûye nasname ya wan gelan. Bełê Kurd bi drêjaîya dîrokê her koîle û jêrdat bûye. Dujminên gelê Kurd baş hîsab bo Kurdan kirine û wan ji gore wîste xwe perwerda kirne. Mêj û hoşe wan

têkdane û ji ast nasname ya xwe da, Kurdan for̂mat (betał) kirne.
Kurdistan herdam ji çar aliyan bûye ar̂mance êrişe tałanker û dagîrkeran. Êrişe here mezin bo ser zarokên Kurd bûye ku ji zarokî ya xwe r̂a ji Kurd bûne xwe nikolî (ĥaştî) biken û tenanet xwe nenasin û dijî Kurd bûn jî darkevîn. Wisa bi fêrkirne peîvên ez Îranîm, Ir̂aqîm, ji Suriye anjî Tirkiyem, mêjîye Kurdan şûştine. Ev bişivandin û paktav kirine neteweyî (asîmlasîyon) ew qas karîgerî xistîya ser Kurdan ku bi mezinî jî nasname ya xwe nas naken û şanazî bi nasname ya dagîrkeran diken. Tenanet di nav cihanê û Ewrupa yê da, Kurd bi wan zîhnêyete şaş zarokên xwe perwerda diken û bi îdîolojî û nasname ya dagîrkeran xwe bi cîhanê dinasênin.
Her ji darsên xwêndingeh û marşên neteweyî ya dagîrkerên Kurdistanê ve bigre ta digate bername yên karton, film, musîk û festivałên çandî zarokên Kurdistanê bi nasname ya dagîrkeran danê mêjîşuştî kirin. Bo mînak pir̂tûkên xwêndingehan tijîne ji darsên gewcênerane û efsaneyên dûr ji zanist. Xwêndkar hez bika anjî ne, bo berdawam bûne xwêndinê, dibê hîn

bibê. Dagîrkeran ȓastewxwe mejîya wan xwêndkarane dikujin û tijî diken ji pȓupuçate (xuȓafate) olî ku hîç dam bifikre nasname ya neteweya xwe ne bin û xwêndkar dame wan nebê tenanet lêkołînên zanistî biken. Hawdam dagîrkeran zanayane bi damezrandine Îxwan, Mektebîun, Mucahîdîn, Komełe û Yêkyetîyên Îslamî, civake Kurdistanê mêjîşor kirne.

Dagîrkeran, wan karane hemî bi zanabûn û bi bername diken. Çima wan ewqas grîngî bi netewe ya xwe didan û dîrok, cugrafî û ole xwe bi grîng dizanin, bełê ziman, dîrok û ya Kurdistanê qedaxe diken. Neyarên Kurd zanîne ku eger her ji zarokî ve mêjî û fikre Kurdan têk biben û heste neteweî ya xwe bi ser wan da bisepênin, wê damê ku mezin jî bûn, li gor berjewendî yan, sûda xwe ji wan wergirin. Bê sedem (vała) niye ku gencên Kurd wên ku xwêndine zanistgeh jî girtine, ji ser dîrok û cugȓafî ya ȓasteqîneya Kurdistanê tiştek nizanin û bam wan sosrete.

Karîgerîya wê nexoşîye darunî mezintire ku tenanet piranîya Kurdan li welatên ku tê da azadin jî, xwe bi

Kurd û Kurdistanî na nasênin, bełê bi Kurdistanî bûne xwe şerim diken û şanazî bi Îranî, Iȓaqî, Tirkî, û Suriye bûnê diken. Ev vîruse Kurd kuj, teşeneker û awêtekere ku ji nevşên berê ve bo Kurdan maye. Hoş û ȓaman Kurdan ewqas paşxistîya ku li Ewrupa jî, ji Kurdistanî bûne xwe şerm biken û şanazî bi navên dagîrkeran biken. Hergîz Tirkek, Ĥeȓebek, Farsek na bejê ez Ałmanîm, tenanet eger li Ałman jî, ji daîk bûbê. Wate haşa ji neteweya xwe naken, tenanet eger welate xwe bi dîtin jî ne dîbin. Ev nexoşîye darunîye, "kêmî ya heste neteweîye" û di nav gelê Kurd da wek şêrpence (kenser) ȓîşe dakutaye. Eger neyête çareser kirin, awêteya nevşên peşeȓojê bibê.

Hinek ji xełkê Kurd bi şêwazeke din hatîye hîpnutîzme ȓewanî kirin û wisa dafikrin ku mafe Kurdistanî bûn Kurdan niye. Çimkî ev daxwazyeke nasîonalîstîye. Çima Tirkî, Îranî, Iraqî anjî Surî bûn înteȓnasîonalîstîye, bełê Kurdistanî bûn înteȓnasîonalîstî niye? Çima ku nave Kurdistanê hat, mirovê nasîonalîst dihesbênin, bełê ku nave neteweyên dagîrkere Kurdistanê hat, mirov dibê înteȓnasîonalîst? Gotine wan ȓêxistinan,

înternasîonalîste û kirdarên wan jî şovînîstîye û tenê bo xapandine xełkê Kurda ku wisa xwe pênase diken. Egîna eger ewqas mirovdostin, çima bo gelê Kurd hîç naken û înteȓnasîonalîste Kurdistanê pêk na înin? Çima bo serbexweî ya welat û ȓizgarî ya sosyalîstane ya gelê jêrdaste ya xwe tênakoşin? Xo Kurd ji hemî netewe yên Fars, Ĥeȓeb û Tirk hejartir û bê maftire. Çima xoşewîstî ya neteweî ya Kurd û axe Kurdistanê bi Kurd ȓewa na bînin û wê bi tawan (suc) dizanîn, bełê bi nave înteȓnasîonalist fikre dagîrkeran û şovînîstan li Kurdistanê bełav dikin? Bi wê navê nwênerayetî ya zordar û dagîrkerên Kurdistanê diken û bo durxistine Kurdan ji doze neteweyî û şêwandine nasname ya wan kar diken. Bo mînak Komełe û Ĥîzbe Komonîste Karkerên Îranî, sosîyalîset û çepên her çar dagîrkerên Kurdistanê.

Beşek ji ȓêxistin û kesayetîyên Kurd ji pênave jiyane ȓojane ya xwe da, alîkarîya dastełatên dagîrker diken. Pêwîste têkiłiye her aliyek di çarçêweya berjewendîya gelê Kurdistanê da bê. Di wan nizîkatiyan da Kurdan dibê şiyarane hełsukewit biken û ziman, çand û heste

neteweyî hîne nevşên pêşe řoja Kurd biken ku drustkertir, şyartir û Kurdistanî perwertir bin.

7- Sedameke dinê řêgir ji pêşketine doze Kurd, hebûne 22 welatên dîktatore Ĥeřebane ku li hember kêşeya Kurd da herdam piştgîrîya Iřaq û Suriye diken. Hemî welatên îslamî jî li hembere doza Kurd piştgîrîya Îrane diken. Tirkiye ku endameke grînge NATO ye ji aliya zilhêzên řojava û havpeîmanên NATO řa li hember gelê Kurdistanê bi hemî řewişan tê dastek kirin. Ji ber berjewendîyên abûrî û řamyarî welatanên herêmî û cîhanê, Kurd bê hawpeîman, bê dost û bê nasname hatine hêştin. Wan dastełatên ku xwe jî wek doste Kurdan nîşan didan, tenê bo berjewendîyên damiyên xwe, Kurdan bikar anîn, egîna hemî nikořî ji serxwe bûne Kurdistanê û nasname ya Kurdan diken.

Ji ber wê pêwîste ku gelê Kurd û řêxistinên Kurdistanî maf û berjewendîyên neteweî ya xwe bizanin û bi yêkgirtî berve asoya řizgarî yê gav bavêjin. Pêwîste ku her takeke Kurd û her řêxistineke Kurdistanî agadare

pilan û bernameya kare xwe bê û di çarçêveya řizgarî ya welate pênc parçe ya Kurdisatnê da xebatê bika.

Eger Kurdistanî yêkgirtyane û bi xebateke bêwiçane civakî dûr ji berjewendîyên berçavtenga řêxistinî, bi diruşme serbexwe ya Kurdistanê û dagîrker bo dareve bêne qadan, misogerane dikarîn bi ařmance řizgarîxwazaneya xwe bigen. Tenanet neteweyên drawsê jî, ji azarên hezar saleyên řojhełate navîn řizgar dibin. Bêguman paş serkevtinan, şyarîya gelê Kurdistanê bo parastine dastkevtên neteweyî, pir girîngin.
Eger neyarên Kurdistanê bizanin ku yêketî û havpiştîya xełkê Kurdistanê di xebate řizgarîya nîştmanî da parsenge hêz bi qazancî damezrandine Kurdistaneke serbexwe tê gořan û paşekşe bi dagîrkeran dika, wê çaxê bi fermî nasîne Kurdistanê wek cugřafyeke řamyarî ya serbexwe di ast cihanê da bi asanî cêbicê bibê.

Wê damê dastełatên drawsê (cîran) û dostên ku îřo doze Kurdan wek karteke lîztoke řamyarî-abûrî bidast

girtine, di pêşbiȓke mamile ya abûrî û peîwendî bi Kurdistanê ȓa, xwe dastpêşxerî diken.

8- Nebûne pîşesazîyeke modêȓn û kizî (bêhêzî)ya bware abûrî ye hinek ji xełkê Kurdistanê.
Ji ber bêkaryeke zêda ku wedageȓê bo nebûne pîşesazîyeke serdamyane (modarn) li Kurdistanê, beşek ji xełkê naçarin (mecbûrin) bo dabînkirne jiyanê koçbere bajarên welate dagîrkerên Kurdistanê bibin. Feqîrî, birçyetî û bêkarî bûne binase hejarî ya nasname ya xełkê Kurdistanê.

9- Dagîrkerperistî
Beşek li ȓêxistinên nasîonalîstên Kurd dagîrkerperistin û xwe bi Îranîtir ji her Îranîyêk dizanîn. Wisa panîranîsmê bełav dikin û bi nave alîgre xudmuxtarî (otonomî), fidȓalî û teȓemaşên din, xwe bi şoȓeşa Kurdistanê ve grêdane û hemî hewłên wan, şerîk bûn li dastełate kevneperiste dagîrkerên Kurdistanêye. Wan ȓêxistinan bi nirxê ȓojê nan dixon û bi şev Kurdistanî û bi ȓoj Îranî, Iȓaqî, Tirkî anjî Surîn. Bo mînak Komełe bi hemî bałên xwe, Ĥîzbe Komonîste Îranê, PSKT, PDKT, ĤDKI, ĤDK, PDK,

YNK, hemi r̂êxistinên îslamî û çepên başur, r̂ojhełat û r̂ojavayên Kurdîstanê.

Pêwîste wan r̂êxistinane baş bi zanin ku beît û bałoreyên (lorînên) "Ji hemî Îranîyan Îranîtrim" anjî "Kurdistan xewne hełbestwanane" bam dagîrkerên Kurdistanê û opozisyonan, gûhgirek jî nînye. Wan r̂êxistinan be drêjedane wê r̂amyarî ya çewit (şaş) xizmete dagîrkeran diken û zêdatir bam gelê Kurdistanê xwe şermezar û r̂îswatir diken. Ji ber wê pêwîste herçî zutir xwe r̂exne biken û bo r̂izgariyê, r̂êbazeke neteweyî bigirne ber û bo serxobûne Kurdistanê û yêkgirtine hemî parçeyan r̂astbêjane têbikoşin. Gotineke pêşîniyan heye ku dibêjin:
"Dostit xirap bê, ji ber wî helê (r̂ake)
R̂ûr̂eşî tênê, maçe mencełê".

**Beşe Şeşem**

**6- Mafên seretaîyên mirovên Kurdistanê**

Hebûne nasname ya neteweyî, yeksanîxwazî, azadî ya ȓa darbiȓîn, hełbijartin û ȓîfȓandome azad tên wate ya mafên serekîyên mirovên Kurdistanî.

Hêjayê gotinê ye mafên ku her takeke civakê dibê jê behremend bê, ji aliye dagîrkerên Kurdistanê hatîya dast bi ser kirin. Take Kurd wek kesayetyeke Kurdistanî nek mafe bûn û bergirî ji xwe pênedraye, belkî bo wê nebê xodan nasname û kyaneke serbexwe, nasname ya dagîrkeran bi ser da hatîye sepandin.

Li hember hemî pilanên dagîrkeran beşek ji gelê Kurd ne tenê ȓadest ne bûye, belkî şêrane xebate sedan sałe ya xwe li pênav ȓizgarîya nîştman û geîştin bi bihayên mirovî peşxistîye.

Wên ku di r̂êya serxobûne axe pîroze Kurdistanê da xebateke fedakarane kirin û di wê r̂êyê da gyan bext kirin, di nav diłê Kurdistanperweran da r̂êza taîbete wan heye û herdam têne r̂êzgirtinê. R̂êya wan welatparêzane ta geîştin bi nasname ya Kurdistanê û dabînkirine jiyaneke azad û yeksanîxwazane bo gişt Kurdistanîyêk, bi drêjepêdane xebate,
gelê Kurdistanê r̂êz tê girtin.

Bo pêşxistinên Kurdistanê pêwîst bi r̂êveberên r̂asteqînyên hałbjartîya nav civake hene. Wate dibê kesên bi wîjdan, azadîxwaz û welatparêz bir̂yar bidast bin. Pêwîste bir̂êwberayetî ya yasa û dastgehên wê civakê di jêr çawedêrîya xełkên pispor̂e sîvîl da bin û bo dabîn kirine daxwazî yên dêmokratîkên welatîyan kar biken. Dabê hemî welatî bi bê cihêrengî li hember yasa da xodan mafên yeksan bin.

Bo damezrandin û bir̂êvebirine wê civakê, gel pêwîste ku r̂êxistnên xwe pêk bênin. R̂unakbîrên wê civakê dibê hest bi berpirsyaretî biken û li pênav pêk

anîne wê civakê, r̂êberayetî ya r̂êxistnîn svîl bigirne milê xwe. Herweha bo pêk anîne yêketîya gel û daxwazî ji dastełatê, ji ser standine mafên r̂ewa, xełkê şyar biken. Dama ku xełk şyar bibê, dikarin daxwazên xwe bi şêwazên aştîxwazane û mirovdostane bo r̂êvberên dastełatê beriz biken. Wê damê eger yêkgirtyane alîgirî ji mafên xwe biken, dikarîn daxwazî yên xwe bi ser dastełatê da bisepênin û tenanet xwazyare gor̂an jî bin. Paşan di karin hełbjartine giştî pêk bênin û nwênerên r̂asteqîneya xełkê di nav dastełate nû da dastbikar bin. Di dameke kêm da pêwîste ku ev dastełate nû daxwazî yên gel cê bi cê bika.

Dibê daxwazên wek azadîya r̂agehandin, hatûço (hatin û çûn) û pêk anînên r̂êxistinên azadixwaz her ji r̂oje yêkem ji alîya dastełate nû bêne serbest kirin. Eger dastełat wan azadyan binpê bika, dibê xełk şyar bin û her ji dastpêk ve wekirî xwazyare wan azadyan bin û hîç bihane yên îr̂o û sibê ji dastełatê qibûł neken.

Baş kirîne bware abûrî ya jiyane xełkê û pêşxistine zanist û teknolojî, dibê bi pilane dastełatê û di p̂roseyeke kêm da pêk bê. Dastełate dibê daxwazî yên r̂ojane ya welatîyan bi cê bênê. Karbidastên dastełatê dibê li gor daxwazî yên gel kar biken û eger jî dastełat nikarî daxwazî yên gel dabîn bika, dibê gel ew qas bihêz bê ku dastełatê bi şêwazeke yasayî biguhar̂înê.

Bo pêk anînên dastełateke xełkî, dibê heste neteweyî pir xurt bê û gelê Kurdistanê jî mafên xwe bi drustî nas bika. Bo geîştin bi wan armancan gel pêwîste ku giriftîn nav xwe wek xêł̂, axa, şêx, mela, caş û seîd çareser bika. Di nav civakeke pêşketî, gel bi xêł̂ û çîn û twêjên cor bi cor nayête dabeş kirin, belkî hemî takên civakê yeksan têne ditin. Gelê Kurdistanê ta wan guhar̂tinan di nav xwe da pêk neînê, her di paşketinê da dimênê.
Pêwîste ku nevşe nûye Kurd şaşîyên bûrî dûbare ne ken û di bware mafên mirovan û pêşketinxwazî yê da têbikoşin û hewłe gor̂ankarî ya nav civakê biken.

## Beşe Heftem

## 7- Çanda netewe ya Kurd

Pêkhatên wek ziman, dabûneryet (edet), xû û řewşit ku takên nav yêk civakê bi hev řa grê didan, çanda wê neteweyê pêk tênin.

### 7-1. Zimane axeftinê anjî zimane neteweyî

Girîngtrîn xałe nizîk kirina endamên yêk netewe yê, zimane wê netewê ye. Her bi wê zimanê jî netewek dikarê çand û nasname ya xwe bi cîhanê bidate nasîn. Zimane Kurdî girîngtrîn faktere cihêřenge Kurdane bi netewe yên Tirk, Fars û Ĥeřeban. Her ji ber wê ye ku wek nasname ya neteweyî tê nasîn. Zimane Kurdî ji çend zaraveyan pêk tê:

- Kurdî ya jurîn (Kirmancî, Şikakî, Badînî).

Nizîk seda çil û pênce (45%) gelê Kurd li herêmên bakurê Kurdistanê, řojavaya Kurdistanê, parêzgehên Dihok û Musiłe başurê Kurdistanê, parêzgeha Wirmê ya řojhełate Kurdistanê, Kurdistane Sor, Kurdên Xuřasan,

Ermenistan, Gurcistan, Qezaqistan û Lubnanê bi wê zareve yê diaxvin.

- Kurdî navendî (Soranî)
Nizîk seda sî ya (30%) gelê Kurd li parêzehên Sine, Mukiryan, Slêmanî, Hewlêr û Kerkuk bi wê zareve yê diaxvin.

- Kurdî jêrîn (Luȓî, Kełhuȓî)
Nizîk seda pazdaha (15%) gelê Kurd li parêzgehên Kirmaşan, Luȓistan û Îlamê bi wê zareve yê diaxvin.

- Goranî anjî Hewramî
Nizîk seda pênce (5%) gelê Kurd li herêmên Hewramane başurê Kurdistanê (Xaneqîn) û ȓojhełate Kurdistanê (Pawe) bi Hewramî diaxvin.

- Zizakî anjî Dimilkî
Nizîk seda pênce (5%) gelê Kurd li herêmên Darsîm, Ȓuha û dore çemê Furatê bi Zizakî û Dimilkî diaxvin.

"Celadat Bedirxan" di saɫe 1931 da elfbaye Kurdî bi Latînî û Aramî dana (çêkir). Di saɫe 1932 ta 1943 r̂ojname ye "Hawar" li Şamê hate biɫav kirin. Hawar ta hejmare ye 23 bi her dû pîtên Latînî û Aramî dihate çap kirin. Li hejmare ye 24ê ve tenê Latînî ye wê hate çap kirin.



Celadat Bedirxan 1951- 1893

Pirisgirî yên sereke ya elfbaye Kurdî ya jurîn:

<table>
<tr><th>Kurdî jurîn</th><th>Bi şaşî dête nivîsandin</th><th>Pirisgirî</th></tr>
<tr><td>Ĥefrîn</td><td>Efrîn</td><td rowspan="2">Nebûne pîte "Ĥ" û nivîsine wî bi H anjî E</td></tr>
<tr><td>Ĥeleb</td><td>Heleb, Eleb</td></tr>
</table>

Hêjaye gotinê ye ke Kurdî ye jurin di hinek herêman da bi pîte Aramî û R̂ûsî jî tê nivîsandin. Lê tê hêvî kirin ku bo zimaneke yêkgirtî tenê bi Latinî bête nivîsandin. Bo nivîsîne Zizakî jî pîte Kurdî ye jurin tê bi kar anîn.

Li wir ji bo çareserî ya nivîsîne Kurdî bi pîtên Latînî 34 pît pêwîstin û ji wan 10 dangdar û 24 jî bêdangin. Li hember her pîteke Kurdî ye Latinî, pite Aramî jî hatîya nivîsandin. Bo cudaî yên dangan mînak jî hatine lêdan:

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| A-a ئـ - ا<br>Mînak: Amed | B-b ب - بـ<br>Mînak: Bidłîs | C-c ج - جـ<br>Mînak: Civak | Ç-ç چ - چـ<br>Mînak: Çira | D-d د<br>Mînak: Dar |
| E-e ـه - ه<br>Mînak: Erdîş | Ê-ê ێ - ێـ<br>Mînak: Sêrt | F-f ف - فـ<br>Mînak: Felek | G-g گ - گـ<br>Mînak:Gabar | H-h ھ<br>Mînak:Hełebce |
| Ĥ،ĥ ح - حـ<br>عـ - ـعـ - ـع - ع<br>Mînak: Ĥefrîn | I-i (بزرۆکه)<br>(Tineye)<br>Mînak: Jin | Î-î ی - یـ<br>(ی کورت)<br>Mînak:Îlam | J-j ژ<br>Mînak: Jiyan | K-k ک - کـ<br>Mînak: Kerkuk |
| L-l ل - لـ<br>Mînak: Law | Ł-ł ڵ - ڵـ<br>Mînak: Ała | M-m م - مـ<br>Mînak: Mał | N-n ن - نـ<br>Mînak: Nan | O-o ۆ<br>Mînak:Erzeȓom |
| P-p پ - پـ<br>Mînak: Pîran | Q-q ق - قـ<br>Mînak: Qendîl | R-r ر<br>Mînak: Mirov,<br>Yar | Ȓ-ȓ ڕ<br>Mînak: Ȓuĥa,<br>Ȓeş, Ȓêwas | S-s س - سـ<br>Mînak: Sine,<br>Serdaşt |
| Ş-ş ش - شـ<br>Mînak:<br>Şemzînan | T-t ت - تـ<br>Mînak:Tavge<br>Tûzxurmatûz | U-u و<br>Mînak:<br>Kurdistan | Û-û ئو<br>Mînak: Bûn | V-v ڤ - ڤـ<br>Mînak:<br>Mirov, Vîyan |
| W-w و<br>Mînak: Wan,<br>Newroz | X-x خ -خـ<br>غـ - ـغـ - غ<br>Mînak:Xaneqîn<br>Xezal | Y-y ی - یـ<br>(Pêşe pîtên<br>a,e,i,î)<br>Mînak: Yar<br>Yemen | Z-z ز<br>Mînak: Zana | |

Elfbaye Kurdî ye navendî, Kurdî ye jurîn û Goranî 32 pîtên wî hene û ji wane 6 dangdar û 26 bêdangin û wisa têne nivîsandin:

| | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| ر<br>R-r | د<br>D-d | خ<br>X-x | ح<br>Ĥ-ĥ | چ<br>Ç-ç | ج<br>C-c | ت<br>T-t | پ<br>P-p | ب<br>B-b | ئ، ا<br>A-a |
| ق<br>Q-q | ڤ<br>V-v | ف<br>F-f | غ<br>X-x | ع<br>Ĥ-ĥ | ش<br>Ş-ş | س<br>S-s | ژ<br>J-j | ز<br>Z-z | ڕ<br>Ř-ř |
| ە<br>E-e | ھ<br>H-h | ۆ<br>O-o | و<br>W-w<br>U-u | ن<br>N-n | م<br>M-m | ڵ<br>Ł-ł | ل<br>L-l | گ<br>G-g | ک<br>K-k |
| | | | | | | | | ێ<br>Ê-ê | ی<br>Î-î<br>Y-y |

Pitên Û-U di Aramî da tinene.

Sê griftên sereke ya elfbaye Kurdî ya navendî:

| Pirisgirî | Aramî | Latînî |
|---|---|---|
| 1- Nebûne pîte "i" ku bi bizroke tê nasîn. | "Tfnk"<br>تفنک<br>"i" têda tineye | Tifinik bi Latînî asantir tê nivîsandîn ku bi Aramî. |
| 2- Nebûne "u" û nivîsîne wî bi "w". | Bo minak "Keîxwsrew"<br>کەیخوسرەو | Belê bi latînî pir baş hatine cuda kirin. Keîxusrew |

| | | |
|---|---|---|
| 3- Nebûne hîç cihêrengî yêk di nav "y" û "î" da. | Bo mînak peîve "Zerdaşty" û "Zerdaştyar" her dû bi yêk "y" têne nivîsandin.<br>زەردەشتی<br>زەردەشتیار | Bełê bi Latînî pir baş hatine ji hev cuda kirin:<br>Zerdaştî<br>Zerdaştyar |

## 7-2. Xû û řewişt

Şêwaze jiyan kirin, hestyan, danîştin, xwarin, wexwarin, têkeławî yên civakî û bi giştî hemî wan dabûneryetên ku řojane neteweyêk bi yêke hev grê di da, xû û řewişte wê netewe yê pêk tênin.

Wan xałokên jêrî bi giştî beşekin ji xû û řewişte xełkê Kurd:

* Mîvandaryetî yêk ji xałe başe Kurdane ku hatî ye pênasîn bełê her ev mîvandaretye bûye sedame diłfireh bûn û darî wekirîne Kurdan bo neteweyên din ku di dastpêk da wek mîvan hatine Kurdistanê û paşan bûne dagîrker û dastełatdar ji ser gelê Kurd. Bo mînak hatine Azeriyan bo herêmên Wirmê, Sełmas, Xoy, Myandwaw, Şahîndij, Nexeda û Mihemmedyar anjî hatine Tirkemenan û Ĥeřeban bo Kerkuk û Musił û Xaneqînê. Herweha hatine Tirkan bo hemî bajarên bakurê Kurdistanê û Ĥeřeban bo hemî bajarên řojavaye Kurdistanê.

* Yêk ji xałên xirape Kurdan eve ku her Kurd xwe ji Kurdake din bi zanatir, şyartir, têkoşertir, ȓasttir, qaȓemantir, grîngtir û bi hestire dizanê. Bełê heman Kurd xwe bi biçuktir ji neteweyên Tirk, Ĥeȓeb û Fars dizanê. Wate Kurd şêre małê xwe û ȓûvîye darêye. Ev nexoşî ji nav małbatan ve dastpêdika ta digate nav ȓêxistinan û civakê.

* Xałeke dine xerape netewe ya Kurd grêdrawbûne zêdabidare bi olê ye. Ol bam piranîye Kurdan tişteke pir girînge, her ȓoj xwe pê ve sergerim dika û xû jî pêve girtîye. Her Kurd di bware olî da xwe pê zanaye û bi şanazî li hember kêşeyên olî da hełwêst dagrî û bêxeber ku hîç jê tênegeîştî ye. Kurd gotenî "Ĥeîya wî ji tiştekê niye".

Piranî ya xełkê Kurd hemî temen (ĥemir)ê darbaz dika bê ku ji ȓastîya wê cîhanê têbiga û mixabin bi nizanî diçne ser dilovanîyê. Herwek bave (tê zanîn) û dibêjin: "pał bi małe xudê", "bitema xudê", " kar niye xudê çê neka", "serê xwe daxe û xudêperistî bike."

Hêjayê zanînê ye ku dûbare kirine her tiştekê, bibê xûgirtin. Jiyan kirin bi xûgirtin jî bibê nexoşî. Eger wê nizanî û serjêşêwawî ya Kurd bê nirxandin, dama ku kesek xwe bi keseke din, dida nasandin, gelo pêwîst dika hemî řojek 17 caran xwe bi wê kesê bida nasin. Dama wê karê kir, îdî ew kes nexoşe darunîya wî heye, girêdayî û xûgir bûye. Her wisa pêwîst niye ku Kurdak řojane 17 řikat nimêjê bika û 17 car bêjê ez baweř bi xudê heye. Eger řastî dibêjê û baweřa wî pêheye, bila yêk car xwe pê bida nasandin û bêjê xudê ta hem baweřî ya min bi te heye. Îdî ev nexoşî ya darunî darbaz bika û paşmahîye temenê bi saxî û drustî bijî û xwe bi pirisgerîyên dinê jiyanê sergerim bika. Mixabin ew řewişte ji cîranên Kurdistanê ve awêteya (melisîna) Kurdan bûye û teşene kirye (bełav buye). Neyarên Kurd çanda xwe wek bîrubaweř bi ser Kurdan da sepandine bo ku Kurd fikre nasname ya xwe niken û tenê bi kêşeya olî sergerm û xûgirtî bin. Dama wan na bê ku pêşketin û lêkołînan bişopênin.

* Yek ji xałe dine ferhenge Kurdan ewe ku Kurd qasî ku di fîdakarî yê da bêmînakin, ew qas jî di terse wê da

bêmînake. Wate Kurdak bi asanî di karî gyane xwe fîda ye hevalê xwe bika, bełê heman kes jî ku bi heman hevalê r̂a tuşe naxoşîyê hat, dikarî bûxtan bi wî bika, dijûn bida û tenanet wî bikujî.

* Kurd pir dam nenase û damjimêreke Kurdî xwe ji berek we dakêşênê û her damjimêrek qasî çar damjimêre standard dibê.

* Çanda xwe xorî r̂îşeyeke dîrokîye wî heye û Kurd di wê bwarê da di cîhanê da yêkeme. Caş û sîxur̂ mînakên berçavin ku hejmare wan dah car ji hejmare r̂êxistinîzanên pêşmerge û girîla zedatire. Sedame wê sîxur̂îyê wedager̂ê bo wê ku dagîrkerên Kurdistanê jiyane abûrî ya netewe ya Kurd, ew qas dabezandine ku piranîya gelê Kurdistanê r̂oj û şev bi fikre bidast anîne nane zig û bixêvkirin (jiyandin)e zarokanin. Hinek ji xełkê Kurdistanê ew qas hatine xwast nizim kirin ku tenanet xwastikê wan jî niye ku fikir ji nasname ya xwe biken.

* Piranî ya xełkê Kurd di nav jiyane małbat û civakê da yeksanîyê bi kirdawe pêk neînê. Mafên jinan, zarokan û kêmendaman bi aşkrayî têne pêşêl kirin. Mêrsalarî dasełatdare û jin wek koîle, xizmetkare mał, kałaya bazař, nîve mirov û jêr daste bi wan řa hełsukewit tê kirin. Bo mînak hinek car kêşe ya nav xêłen Kurd ku zelam drust diken, bełê aştî û řêkevtine (mesłet) bi bexşîne kiçekê anjî zarokeke kiç tê çareser kirin. Ta niha ne hatîye zanîn ku małbatek kuřekê di xwêne řêkevtinekê da bida dujmineke xwe, bełê dane kiçê bi dujmin jî, wek kareke guncav di nav Kurdan da cêketî ye.

* Xetene (sunet) kirinê kiçan yêkê din ji řewiştên namirovane ya xełkê Kurda. Piranî ya jinên Kurd li zarokî da tên xetene kirin û etik kirin. Hêjayê base ku xetene kirin wek erkek olî dinav Kurdan da bûye neryet, bê aga ji wê ku jinên xetene kirî nikarîn wek pêwîst li bware sêksî da heste jinayetî ya xwe pêk bênin. Bi awayêke din, hez ji nizîl bûnê naken. Ew kirdawe çimkî hesteke xoşa jinan bo herdam qût dika, kareke nařewa û namirovaneye.

* Darew, dûzimanî û bûxtan ji taîbetmendîyên dagîrkerên Kurdistanên ku bo Kurd bi dyarî hatine şandin û Kurd jî xû pêgirtine. Bam Kurdan asaî ye ȓûdawek ku ȓujî ne dabê, wisa bas bika ku ȓudaye anjî kesayetî ya Kurdake din pêsuk ka û darew di serê wî da bişikênê. Dyare hinek ji Kurdan wê ȓeftarê tenê li hember Kurdan bikar anîne û li hemebr dagîrkeran da serşoȓî û wiskutî hełbijartine.

* Mastawçyetî (xułqkirine) bêwata û bêmana pir bawe li Kurdistanê da. Bo mînak di damên şitumek kiȓînê da xodan dukan bi asaî û çendîn car bi kiȓyar dibêjê "mîvan be", "lê geȓê" û "ba ez drawê bidam". Ev di hałekdaye ku froşyar tenanet hez dika mila kiȓyar ji binê ȓa jê ka. Yan dama dû kes berve małê maławayî ji hev diken, bi tika bangêşte yêktir diken bo małê, ev di hałek daye ku her dû dizanin ku drev diken. Anjî damek çend kes dixazin tiştek bikiȓin û drawe têçunekê bidan, hemî ji ser wê ku kîjan drawê bida, kêşe û heła saz diken. Ew kare bam xełkên xodan şaristanyet pir naşîrne. Cê ya wê şanoya gałtecaȓiyê,

pêş kiȓîne tiştê biȓyar bê daîn ku kê drawê bida anjî dama yêk dibêjê drawê didam, pêwîste ên tî baweȓ bika û asan bigrê.

* Jin kuştin ji ser babete namusî û kutekkarî ya naȓewa ya kiçan û jinan dyarîdayeke pir naşîrîne ku beşêk ji Kurdan pêşanazin. Ew Kurd bêxeberin ji wê ku li bware darunî nexoşin û bi wê dyarîdaya namirovane, netewe ya Kurd di nav cîhanê da bi kêvî (hovî) û xirapkar nasandine.
Di wê bwarê da jin kujên koneperist û medya ya alîkare dagîrker û neyarên Kurdistanê, netewe ya Kurd bam bîruȓaya giştîya cihanê suk kirne.
Beşek ji Kurdan diłpîsin û herdam bihane dagrin û bûxtan bi hawjînên xwe diken û wan didane ber kutek û ta dikarin şikence ya darunî û cesteî diken. Piranî ya wan Kurdan nexoşin û çimkî boxwe kesayetîyêke xirabin, wisa boçuneke wan heye ku hemî kes wek wan dûȓû û bê exlaqin.

* Napaqijî kêşeyeke hinek ji Kurdane ku wedageȓê ser nebûne zanisteke drust ji ser paqijî yê. Bo mînak bam

hinek ji Kurdan asaî ye ku di xulekek (daqeyêk) da çend car dast di tifinik werda û paşan toqe (destê hev girtin) bi yêkê din bika û xwarin jî bi heman dastan bixwa.
Kurd bi yêktir maç kirinê, di dama dîdar û małavaîyê da vîrusan awêteya yêktir diken. Beşek ji Kurdan girîngî nadan bi paqijî yê di dama xwarin çêkirinê da. Hinek car çêşt (xwarin)e Kurdî ji mu bigre ta sipih û kêç jî têda peîda dibê.

* Kurd di xwêndnewê da pir tembełin. Beşek ji Kurdan eger xwêndawarîya wan jî hebê, meger zordaryek ji ser bê anjî naçar bin, egîna bałkêşî bi xwêndine piȓtûk anjî ȓojname û govaran nadan. Piranî ya xełkê Kurdistanê xwe bi pispoȓe hemî babetan dizanin û bê wê ku zanyareke wan ji ser wê babetê hebê, biȓyar ji ser didan. Wate kûrkûrane qezawet kirin, karê hinek jê Kurdane. Ev nexoşî ya darunî ya gelê Kurda û kêm kes hest bi wê beła ya mezin kirye. Pêwîste ku Kurd zêdatir wexwênê û li ser dayan babetên cor bi cor lêkołin bika, paşan ku ji ser babetek jî axeft, bi hestyarî bas bika, çimkî hîç zanistek yeqîn (ebsułut)

niye û dakrê ji ser her babetek, dayan fikir û boçun hebin. Paşan di biryardan û gotin da, mirov bêjê ku ez wisa difikrim, nek seda sed wisaye anjî dibê wisa bê.

* Taîbetmendyeke yêkgirtî ya Kurdan eve ku cejne Newrozê bi cejne neteweî ya xwe dizanin. Di Newrozê da hem sała Kurdî nû dibê û werze bihar dastipêdika û hem jî jînge ya Kuristanê nû dibê.

**Beşe Heştem**

**8- Çend karesatên diłtezêne dawî ya sedaya bîsteme Kurdistanê**

R̂udawe 8 sał bombarane r̂ojhełat û başure Kurdistanê ji aliya dagîrkerên Îran û Ir̂aqê r̂a.
Şor̂eşa gelên Îran û Kurdên r̂ojhełate Kurdistanê di zimistane1979 zaînî dawî bi dastełate r̂ijîme dîktator̂ û nijadperiste paşayetî ya Pehlewî anî. Paşan çend mela bi r̂êveberîye Ayetułła Xumeînî û bi piştgîrî ya welatên Fir̂anse û Brîtaniya hatne ser kar û xwe bi ser gelên Îranê da sepandin. Haw dam darudaste ya Duktor Ĥebdur̂ehman Qasimlu bi alîkarî ya abûrî û çekên dastełate Ir̂aqê, bi nave "Ĥîzbe Dêmukr̂ate Kurdistane Îranê" dast bi ser r̂ojhełate Kurdistanê dagritin.
Di wê dama hestyar da ku hemî axe r̂ojhełate Kurdistanê azad bibû, supaya Îranê ta xwe girt, çend heîvan lîztikên xwe bi Kurdên r̂ojhełat kir û paşan Ayetułła Xumeînî fermane şer̂ (cîhad)ê dijî gelê Kurd

ȓagehand û bi supayê xwe got ku "Postałên xwe dar mexen ta hemî Kurdistanê dagîr neken".

Hêjayê base ku PDK bi fermane Mesĥud Barzanî mil bi mile leşkirên Îranê bost bi boste axe azadkrawe ȓojhełate Kurdistanê wezevrand bindastê dastełate dagîrkere Îranê. Di wê şeȓe dagîrker û xeyanetkarane da bi dahan hezar Kurd hatne kujtin û awate Kurdistaneke azad di gome xwên da hate sor kirin.

Dastełate Iȓaqê jî di dawî ya havîne 1980 bi alîkarî ya dastełate Emrîka êriş kire ser Îranê û herême Xuȓemşar dagîr kir.
Di akam da şeȓeke pir qurs di nav Îran û Iȓaqê dast pêkir. Welatên ȓojava şeȓ saz kirin bo wê ku çekên paş mahîya cengê cîhanê dûhem bifroşn û bazaȓe mamile ya newit û çekan di dastê wan da bê. Di akam da gelê Kurd, ji hemî aliyêk zêdatir zerermend bû û beşek ji ȓojhełat û başure Kurdistanê jî hate kavil (wêran û koçber) kirin.

Bo heşt sałan řojane dastełate Iřaqê bajarên Bane, Serdaşt, Pîranşar, Bokan, Mehabad, Seqez, Kirmaşan û herêmên dinê řojhełate Kurdistanê bombaran dikir. Dastełate Îran jî di bersîv da bajarên başurê Kurdistanê wek Qeładzê, Sengeser, Ȓanye, Dyanan, Hełebce, Dukan, Çoman û Xaneqîn bombaran dikir.

Balefiřên Iřaqê di 8/3/1985 da bajare Pîranşarê bombaran kirin ku têda zêdatir ji 500 kes hatne kuştin û 5000 kes jî birîndar û pekkewtî bûn û bi hezaran xanî hatne xapur (wêran) kirin.
Di 22/2/1988 ta 6/9/1988 dastełate Iřaqê dast kir bi girtin, bi kom kuştin û zînda bi çał kirine gelê Kurd ku têda sed û heştêû dû hezar (182000) kes ji xełke bêtawane Kurd hatne Enfal kirin.

Enfal ayeteke Quřane Pîroze ku di dame dagîr kirine Kurdistanê û komełkujî ya gelê Kurd da hatiya bikar anîn. Ełła Suřeya Enfalê ji azmanan řa bo Hezrete Mîhemmed (drudê xudê jê bê) şandîye û ferman daye ku Musiłmanên Ĥeřeb êriş berne ser gawiran û bi nave kafir bûnê wan komełkuj ken, samane wan

tałanken û jinên wan jî bi kenîze bigrin. Ełła di quȓane pîroz da bi Hezrete Miĥemmed (druda xudê jê bê) fermu ye:

إِذْ يُوحِي رَبُّكَ إِلَى الْمَلائِكَةِ أَنِّي مَعَكُمْ فَثَبِّتُواْ الَّذِينَ آمَنُواْ سَأُلْقِي فِي قُلُوبِ الَّذِينَ كَفَرُواْ الرَّعْبَ فَاضْرِبُواْ فَوْقَ الأَعْنَاقِ وَاضْرِبُواْ مِنْهُمْ كُلَّ بَنَانٍ.

Ew dam ku perwerdigare te, wehî darkir bo firîşteyan, wan kesên ku baweȓ û îman anîne, diłniya biken, ku ez bi wan ȓa me. Di dameke nizik jî da tirisê dixeme dił û darune wan kesên ku bê baweȓin, wate lêxen ji jurê stoyê wan, lêxen ji tilî yên wan (Suȓeya Enfal, Ayete 12).

Wate Ełła mafê kuştine Kurdên zerdaştî daye ku xudê persit bûn, bełê Ełła perist nebûn. Zerdaştî hem nimêj dikirin û hem ȓojî digirtin.Tenanet peîvên ȓojî û nimêj ji ole zerdaştî ȓa hatine.

يَا أَيُّهَا النَّبِيُّ حَرِّضِ الْمُؤْمِنِينَ عَلَى الْقِتَالِ إِن يَكُن مِّنكُمْ عِشْرُونَ صَابِرُونَ يَغْلِبُواْ مِئَتَيْنِ وَإِن يَكُن مِّنكُم مِّائَةٌ يَغْلِبُواْ أَلْفًا مِّنَ الَّذِينَ كَفَرُواْ بِأَنَّهُمْ قَوْمٌ لاَّ يَفْقَهُونَ.

Ey pêxember baweȓdaran pałbida bo şeȓkirin bi bê baweȓyan, eger bîst kese xweȓagire we hebê, załbida

(êriş bike û serkeve) bi ser dû sed kes da, eger ji we sed kes hebê, załbida bi ser hezar kes da, çimkî ev neteweyeke tênegeîştîn (Suȓeya Enfal, Ayete 65).

مَا كَانَ لِنَبِيٍّ أَن يَكُونَ لَهُ أَسْرَى حَتَّى يُثْخِنَ فِي الأَرْضِ تُرِيدُونَ عَرَضَ الدُّنْيَا وَاللَّهُ يُرِيدُ الآخِرَةَ وَاللَّهُ عَزِيزٌ حَكِيمٌ.

Ȓewa niye bo hîç pêxemberek dîl (esîr)e cengî hebê, ta bi başî li ser zevî dujmin neşkênê û pir ji wan nekujê, hûn kała û małê cihanê dixwazin, Ełła jî paşeȓojê dixwazê, Ełła jî serketî ye û kar bi cêye (Suȓeya Enfal, Ayete 67).

Ji wan ayetane dardikevê ku Ełła dijî dîl girtinê bûye û mafe kuştinê dîlên cengî jî daye. Dîl kuştin tenanet bam mirovên bewîjdan jî herdam bi karek pir na hêja û na ȓew hatî ye zanîn. Ełła zanîye ku mebeste musiłmanan di şeȓ da kała û małe cihanê bûye ta îslam.

Ji ser heman binasê Seddam Ĥusên pêxemberane fermane Enfale gelê Kurd da. Paşan dastełate Irȃq dast kir bi kîmyabarane çend herêmên başurê

Kurdistanê ku tenanet di jêr dastełate wî da bûn. Wisa di bihare 1987 da dastełate Iȓaqê 24 gundan di 48 damjimêran da dû car kîmyabaran kir. Herêmên "Şexwesan, Kanî Berd, Pasyan û Kotîman" ketne ber kîmyabarane dastełate Iȓaq û di akamda 130 kes hatine kuştin û 5000 kes jî birîndar û pekketî bûn ku bo hemî jiyanê şûneware çeke kîmyayê ji ser bedane wan ma.

Di 28/6/1987 da bajare Serdaşt ji aliya bałefiȓên dastełate Iȓaqê ve hate kîmyabaran kirin û di akamda 200 kes bi gaze kîmya yê mirin û 20 hezar kes jî pekkewtî bûn.

Di 16/3/1988 supaya Îranê hêriş kire ser Hełebce û di dama paşekşe da bombên kîmyayî bi ser xełkên bêtawan û sivîle bajeroke Hełebce da barand. Di akame wê komełkujîyê da zêdatir ji 5000 kes hatne kuştin û bi dahan hezar kes jî pekkewtî bûn. Hêjayê base ku karîgerî ya wê kîmyaî yê ji ser nevşên pêşeȓoje wan pekkewtîan jî wedamênê.

Di wê karesatê da welatên cîhane bi nav mirovdost jî, mirteq ne kirin û tawanên dastełate Iȓaqê weşartîn. Bombên kîmyayî ku ji aliya dastełate Iȓaqê ȓa bi ser Kurdistanê da hatibûn barandin, ji aliya welatên Ałman û Hułendê ȓa bi dastełate Iȓaqê hatibûn frotin.





Tawanên dastełate Iraqê li Hełebce

## Beşe Nohem

## 9- Çend kesayetî yên şoȓeşgeȓên Kurdistanî

### 9-1. Melayê Cizîrî

Melayê Cizîrî hełbestwaneke ku li çerxe pazdahem ȓa di nav gelê Kurd da hatîye nasîn. Melayê Cizîrî bi dahan hełbestên nîştmanperwerî nivîsîne û bi sedan Kurd jî fêre xwêndawanîyê kirne. Cizîrî di sała 1407e zaînî di bajare cizîre bakurê Kurdistanê ji daîk bû û di sała1481an da çu ser dilovanî ya xwe.



Melaya Cizîrî

## 9-2. Xanzada Mîre Soran

Xanzad kiçe " Şaqul Bege Soran" bû ku di sała1550 zaînî li bajare "Soran"e başurê Kurdistanê ji daîk bû. Pişta wê ku "Mîr Suleîman Beg"e biraye Xanzad di sała1590 bi pilaneke xapandinê û bi fermane serfermandare Ĥusmanî bi nave "Leşkirî" di r̂êya Bexda da hate jehrxwar kirin, Xanzada fermanr̂ewaî ya mîrnişne Soran girt dast û xebatên mîrnişînî yê kir.

Pişte heîvekê Xanzad nameyek bo serfermandar "Leşkirî" şand û jê xwast ku bi wî r̂a zemawend bika (bi zewcê). Çimkî Xanzad di xoşik bûnê da pir nasî bû, "Leşkirî" bi 200 çekdarên Ĥusmanî bo banghêşte zemawend kirinê çu Soran. Her çekdareke Ĥusmanî ji aliya małbateke Kurd r̂a hate banghêşt kirin û Leşkir jî mîvane Xanzad bû. Di şeve çile ya matemîn (xemgîn)e mîrnişîne Soran da, hemî 200 çekdarên Ĥusmanî û "Leşkirî" hatne jehrxwar kirin. Wisa Xanzad tołe ya bira ya xwe ji împir̂ator̂e Ĥusmanî wekir.

Xanzada Soran Şajineke baqîl û řoşinbîr bû. Xełkê pir řêz ji wî digirt, bełê di heman dam da pir jê ditirsan. Ew Şajine Kurda di swarçakî û dastełatdarî yê da ji bo Kurdan bûye şanazî ya wê serdamê. Xanzad jineke bała berz piriç řeş, aza, û bwêr bû. Di şeř û berxodan li hember dujminan da, herdam xwe pêşe supayê diket. Di 7 sałên fermanřewaîyê da, çendîn dabistan, řê, pir û qeła çê kir ku hinek ji wan hin jî şûneware wan maye. Hinek ji wan wisane: Gełê Xanzad, Kevne Dîvar û dîmenên çiyaye Herîrê, Qułxe Supa yên di herême Herîrê û qeła ya Xanzada li navber Pîrmam û bajare Hewlêrê.

Di daspêke dastełatdarî ya Xanzad, xełkê Soran li hemebr birçî bûnê řast hatine û bi Xanzad gotine "Xanzadê xanan, xełkê te xerîke ji birçan bimirin". Xanzad di bersîvê da gotiye "çima ji birçan dimirin, bila nan û şîrbrincê bixon". Paşan Xanzadê têgehandine ku xełkê Sora hejare û hîça wan niye bîxon.
Her boye Xanzad di dame dû sałan da přojeyên kiştukał (zeraĥet) û bazirganêyê bo herême Soran dana û jiyane xełkê pir baştir kir.

Xanzad di sała 1597 ji aliya îmřatore Ĥusmanî û bi daste pîrejineke Tirkimene Kurdîzane fałgir hate jehirxwar kirin. Di yêkem şeve matemîn (bêmadîn)e Soran da, mîrnişîne serbexwe ya Soran, ji aliya împiřatoře Ĥusmanî ve hate dagîr kirin.

Herwek di Kurdawarî da bave dibêjin "mirov ku mir pêyên wî dirêjtir dibin" wate pişta mirinê řêze mirovê zêdatir dibê. Her boye xełkê Soran jî paş mirina Xanzad nirxe wê jine şořeşgeřê zanîne û gotine:

"Heta Xanzadî Soran mîr bû
Berdî bestan penîr bû
Awî řubaran şîr bû."

Wate

Ta Xanzadê Soran mîr bû
Kevirke çya penîr bû
Avê çemê şîr bû





Xanzada Mîre Soran


## 9-3. Eĥmedê Xanî

Çîroke Mem û Zîn yêk ji şakarên Eĥmedê Xanî ye ku hem li Kurdistanê û hem jî li hinek welatên dinê cîhanê hatîye nasîn. Çîroke Mem û Zîn di r̂oje Newroze 1695 li bajare Cizîre bakurê Kurdistanê da r̂udaye. Mem û Zîn aşq û şeîdaye yêktir dibin û bi zîndî bi hev na gen, bełê paş mirinê bi hev digen. Brayêke mezine Mem jî  bi nave Tacdin hebû. Zîn kiçe mîre herême Cizîr û Botanê bû, xuşkeke mezine wî hebû. Mem aşiqe Zîn dibê û paşan Tacdin aşiqe xuşke mezîne zîn dibê. Bava Mem kiçên Mîrê bo kur̂ên xwe dixwazê. Ji gor çand û neryetên Kurdawarî berê kur û kiçe mezin zemawend diken û paşan qerar bû ku Mem û Zîn jî zemawend biken. Bełê xulameke Mîr, bo wê ku Mîr û Zîn ne gene hevdû, gêçełsazî (xirab karî) yê dika. Di akame dûzimanîyê da, Mîr, Memê zîndanî dika. Pişta sałekê Mem di zîndanê da dîn û xulya ya Zîn dibê û îdî nikarê xwarinê bixwa. Paşan Zîn ku bi wê nûçe yê dizanê û îzna dîtine Memê nabê, ew jî ji eşqe Memê nixoş dikevê. Mem di zîndanê da, bi daste xułame Mîr tê jehrxwar kirin. Zîn ku nûçe ya mirine Memê dizanê, diçê ser çya û xwe davê nav çemê.

Paş mirine Mem û Zîn, Mîr ji karê xwe pişîman dibê û Mem û Zîn bi r̂êzeke mezîn di yêk gor̂ê da binax dika. Her di wê matemînê da Tacdin li pêş çave Mîr, xołamê bi xencer dikujî.

Dibêjin hemî sałê ji ser gor̂e Mem û Zîn dû gûłên sur şîn dibin û di hemî werze biharê da, ew dû gûł wek yêk û bi yêk drêjaîyê dijîn. Gor̂ê Mem û Zîn li bajare Cizîre bakurê Kurdistanê ye.





Eĥmedê Xanî di sała 1650 li bajare Bazîda bakurê Kurdistanê ji daîk bû û di sała 1706 çu ser dilovanî ya xwe. Gor̂e Eĥmedê Xani li bajare Bazîda û bam Kurdên bakur bawe ku dibêjin gelê Kurd pêwîste zyaret (hec)e xwe li ser gor̂e Xanî bicê bênê.

## 9-4. Ĥacî Qadire Koye

Ĥacî Qadire Koye hełbestwan û mamostayeke mezine Kurdistanê bû ku bi dahan hełbestên şoȓeşgeȓî nivîsand ku heste neteweî ya xwe têda darbiȓîn. Wî xełkê pałdida bo zanist û pêşketinê û dijî koneperistî û dagîrkeran hełwêstên jîrane (baqilane) û nîştimanperwerane digirt. Ĥacî Qadire Koye di sała 1880 ji serkirda yên Kurd xwast ku yêkbigrin û serbexoî ya Kurdistanê ȓabigehênin. Li jiyane xwe da pir kesan hîne xwêndawarî û zaniste Kurdayetîyê kir. Dîwane hełbestên Ĥacî Qadire Koye di sała 1986an da hate çap kirin.




Ĥacî Qadire Koye di sała 1815 li gunda Gorqerece nizîk bajare Koye ji daîk bû û di sała 1892 çu ser dilovanî ya xwe. Goȓe wî li goȓistane Qerec Eĥmeda Îstanbûłê da hate bin ax kirin.

## 9-5. Mîqdad MedĤet Bedirxan

R̂ojname ya Kurdistan yêkemîn r̂ojname ya Kurdî bûye ku yêkemîn car ji aliye Mîqdad MedĤt Bedirxan ve di 22/4/1898an li bajare Qahîre hate nivîsandin. Mîqdad ji małbate Bedirxanên bakurê Kurdistanê bû ku li penaberî yê da r̂ojname ya Kurdistanê çap kir.



Mîqdad MedĤt Bedirxan

## 9-6. Yunîs Ȓeuf Diłdar

Hełbestwane têkoşere Kurd mamosta Diłdar di dama ku li zîndana dastełate Iȓaqê bû, hełbeste "Ey Ȓeqîb" nivîsî ku paşan bû bi maȓşe nîştmanî ya gelê Kurd. Diłdar di sała 1945 li zanko ya Bexda yê bełgename ya parêzerî wergirt û di sała 1948an da çu ser dilovanî ya xwe.



Mamosta Diłdar (20/2/1918- 12/11/1948)

## 9-7. Margirêt Corc

Margirêt kiçe Asuryêke başurê Kurdistanê bû ku di sała 1961an di temene 20 sałan da çuye nav r̂êzên pêşmergê yên şor̂eşê û wek serkirdayeke azaye şer̂ dije dagîrkere Ir̂aqê xebat kir. Azayetî ya Margirêtê li şer̂ da dang weda û bû bi yêkem fermanda ya serkevtî ya şer̂ê nav başurê Kurdistanê û Ir̂aqê.

Di encam da Mela Mistefa Barzanî bexîlî (ĥesudî) pêbir û tirsa wî hebû ku Margirêt bibê serkirda ya hemî şor̂eşê. Ji ber wê, wî bangêşt kir bo herêma Barzan. Dama ku Margirêt geyişte Barzan, bi fermane Mela Mistefa Barzanî, sê çekdarên barzanî şewekê xwastin dastdirêjî ya Margirêt biken, bełê Margirêt ewqas aza û netirs bû, her sê çekdarên Barzanî kuşt.

Bo sibê Barzanî zanî ku pilane wî ser ne girtiye, Margirêtê şand bo piştgirî ya pêşemerge yên şer̂. Margirêt jî bi 7 kes ji hevałên xwe berve şer̂ r̂êkeft û ketne boseyêka 200 pêşmergeyên Barzanî. Wisa Margirêt zanî ku Barzanî xeyanet pêkiriye, her ji ber wê

ta dawîn fîşekê  şoȓeşgêȓane berxodan kir û di sała 1969 giyan bext kir.



Margirêt û xuşke biçuka wî



Margirêt û bavê wî

## 9-8 . Mamosta Cigerxwên

Cigerxiwên di sała 1903e zaînî li bajare Mardînê û li gunda Ĥesarê ji daîk bû. Pişta cenge cîhanê yêkem di sała 1914an penabere gunda Amûdê bû. Li 11 sałîyê ve li dabistaneke Kurdistanê dast bi xwêndinê kir. Xwêndine olî temam kir, bełê melayetî ne kir û ji ser gelê Kurd dast bi hełbest nivîsînê kir. Cigerxwên bi drêjaîya jiyane xwe xizmeteke bi  bi wêje ya Kurdî kir. Bi dahan hełbestên şořeşgêřî nivîsand û paşan ji naçarî li Suêdê tuşe jiyane penaberiyê bû. Di sała 1984 ço ser dilovanî ya xwe û li bajare Qamîşlî ya řojava ya Kurdistanê hate bin ax kirin.



Mamosta Cigerxwên

## 9-9. Leîla Qasim


Leîla Qasim li bajare Xaneqîn li daîk bû. Leîla xwêndawaneke beşe wêje ya zanistgeha Bexda û haw dam endameke çalake Yeketî ya Xwêndkarên Kurdistanê bû. Leîla di 28/4/1974an bi Cewada hawjîn û sê hevałên din ji alîya dastełate dagîrkere Iřaq li Bexda yê hatne gîrtin û di 13/7/1974an hatne dare kirin. Leîla yêkem kiçe řamyarmedare Kurda serdame xwe bû ku li dagîrker netirsa û di dama dar kirinê da marşe neteweyî Ey Ȓeqîbê xwênd.



Leîla Qasim

### 9-10. Mesture ya Şaswarî (Tewar)


Mesture yêkem kiçî gyanbexitkere pêşmerge ya ȓojhełate Kurdistanê bû ku di temene 19 sałan da di sała 1979an li şeȓe nav bajare Sine bi birîndarî kete dast dastełate dagîrkere Îranê. Paşan Xałxalî ku nwênere Ayetułła Xumeînî bû dawa ȓadest bûnê ji Mesture kir, bełê Mesture di bersîv da tif kire serûçave Xałxałî. Paşan Xałxałî fermane gullebarane Mesture da. Mesture pêşmergeyêke têkoşer û kadreke Komełe ya Yeksanî ya Kurdistanê bû.



Mesture Şaswarî

## 9-11. Mamosta Hêmin Mukiryanî

Hêmin Mukiryanî li gunda Laçîne ser bi Mihabadê di sała 1921 ji daîk bû û di sała 1986 li mehabadê çû ser dilovanîya xwe. Hêmin hełbestwaneke komare Kurdistanê, nîştmanperwereke diłsoz û yeksanîxwaz bû ku bi dahan hełbestên şoȓeşȓî nivîsand û piştgîrîya doze Kurd û hejarên Kurdistanê kir. Tarîk û Ȓun û Nałeî Cudayî dû ji dîwanên nasrave Hêmin Mukiryanîn.



Hêmin Mukiryanî

## 9-12. Musa Anter (Apê Musa)


Musa Anter xełke bakurê Kurdistanê bû ku hemî jiyane xwe bo nivîsîn ji ser mafa gelê çewsaweya Kurd terxan kiri bû. Betaîbet li bakure Kurdistanê û li bware ȓojnamewanî yê da ȓołeke serekî û berçav geȓyand. Di fêrkirin û wanedane gencên bakurê Kurdistanê da, ȓołeke berçav wî hebû.
Musa Anter yêkemîn kes bû ku ferhenge zimane Kurdî-Tirkî nivîsî û di xizmet kirin û pêşxistine ziman û wêje ya Kurdî da xebateke bi kir. Her boye dagîrkere Tirkiye teȟemule Musa Anter ne kir û di 20/9/1992an li bajare Amedê û li małe xwe da, ji alîya dastełate Tirk ȓa, hate tiȓor kirin.



Mamosta Musa Anter

## 9-13. Mamosta Îsmaĥîl Bêşikçî

Duktor Îsmaĥîl Bêşikçî ji daîk bûya bajare Çiȓome Tirkiye ye û egerçî bi ȓeçełek Tirke, bełê piranî ya jiyanê bo nivîsîna ȓastîye ȓudawên gelê Kurd û welate Kurdistanê terxan kiriye. Bêşikçî duktora li beşe komełnasîyê da heye û li zanistgehên Tirkiye bo çendîn sałan mamostayetî kir, bełê ji ser bîrubaweȓe û nivîsên xwe tawane 111 sał zîndanî bi ser da hate biȓîn. Bêşikçî 18 sałan li zîndanên Tirkiye da hate gîrtin û di sała 1999 hate azad kirin. Bêşikçî dahan nivîsên bi ji ser gelê Kurd nivîsîne ku ên here bi piȓtûke
" Kurdistan Kołonî ya Navneteweyî" ye.



Duktor Îsmaĥîl Bêşikçî

## Beşe Dahem

## 10- Dawî

Di sedaya bîst û yêkem da bas ji aştî û yeksanî ya mafên mirovan tê kirin û piȓanîya netewe yên cîhanê welate serbixwe ya wan heye. Şermeke mezine bo hemî mirovahî yê ky Kurd yêk ji mezintirîn netewane ku welate wî bi fermî ji alîya navneteweyî ne hatîye pejrandin û nasname ya Kurdistanîyan jî ne hatîye pesend kirin.

Erkeke dîrokî û exlaqî ya ji ser ȓêxistinên Neteweyên Yêkgirtî, Mafên Mirovên Jihanê û hemî xodan wijdanan ku jo bo ȓêzgirtin ji mafe mirov û bidî anîna mafên ȓewayên gelê Kurd, ȓifiȓandomeke azad bo nasîne nasname ya Kurd, li Kurdistanê pêkbênê.

Kurd herdam wek neteweyêke kêmîne di nav welate xwe da hatîye navbirin û sucdar kirin. Neteweyêk ku xodan zimane cihêreng, çanda cihêreng û axeke cihêȓenge, ew neteweyêke cihêȓenge û kêmîne niye di welate xwe da. Kes nikarê bêjê ku li Brîtaniya xełkên Skotlandî û Wełşî

neteweyêke kêmînen. Çimkî xodan çand û axe xwe ne ku cihêȓenge ji Înglîsiyan. Ji ber wê pêwîste ku navbirine Kurd wek neteweyêke kêmîne li nav Tirkiye, Îran, Iȓaq û Suriye da, qet ji alîya Kurdan ve nêyê pesend kirin.

Kurd dikrê li Bexda, Şam, Ankara û Tahranê kêmîne bê, bełê li axe Kurdistanê da zorîneye û dibê xodan mał û biȓyar bidast bê, nek jêrdaste.

Xalokên grîngên şirove kiri yên di hemî beşên wê piȓtûkê, selmênere (îsbat kere) hebûne netewe ya Kurdin ku piranî ya wî li welate Kurdistanê dijî. Ev kyane jî małe wîya û ji kesê dagîr nekiriye. Netewe ya Kurd ziman, çand û tenanet ole sereke ya wî jî, bi hemî netewe yên Tirk, Fars û Ĥeȓeban ȓa cudane, ji ber wê pêwîste ku Kurd biwêrane bê meîdan û dan bi hebûne xwe da binê û ciran û civake nawneteweyî jî naçar bika ku hebûna nasname ya Kurdan pesend bika. Her wek hatiya gotin "Maf nayête daîn û gerek bê standin".

Netewe yên dinjî bi serhełdan û guşar (zexit)e herêmî û cihanî hebûne xwe bi cîhanê selmandine (dane qibûł kirin).

Dibê Kurdistanî bizanin ku nasname ya neteweyî bi yêketî ya hemî çîn û twêjên civakê; zeĥmetkêş, karker, xwêndkar, r̂oşenbîr û şor̂eşgêr̂an pêkdê.

Pêwîste çalakîyên r̂amyarî ya r̂unakbîrên Kurdistanî li navxwe û darveî welat, hawdam bi r̂êxistinên welatperwer bibne binase bereve pêşçunî civakê û dasepandine nasname ya Kurdistanê li navneteweyî da. Pir girînge ku welatperwer bigene wê astê ku li her darek bin bo bidast anîne nasname ya Kurdistanê têbikoşin.

R̂amyarî ya Kurd pêwîste li ser p̂rojeyên guhar̂îne şer̂e çekdarîyê bo xebateke r̂amyarî û civakî bê. Pêwîste li Kurdistanê aştî ya civakî bê kirin ku Kurd biga armance pêşketina xwe ku mafên sereke têda bên misoger kirin. Gelê Kurdistanê bi r̂eçavkirine şêwaze xebate civakî dikarê di alîyên zansit, ziman, çand, mafên mirov û

çaksazî ya abûrî da pêşketinên zedatir bi dast bênê û di asaîş û azadîyêke zêdatir behremend bê.

Dostayetî û lêknizîkbûna neteweyên Kurd, Asurî, Tirk, Ĥeřeb û Fars seqamgîra aştî û aramîyê li Kurdistanê û welatên dagîrkerên Kurdistanê misoger dika. Ta aştî û aramî nebê, netewe yên din jî di wê herêmê da, di zerer û zyan da dibin û pêş nakevin.  Bo geîştin bi wê ařmancê, pêwîste her welatîyêke Kurdistanî li her darek bê, bo nasandîna nasname û mafên řewayên gelê Kurdistanê çalakane têbikoşê.

**Serçave**


1. Abdulla Ocalan (2007). Prison Writings: The Root of Civilisation. (English)

2. Abdullah Ghafur (1995). The Geography of Kurdistan. (Kurdish)

3. Abû Bakr as-Siddiq (632-634). The Noble Qur'an (610-632), Translation into Kurdish by Hajar Mukryani in 1990.

4. Cemil Bayik (1996). The History of PKK (Kurdistan Workers' Party). (Kurdish)

5. Firishte Abdullahi (1990). The Zoroastrian Religion in Sasanian Society. (Persian)

6. H. Hewrami (2001). Interview with Mrs Hawrami (Kurdish)

7. Hakim Abû'l-Qasim Ferdowsi (1010). Shahnameh, The Historical Past of Iran from the Creation of the World until 10th Century. 60,000 Verses Long Epic Poem. (Persian)

8. Hussein Mohammad Haziz (1996). The Kurds and Revolutions. (Kurdish)

9. Ibn Jarir al-Tabari (838-923). The History of the Prophets and Kings (English)

10. Jawaharlal Nehru (1929). Letters from a Father to His Daughter. (English)

11. Mohammad Resul Hawar (1995). Simko, The Revolution of Simailaghai Shikak. (Kurdish)

12. Mustafa Al Gharadaghi (1992). Kurdistan Times. (English)

13. Neil DaGrasse Tyson, Sientist (2004). How Did The Universe, Our Planet and Life Begins?

14. Professor Sharif Wanly (2001). Interview with Mr Wanly. (Kurdish)

15. Qendil Zeki (1982). From the Top of Qendil Mountain Look at the Truths. (Kurdish)

16. Sharef Xani Bitlisi (1596). Sherefname, the History of Kurdistan. (Kurdish & Persian)

17. Soran Z. (2011). Interview with Mr Soran (Kurdish)

18. Stephen Mitchell (2004). A New English Version, Gilgamesh. (English)

19. Wekil Mistefa (2006). Interview with Mr Mistefa. (Kurdish)

20. Xdir Kurdistani (2000). Interview with Mr. Kurdistani. (Kurdish)

Berhev dane sałjmêre Kurdistanî bi sałjmêrên Xeyamî û Krîstyanî

| **Sała Kurdistanî** | **Sała Xeyamî** | **Sała Krîstyanî** |
|---|---|---|
| 1/1/2713 | 1/1/1392 | 21 March - 20 April 2013 |
| Xakelêwe | Ferwerdîn | 21 April – 20 May |
| Gułan ( Banemeȓ ) | Ordîbiheşt | 21 May – 20 June |
| Cozerdan | Xordad | 21 June – 20 July |
| Puşpeȓ | Tîȓ | 21 July – 20 August |
| Gelawêj | Mordad | 21 August – 20 Septmeber |
| Xermanan | Şehrîwer | 21 September – 20 October |
| Ȓezber | Mihir | 21 October – 20 November |
| Gełaȓêzan (Xezełwer) | Aban | 21 November – 20 Dacember |
| Sermawez | Azer | 21 Dacember – 20 January |
| Befranbar | Daî | 21 January – 20 February |
| Rêbendan | Behmen | 21 February – 20 March |

Dastełat û sazîyên Kurdistanî ne pêwîste ku sała krîstyanî bikar bênin, çimkî nave heîvên sała Krîstyanî ji zimanên Babûlî û Ĥîbrî ȓa hatine girtin. Belê nave heîvên Kurdî bi sała Kurdî tên guncan û nav jî Kurdîne. Ji ber vê, pêwîste ku nave heîvan bi Kurdî bê û di sałjmêre Kurdî da bêne bikar anîn. Eger jî sała Krîstyanî hate bikar anîn, hêjatire ku nave heîvan Kurdî bin.

| | |
|---|---|
| Pêwîste navên wan heîvan ji aliye Kurdan ne yêne bikar anîn. Çimkî li zimane sosretên û di Kurdî da ne hêjane: | Bi sałjmêre Krîstyanî r̂a ev nav hêjatirin ji bo bikar anînê: |
| Adar, Azar (zimane Ĥîbrî) | Awdar (anjî Xakelêwe) = March |
| Nîsan (zimane Ĥîbrî) | Awrêl (anjî Banemer) = April |
| Gułan (zimane Kurdî u hêjaye) | Gułan = May |
| Huzîran (zimane Ĥer̂ebî) | Cozerdan = June |
| Tîrmeh (zimane Farsî) | Puşper̂ = July |
| Tebax, Ab (zimane Ĥer̂ebî) | Gelawej = August |
| Îlon, Îlul (zimane Ĥîbrî) | Xermanan = September |
| Çirîye Pêşîn (Ne hêjaye)<br>Cotmeh (heiv tenê cût nine) | R̂ezber = October |
| Çirîye Paşîn (Ne hêjaye)<br>Mijdar (herdam ne mije) | Gełar̂êzan = November |
| Çiliyê Pêşîn (heiv ne 40 r̂oje) | Sermawez = Dacember |
| Çiliyê Paşîn(heiv ne 40 r̂oje) | R̂êbendan = January |
| Sibat (zimane Babûlî) | R̂eşeme = February |

# Nasname ya Kurdistanê



Kurdistanî bun, nasname ya welatîyên Kurdistanê ye